



Weşana
ENSTÎTUYA KURDÎ YA AMEDÊ

Kovara Dumethane
Sal: 7 Hejmar - 34
Rezber - Kewçer 2010

Xwedî û Berpirsiyariya Nivîsaran
Mehmet Aydın ALÖKMEN

Edîtoriya û Redaksiyon
Serwet DENİZ - Elixan LORAN

Mîzanpaj û Berg:
Enstîtuya Kurdî ya Amedê

Wêneyê Bergê
Ferat ÇAXIN

Şêwirmendê Hîqûqê
M. Nuri DENİZ

Çapxane: Berdan Matbaası:
Davutpaşa Cd. Güven Sanayi Sitesi
C Blok No: 239 **Topkapı/İSTANBUL**
Tlf: 0 212 613 12 11

Navnîşan
Kalem Sk. No: 32/4 Huzurevleri
Kayapınar/DİYARBAKIR

Tel & Faks: (0412) 237 43 16

E-Mail
kovaraw@yahoo.com
kovarawe@hotmail.com

WEB: www.kovaraw.com

ISSN: 1309-1476

Şertên Abonetiyê
Nava Welat, salek: 30 TL
Welatên Dereke, salek: 70 EURO

Nimroya Hesabê IBAN'ê
Mehmet Aydın ALÖKMEN
Türkiye İş Bankası 8300 Diyarbakır
TL: TR190006400000183002114889

EURO: TR420006400000283000737070

USD: TR520006400000283000737084

Nimroya Hesabê PTT'ê
Mehmet Aydın ALÖKMEN
590 24 36

- Ji edîtor / 2
- Prensê Dilşad - **Oscar WILDE** - Werger: *Evdilayê DEWRÊŞ* / 3
- Vegera jiyanê - **Kamran Simo HEDİLÎ** / 8
- Çima na - **İsmail DÎNDAR** / 10
- Xwezî, Nasekinim, Vîn - **Zekî KAYAR** / 12
- Mêrik û dêw - **İsmail GUVEN** / 13
- Kulmek xwelî - **Xecê OMERÎ** / 16
- Xeberoşkeke evînî - **Mehmet DÎCLE** / 17
- Name - **ŞÎNYA** / 18
- Cemed- **Omer FİDAN** / 19
- Gulên bêmiraz- **Bargiran ŞANAZ** / 20
- Du darvanên botî - **Şivan ZEREN (AR)** / 21
- Kurtenameyeke binçavkirî - **Ferzan ŞÊR** / 23
- Bêzar - **Mihemed RONAHÎ** / 24
- Ti vace - **Nesrîn NAVDAR** / 26
- ... - **Janbijan AR** / 27
- Hevpeyvîn bi Mehmet Çakmak re - **Fatma SAVCI** / 28
- Parseko - **Berfo BARÎ** / 31
- Dosye - **Kawa NEMIR** / 32
- Hevpeyvîn bi Kawa Nemir re - **Lal LALEŞ** / 33
- Zimannameya Kawa Nemir - **Zana FARQÎNÎ** / 40
- Ji keviyên helbesteke birîndar bişenga ku berzûrî heyatê dibe - **Berken BEREH** / 44
- Mistek mirin - **Ehmedê HUSEYNÎ** / 48
- Serkîsof - **Arjen ARÎ** / 49
- Pêwîst û giranbuha - **Samî HÊZIL** / 50
- Li Babilê pêlewaneke: Wergêr Kawa Nemir - **Yunus EROGLU** / 53
- Li ser sînorên rengîn siyek - **İsmail YILDIZ** / 56
- Nameyeke mişt bêrikirin li dû Pilingo - **Sedêyê SEHERNAZÊ** / 58
- Çika berbihevanîne - **Elixan LORAN** / 60
- Bandora çand û helbesta erebî li ser helbesta kurdî - **Hoşeng OSÊ** / 61
- Destê jêkirî - **Bekîr YILDIZ** - Werger: *Feratê DENGİZÎ* / 65
- Şano û nostaljiya dawetên Botanê - **Rûkiye OZMEN** / 68
- Di helbestê hilnayem - **Şengul OGUR** / 71
- Zû çûyî - **Enwerî** - Werger: *Cewad PALE* / 71
- Apê Mûsa - **Lorîne DEMİREL** / 72
- Xêr û şer di ola misrî ya kevnar de - **Salih BOZAN** / 73
- Jiyanekê teng, Hêviyên ba û baranê - **NAZÊ** / 76
- Ji dapîr û bapîran - **Zekî AKDAG** / 77
- Hişxur - **Ercan DOĞAN** / 77
- Beravdanî - **Ar-da JANXWAR** / 78

*Nivîsên ku ji bo weşanê ji kovarê re tên şandin, li xwediyên wan nayên vegerandin.
Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

Di wêjeyan de kovar berê berê goşt in dûre ev goşt kamil dibe û dibe kirkirk. Ev kirkirk jî bi bayê zemanan re, bi demsalên guherîn û veguherîna re, bi xerîkandina kar re dibe hestî ku gelek caran hestî jî pola zexmtir e. Me kurdan bi “hest”an cilika xwe jî avê derxist, ev jî diyar dike ku em ê rojekê bibin “hest”î jî!

Yekem hejmara kovara Wyê di Rezber- Kewçêra 2004’an de derçû û va ye 2010 li ser kulavê me mêvan e. Ji hejmara yekem heta hejmara 34’an gelek nivîs derçûn. Ji van nivîsan çi ava bû? An jî van nivîsan çi birin ava? Ev du pirs in berî ku em jixwe bikin, em dixwazin jî mirîdên kurdî angû ji xwendevanan bikin. Ji ber ku jî “beyan”ê zêdetir divê mirov li “vebeyan”ê binihêre. Mesele ne ew e ku salê çend romanên kurdî der diçin, mesele ew e ku çend jî wan tên xwendin.

Bi vê hejmarê em ketin heft saliya xwe. Êdî destnimêj jî me jî dişikê. Êdî em bîr dibin û bê guman bîrbûn barê me girantir jî dike. Ji ber ku bîrbûn êdî toqekê jî dixê stûyê me. Lê em bêtî ku xwe bidin çivan bi pêşniyar û rexneyê we nivîskar û xwendevanan û bi taybetî bi alîkariya we ya cebilxaneyî em ê wêjeya kurdî geş bikin.

Nivîskariya kurdî, nivîskariyeke *kitim* e. Ji ber ku ne bazareke wê ya ku guhê gelek kesan bi ser wê de xwar e heye, ne geşbûneke wê ya palûteyî heye û jixwe qet û qet derfet jî wê re nehatiye terxankirin ku ew jî karibe zemanan bihejîne. Em jî bi gavên biçûk dixwazin vê wêjeyê hildin binê qeftê û jî vê hejmarê şûnde em ê hinek tiştan biguherînin. Wekî nimûne êdî çi kesê/a ku nivîs jî me re şand em wêneyekî wî/wê jî jê dixwazin. Ji ber ku êdî divê nivîskarê/a kurdî di civakê de wekî nivîskar were nasîn. Ne wekî mamoste, xwendevan, pale û bijîşkan. Ji ber ku wêne yekemîn doza hebûnê ye.

Û vê dewletê mafê dersa kurdî da zanîngeha Artûklûyê. Beçên bîrên bêbinî jî dizanin ku rojnameyeke bi kurdî di çar rojan de 2 caran hat girtin! Ev ne fen be ev çi ben e! Ji ber wê hindê jî em zanîngeha Artûklûyê, YOK’ê û heta ku bigihîje MEB’ê boykot dikin! Heta ku jî pêşdibistanê heta doktorayê -doktora jî tê de! -zarokên agir û bizot ên ku dibêjin boykot bi kurdî perwerde nebin vê çîroka me dê neqede! Çi karê ku zagona wê tune be û jî hinekan re qedexe be û bi baca kesên ku ev kar li wan hatine qedexekirin, jî delalîyên dewletê re bê terxankirin ev faşîzm e! Kurdî Der’ên me jî nikarin bibêjin “qurs” dibêjin “atolye”. Lê berdilkên dewletê jî ser serê xwe dimîzin *û jî nav ranên wan petrol diherike!* Em wekî Kovara Wyê gazi kesên ku çûne Artûklûyê dikin ku bila vegerin. Heke vegerin ser seran û ser çavan, lê heke venegerin jî wekî her weşanê, ê me jî tercîhên me dê hebin. Ya din jî kesên ku jî pirtûkên mirov hînî kurdî bibin çawa dikarin pûanan bidin “nivîskar”an. Û “nivîskar” wî mafî çawa didin wê çerxê! Divê em binin bîra xwe ku Xanî piştî wextekê paxav bi mîrên dema xwe nekiriye lê “nivîskarê kurd” çawa dikare paxavê bi endamê lijneyeke wisa bike ku dibêje “Ehmedê Xanî di meseleya neteweperweriyê de tiştên wisa negotine, Celadet Bedirxan ew beş lê zêde kiriye, welhasilî kelam Xanî jî xwe re çandiye şorbeyê” Osman Sebrî mîr bû, dev jî mîrîtiya xwe berda lê “nivîskarê kurd” û “ciwanên kurd” çawa xwe li Artûklûya bê zagon girtin divê were nîqaşkirin!

Di vê hejmara payîzê de jî me dosyeyek li ser mizgînxêrkekî kurd, li ser helbestkar, wergêr û edîtor Kawa Nemirê ku digot “tevbîgere, vegere ey kelama qedîm” amade kir.

Ji bo ku dosyeyên me xurttir derkevin êdî em ê dosyeyên xwe sê hejmar -şeş meh- berê diyar bikin. Li gorî plansaziya me;

Dosyeya Sermawez-Berfanbar 2010’an “Şanoya Kurdî” ye. Ji bo dosyeyê herî dereng divê heta 15’ê Kewçêrê nivîs werin ber destên me.

Dosyeya Rêbendan-Reşemiya 2011’an “Wêjeya Polîtîk” e. Herî dereng divê heta 15’ê Berfanbarê nivîs werin ber destên me.

Dosyeya Adar-Avrêla 2011’an “Li Ba Jinan Wêjeya Kurdî” ye. Herî dereng divê heta 15’ê Reşemiyê nivîs werin ber destên me.

Kesên ku dixwazin beşdarî dosyeya me bibin bi awayekî xwe bigihînin me û haya me pê bixin em ê kêfxweş bibin.

Bi hêviya azadî û aramiyê cejna we ya Remezanê pîroz be.

Heta hejmara nû bimînin di xweşiyê de.

Prensê Dilşad

Oscar WILDE

Wergera ji îngilîzî: Evdîlayê DEWRÊŞ

Li jorê bajêr, li ser stûnekî bilind peykerê Prensê Dilşad hebû. Her derê wî bi zêr hatibû kiraskirin, her du çavên wî ji safîr bûn û li ser destiyê şûrê wî yaqûtekî sor ê gir dibiriqî.

Bi rastî gelek jê dihat hezkirin. “Ew bedewekî wek gula bayê ye” got yekî ji encûmenê bajêr ku hêvî dikir ji ber ku xwediye zewqeke hunerî ye ew ê rûmetê bibîne. “Ne ew qas kêrhatî ye” wî got. Dibe ku mirov bêjin qey ew bi kêrî tişteki nayê, lê bi rastî ew ne wisa bû.

“Çima tu nikarî bibî mîna Prensê Dilşad” dayikeke bîaqil ji zarokê xwe yê ku ji bo hîvê digiriya re got. “Prensê Dilşad tu carî ji bo tu tiştî xiyalê girî nake.”

“Ez pir kêfxweş im ku di cîhanê de kesek heye ku bi temamî dilşad e” mêreki xemgîn di ber xwe de got, dema ku çavên xwe zîq kiribû li peykerê niwaze dinihêrî.

“Bi rastî fena ferîşteyekî ye” gotin, zarokên sêwîxaneyê dema ku bi sermilên xwe yên sor û pişgirên paqij ên spî ji katedralê derketin.

“Hûn çawa dizanin?” got, mamosteyê matematîkê, “we hîç nedîtiye.”

“Ax! Lê me di xewnên xwe de dîtiye,” got, zarokan û mamosteyê matematîkê eniya xwe qermiçand û çavên xwe tarî kirin û pir hişk xuya bû, çimkî wî xewna zarokan nepejirand.

Şevêkê di ser bajêr re çivîkekî biçûk firî. Hevalên wî şeş hefte berê çûbûn Misirê. Lê ew li paş mabû, ji ber ku ew evîndarê bedewtirîn qamîşê bû. Wî bihara pêşîn dema ku ew di ser çem re berjêr difiriya, wî dabû pey pîrpirikeke mezin, ew nas kiribû û nava wê ya zirav gelek bala wî kişandibû û rawestiyabû ji bo ku bi wê re biaxe.

“Ji te hez bikim?” got, Xecxecokî, ku

hez dikir zûtir bê wir û qamîşê bi serî tewandinê silav li wî dikir. Li der û dorên wê difiriya, baskên xwe li avê dixist û helqeyên zîvîn li ser avê çêdikir. Ev pesn û nûwaza wî bû ji bo wê. Û vê domand heta dawiya havînê.

“Ev têkiliyeke komîk e” kirin, wîçewîç xecxecokên din; “pere nake û têkiliya ev qas zêde...” û bi rastî çem bi temamî bi qamîşan tijî bû. Pişt re dema ku payîz hat ew gişt firîn çûn.

Piştî ku ew çûn wî xwe tenê hîs kir û ji evîna stiya xwe bêzar bû. “Sohbetê nake” wî got, “û ez ditirsim ku ew îşwebaz e, lewra ew her tim bi bayê re flortê dike” û teqez, dema ku ba tê silava xwe ya niwazetirîn dide. Ez bawer im ew kedî ye, lê ez ji gerê hez dikim û divê jina min jî, ji gerê hez bike.”

“Tu yê bi min re werî” wî dawiyê ji wê re got; lê wê serê xwe hejand, ew pir bi mala xwe ve hatibû girêdan.

“Tu bi min dilîzî?” wî kir qîrîn. “Ez diçim Pramîdan, bi xatirê te! Û firiya.

Heta êvarê ew firiya û bi şev gihîşt bajêr. “Ez dikarim bilisim?” wî got; “Ez hêvî dikim bajarokê amadehî kiriye.”

Paşê wî peykerê ser stûnê bilind dît.

“Ez dikarim li vir bilisim” wî got; “ev ciyekî baş e, hewa wê paqij e.” Wî tam li nava lingên Prensê Dilşad danî.

“Jûreke min a razanê ya zêrîn heye” wî hêdika ji xwe re got gava ku wî li der û dorê dinihêrî û amedekariya xewê dikir; lê çawa ku wî serê xwe kir binê baskên xwe dilopek av ket ser wî. “Çi tişteki ecêb e” wî got, “li esmanan hîç ewr tune ye, esman sayî û stêrk dibiriqin û niha baran dibare. Rewşa hewayê bakûrê Ewropayê bi rastî sosret e. Qamîşokê ji baranê hez dikir lê ev tenê ji bo xudbîniya wê bû.”

Paşê dilopeke din ket.

“Ku peykerek nikaribe ji baranê biparêze dê bi kêrî çi bê?” wî got; “Ez divê li kevirê rozineke baş bigerim,” û wî kir ku bifire.

Lê berî ku ew perê xwe veke dilopaya sêyem ket û wî li jor nihêrî, û dît - Ax! Ew çi bû wî dît?

Çavên Prensê Dilşad bi hêstiran tiji bûbûn û hêstir bi dêmên wî yên zêrîn ve dihatin xwarê. Li ber tavehîvê rûyê wî wisa bedew bû ku Xecxecokê biçûk bi di-lovaniyê tiji bûbû.

“Tu kî yî?” wî got.

“Ez Prensê Dilşad im.”

“Lê tu çima digirî?” Pirsî Xecxecokî; te ez bi temamî şil kirim.”

“Dema ez zindî bûm û dilekî min ê mirovî hebû” got peyker, “Min nizanibû ku hêstir çi ne, ji ber ku ez li Seraya Sans-Souciyê, ciyê ku kul û keder nikaribûn têkevin hundir dijiyam. Bi roj ez bi hevalên xwe re li baxçe dileyîstîm û êvaran min li ewyana mezin dans li dar dixist. Li dora baxçe diwarekî gelek bilind hebû, lê tu carî min meraq nedikir ku bipirsîm li derveyî diwar çi heye, her tiştê min pir rind bûn. Mirovên min ên serayê ji min re digotin Prensê Dilşad û bi rastî ez kêfxweş bûm, ku kêfxweşî bextewarî be. Ez wisa jiyam û wisa mirim. Niha ji ber ku ez mirî me wan ez li ciyê bilind bi cî kirim ku ez dikarim her bedî û kul û keserên bajarê xwe bibînim û digel ku dilê min ji rîsasê hatiye çekirin dîsa jî ez nikarim negirîm.

“Çi!” Ew ne zêrê hişk e?” Xecxecokî ji xwe re got. Ji bo ku bi dengê bilind biaxeve pir kubar bû.

“Li dûr,” got peyker bi dengê musîkî, “li dûr li kuçeyêke biçûk maleke hejar heye. Paceyek vekirî ye, ez dikarim tê re bibînim ku jinek li ber maseyê rûniştiye. Ruyê wê zeîf û qermîçî ye û destên wê gir û sor in, hemû karê wê bi derziyê ye, lewra ew jineke dirûnker e. Ew kulîlka çerxafelekê nexş dike li ser kirasekî ji bo şîrîntirîn mêvana şanaziyê ya qralîçeyê ku dê di baloya serayê de li xwe bike. Li qunc di nav nivînan de kurê wê yê biçûk nex-

weş radizê. Canê wî dişewite û pûrteqalan dixwaze. Ji ava çem pêştir tişteki diya wî tune ye bide wî, loma ew digirî. Xecxecok, Xecxecok, Xecxecokê biçûk tu nikarî yaqûtê ser destiyê şûrê min ji wê re bibî? Lingên min bi stûn ve hatine girêdan û ez nikarim tevbigirim.

“Li Misirê li hêviya min in.” Got, Xecxecokî. “Hevalên min niha li ser Nilê berjêr û berjor difirin û bi sosinên avê re sohbetê dikin. Bisteke din ew ê li tîrbeya şahê gewre bilîsin. Şah bi xwe di wê derê de di tabûta xwe de ye. Ew bi ketenekî zer de hatiye pêçandin û bi biharatan hatiye mûmyakirin. Di stûyê wî de gerdeniyek ji yeşîmê rengavêti heye û destên wî mîna pelên hişk in.

“Xecxecok, Xecxecok, Xecxecokê biçûk” got Prensî, “tu yê şevêkê li cem min biminî û bibî peyamberê min? Lawik gelek tî ye û dayik gelek xemgîn e.”

“Ez ne bawer im ku ez ê ji kuran hez bikim,” got Xecxecokî. “Havîna çûyî dema ku ez li ser çem rûdiniştîm, du kurên bê edeb hebûn, kurên aşvan her tim kevir davêtin min. Elbet, wan tu carî nikaribû li min bidin; em xecxecok pir zû difirin, lewre ez ji malbata ku bi cansivikî û çelengiya xwe navdar e tîm; dîsa jî ew nîşaneke bê edebiyê bû.

Lê Prensê Dilşad wisa bi keder bû ku dilê Xecxecokê biçûk pê şewitî. “Ev der pir sar e” wî got; lê ez ê şevêkê li cem te bîminî û bibim peyamberê te.”

“Spas, Xecxecokê biçûk” got, Prensî Xecxecokî yaqûtê mezin ji şûrê Prensî rakir û digel wî di ser banên bajêr de firî.

Ji kuleya katedralê, li ciyê ku peykerê firîştaya mermer hatibû niqirandin derbas bû. Ew ji serayê ve bihurî û wî dengê dansê bihîst. Qîzeke bedew tevî xoşewistê xwe derket şanêşînê. “Stêrk çi qas spehî ne” wî gotê, “û hêza evînê çi qas niwaze ye!”

“Ez hêvî dikim dê cilên min di demê de ji bo baloya dewletê amade bin,” wê got; “min xwest ku gula çerxafelekê li ser bê nexşandin; lê jina terzî pir tiral e.”

Di ser çem re derbas bû û çirayên ku bi stûnên keştiyê ve dalqandî ne dîtin. Di ser berbajêr (varoš) ve bihurî û dît ku ci-

hûyên pîr bi hev re bazarê dikin û pere di hundirê mêzîna sifir de dipîvin. Di dawiyê de ew hat cem xaniyê xizan û li hundir nihêrî. Kurik digel şewata canê xwe li ser piştê li ser nivînan bû û dayik di xewê re çûbû, gelek westiyabû. Ket hundir, ya-qûtê gir danî ser maseyê, teniştê guzvanê jinikê. Paşê hêdîka firî dora ciyê kurik, li ber eniya wî bi baskên xwe ba weşand. “Çiqas li min sar e,” kurikî got. “divê ez baştir bibim,” û ket xeweke şîrîn.

Paşê Xecxecokê biçûk paş ve firiya çû cem Prensê Dilşad û tiştên ku kir jê re got. “Balkêş e” got, “hewa pir sar e, lê li min germ e niha.”

“Ji ber ku te karekî qenc kir,” got, Prens. Û Xecxecokê biçûk ponijî û piştê di xewê re çû. Her tim dema diponijî xewa wî dihat.

Dema bû roj ew berjêr firî daket cem û serê xwe şûşt, “Çi tiştêkî balkêş.” Got profesore zanista çivîkan gava ku di ser pirê re derbas dibû. “Xecxecokek û vê zivistanê!” û wî ji rojnameya herêmê re nameyeke dirêj der barê vê yekê de nivîsî. Her kesî qala vê dikir, ew bi gelek peyvan tijî bû ku wan nikaribûn têbigihîjin.

“Ez îşev diçim Misirê,” got, Xecxecokî û ji ber vê hêviyê, kêfa wî li cî bû. Ew li teva-hiya birdariyê (abide) geriyabû û demeke dirêj li ser kuleya dêrê rawestiyabû. Li her derê ku ew çûyê wî çûçîn û wîçîna

beytikan bihîst û wan ji hev re digot, “Çi biyaniyekî balkêş”, loma pir kêfa wî ji wî re dihat.

Dema ku hîv derket bi paş ve firiya hat ba Prensê Dilşad. “Emrekî te heye ji Misirê?” wî got; “Ez ê a niha bikevim rê.”

“Xecxecok Xecxecok, Xecxecokê biçûk” got Prensî, “tu yê şeveke din ji li ba min biminî?”

“Li Misirê li hêviya min in,” got Xecxecokî. “Sibê dê hevalên min di Second Cataract ve bifirin. Hespê avî di nav qamîşan de û li ser textê ristim Yezdan Memnon rûdinê. Heta serê sibeyê ew li stêrkan temaşe dike û dema stêrka sibê dibiriqe qêrîneke dilşadiyê ji wê dertê û piştê bêdeng dimîne. Nivroyê şêrên zer

tên keviya avê ku vexwin. Çavên wan mîna zimrûdan in û norîna wan ji gurmîn û xurmîna çir zexm û gurtir e.

“Xecxecok Xecxecok, Xecxecokê biçûk” got Prensî, “li dûr, li hemberî bajêr ez gêncekî di banîjeyê de dibînim. Wî pala xwe daye runiştêkeke ku bi kaxez hatiye rûpêckirin û di hundirê îskana teniştê wî de desteyeke binevşên çilmisî heye. Porê wî pêldar û qehweyî ye û lêvên wî sor in wek hinarekê û çavên wî gir û wek xiyal in. Ew hewl dide ku ji bo rêveberê şanoyê listokekê tamam bike, lê li wî pir sar e êdî nikare binivîse.



Di pixêriyê de tu agir tune ye û ji birçînan dilê wî dixeriqe.

“Ez ê şevêkê ji li ba te bimînim,” got, Xecxecokê ku bi rastî pir dilpak bû. “Ez ê jê re yaqûtê din bibim?”

“Heyf! Êdî yaqûtê min tune ye,” got, prens; “Tenê çavên min mane. Ew ji safirê ku hezar sal berê ji Hindistanê hatine anîn, hatine çekirin. Yekî ji wan derîne û bibe bidê, ew ê wî bifiroşe cewherfiroş û nan û ardû bikire û lîstika xwe temam bike.”

“Prensê delal,” got Xecxecokî; “ez nika-rim vê bikim” û wî dest bi girî kir.

Xecxecok Xecxecok, Xecxecokê biçûk” got Prensî, “bike, wek ku ez fermanê didim te.”

“Li ser vê, Xecxecokî çavê Prensî ji cî derxist û firî çû malika xwendekarî. Daketina hundir asan bû, ji ber ku qulek li ser banî hebû ji nişka ve wek tîrê, di qulê de ket hundirê jûrê. Mêrikê ciwan serê xwe kiribû nav destên xwe. Loma wî dengê perê çivîkê nebihîst û gava wî serê xwe bilind kir dît ku yaqûta şîn li ser binevşa çilmisî sekiniye.

“Bi qedrê min tê zanîn” wî got; ev ji heyranekî min hat. Niha ez dikarim lîstika xwe temam bikim,” û gelek dîlşad bû.

Roja din Xecxecok berjêr firî çû benderê. Li ser stûnekî gir ê keştiyê rawestiya û li karkerên keştiyê nihêrî ku sindoqan bi werîsan dertînin. Bi rakirina her sindoqê re wan dikir qîrîn “Bilind bikin!” “Ez diçim Misirê!” Xecxecokî bi qêrîn got, lê belê kesî pax pê nekir û dema hîv derket firiya vegeriya hat cem Prensê Dîlşad.

“Ez hatim ku xatir ji te bixwazim,” wî got.

“Xecxecok Xecxecok, Xecxecokê biçûk” got Prensî, “tu yê şevêke din ji li ba min biminî?”

“Zivistan e” got Xecxecokî û dê serma berfê di nêz de li vir be. Li Misirê li ser darên kesk ên palmiyeyê hewa germ e û tîmsah di nav çamûrê de vezeliyane û bi tîralî li der û dorên xwe dinihêrin. Hevalên min hêlinekê di Perestgeha Baalbek de çêdikin û kevokên spî û binevşî li wan temaşê dikin û ji hev û din re dixwînin. Prensê delal, divê ez ji te veqetim, lê ez ê tu carî te ji bir nekim û bihara bê ez ê di şûna

yên ku te dan de, ji te re du cewherên bedew bînim. Yaqût divê ji guleke sor, sortir be û safir dê şîn be wek deryaya mezin.”

“Li meydana jêr got prensî “keçikeke biçûk a kibritfiroş rawestiyaye. Kibritên wê ketin nava coyê hemû şil bûn. Bavê wê dê lê bixe ku hinek pere nebe malê û ew digirî. Di piyên wê de pêlav an jî gora saqdirêj tune ye û serê wê yê biçûk rût e. Çavê min ê din derîne û bide wê û dê bavê wê li wê nexê.”

“Ez ê şevêke din ji li cem bimînim,” got Xecxecokî “lê nikarim çavê te derînim. Lewra tu yê bi temamî kor bibî.”

“Xecxecok Xecxecok, Xecxecokê biçûk” got, Prensî, “bike, wek ku ez fermanê didim te.”

Wî çavê prensî yê din jî deranî û digel wî berjêr firî. Ji nişka ve hat xwarê cewher berda kefa destê wê. “Çi cameke xweşik e” got qizika biçûk; û wê bi ken bazda malê.

Paşê Xecxecokê biçûk vegeriya ba Prensî. “Tu niha kor î” wî got, “Loma ez ê her tim li ba te bimînim.”

“Na, Xecxecokê biçûk” got, Prensî, “tu divê biçî Misirê.”

“Ez ê her tim li ba te bimînim,” got, Xecxecokî û li navbera lingên Prensî raza.

Roja din heta êvarê ew li ser milê prensî rûnişt û çîrokên welatên biyanî yên ku lê geriyabû got. Wî jê re qala çûkeke masîxur a sor kir ku li dor û berên Nîlê yên dirêj dijiya, bi nikulê xwe zêremasî digirt; û Sphinx, ku bi qasî cîhanê kevn bû û li çolê dijiya û bi her tiştî diza-nibû; û bazirganên ku hêdika li kêleka hêştirên xwe diçûn û di destên wan de tizbiyên karîban hebûn; û Şahê Çiyayên Hîvê yê ku wek sîdarê reş e û ji kiristaleke mezin re perestîşê dike; û marê kesk ê mezin ku di nava darên palmiyeyê de radiza û bîst keşeyan ew bi kateyê hungîvîn xwedî dikir; û çûçanên ku di ser go-leke mezin re bi pelên mezinên pehn derbas dibin û her dem bi pîrpirikan re şer dikin.

“Xecxecokê delal,” got, prensî, “tu ji min re tiştên niwaze dibêjî, lê êşa mêr û jinan ji her tiştî niwazetir e. Razeke ji bedbextiyê mezintir tune ye. Li ser bajarê

min bifire, Xecxecokê biçûk û tiştê ku te dît ji min re bêje.”

Xecxecok li ser bajarê mezin firî û dît ku zengîn di hundirê xaniyên xwe yên bedew de dilşad in dema ku parsek li ber deriyê wan disekinîn. Ew di nava kuçeyên teng de firî û dît ku rûyê spîçolkî yên zarokên birçî ku bê qidûm û pertav li kuçeyên reş dinihêrin. Li bin pirekê du kurikên biçûk vezeliyabûn ketibûn ber hev hewl didan ku hev û din germ bikim. “Em çiqas birçî ne” wan got. “Hûn divê li vir venezelin” got notirvan û beredayî li ber baranê geriyan.

Paşê vegeriya û tiştên ku wî dîtibûn ji prensî re gotin

“Ez bi zêrê baş hatime kiraskirin,” got, Prensî “tu divê wî pel bi pel ji min bikî û wî bîdî jarên min; zindî her tim wisa bawer in ku zêr dikare wan dilşad bike.”

Xecxecokî pel bi pel zêr rakir heta ku Prensê Dilşad bi temamî cûn bû û bêreng ma. Wî pel bi pel zêr rakir bir da xizanan. Rûçikên zarokan bihêvîtir bû. Ew kenîyan û li kuçeyan leyîstin û wan kir qîrîn got “êdî nanê me heyê!”

Piştê berf barî û piştî berfê qeşa çêbû. Kuçe wisa dixuyan ku te digot qey ji zîv hatine çêkirin, wisa dibiriqîn û diçirîsîn; zimzîlkên dirêj ên mîna xencerên krîstal bi sifirnekên xaniyan de dalqiyabûn. Her kesî kurk li xwe kir û kurikên biçûk kolosên sor dan serê xwe û xwe li ser cemedê berdan.

Li Xecxocekê biçûk sartir û sartir bû, lê wî nikaribû ji prensî veqete, lewre wî pir jê hez dikir. Wî hûrikên nan ên ber deriyê firûnan nikul kir dema ku nanopê xuya nedibû û hewl dide ku xwe bi vekutana baskên xwe, xwe germ bike.

Lê di dawiyê de wî zanibû ku ew ber bi mirinê ve diçe. Wî tenê hêz dît ku careke din bifire bê ser milê prensî. “Bi xatirê te prensê delal,” wî kir miremir, “tu destûrê didî ku ez destê te maç bikim?”

“Ez kêfxweş im ku tu êdî diçî Misirê, Xecxecokê biçûk” got, Prensî, “tu gelek li vir mayî; lê divê ji lêvan, min maç bikî, çimkî ez ji te hez dikim.”

“Ez naçim Misirê” got Xecxecokî. “Ez diçim mala mirinê, mirin birayê xewê ye,

ne wisa?”

Û wî Prensê Dilşad ji lêvan maç kir û ket xwarê, li nav lingên wî mir.

Di ve demê de qirçîneke ecêb ji nava peyker hat, fena ku tişteke şikestibe. Rastî ev bû ku dilê bi kul di navê de bû du cî. Ev bi rastî sermayeke sosret bû.

Sibetirê zû şaredar li meydana jêr li nav şirketê tevî encûmenê bajêr digeriya, dema ku ji stûn ve dibihurîn serê xwe rakir li jor li stûn nihêrî: “Xwedêyo! Prensê Dilşad çiqas jar û kevn dixuyê!” wî got.

“Bi rastî kevn bûye!” got, encûmenê bajêr ku her dem hemraman bû digel şaredar û ew derketin jor ku lê binihêrin.

“Yaqûtê ser destiyê şûr ketiye, çav winda bûne, kirasê wî yê zêrîn êdî tune ye” got, şaredar “ji parsekekî piçekî çêtir e!”

“Piçekî ji parsekekî çêtir e” got, payîzê bajêr.

“Çivîkek mirî li nava lingên wî ye!” got, şaredarî. “Em divê bi rastî daxuyaniyekê bidin ku çivîk li vir nemirin.” Û nivîsevanê bajêr nivîseke pêşniyariyê nivîsî.

Wan peykerê Prensê Dilşad anî xwarê. “Ew êdî ne bedew e û bi kêrî tişteki nayê,” got, profesorê hunerê li zanîngehê.

Paşê wan peyker di firûne de heland û şaredariyê civînek li dar xist ku biryarê bidin dê lajwerd (metal) çawa bikin. “Divê peykerekî me yê din hebe, béguman û divê ev peykerê min bi xwe be.” wî got.

“Ê min” got, her yekî ji encûmenên bajêr û pevçûn.

Dema ku cara dawîn min ew bihîstin wan hê fikir galegal.

“Çiqas tişteki sosret e!” got, serekhosh-tayê karkerên darêjxaneyê. “Ev dilê şikestî yê qurşûnî dê di firûnê de nehele. Em divê wî bavêjin.” Loma wan ew avêt sergo ciyê ku jixwe Xecxecokê mirî lê vezeliyabû.

“Ji min re du tiştên girîngtirîn ên bajêr bîne.” Got Xwedê ji ferîşteyêke xwe re; û ferîşteyê ji wî re dilê qurşûnî û çivîkê mirî, anîn.

“Bijartina te rast e” got Xwedê. “Ev Xecxecokê biçûk dê li baxçeyê min ê bi-huştê tim û tim bixwîne û dê di bajarê min ê zêrîn de Prensê Dilşad şukr û spasiyên xwe pêşkêşî min bike.”

Vegera jiyanê

Kamran Simo HEDILÎ

***Ji pakrewanê 25'ê Gulana 1988'an, Mazlumê biçûk (Îhsan Çirkan)
û hevalên wî Cemşît, Ferhan, Îsmet, Leyla, Ferîq, Zekî, Darar,
Rûstem... Yên li Benavoka Şemzînanê gihane karwanê pakrewanan***

Mîna pingbûna avê
pingbûna hêrsa dilê xwe
tu diparêzî şîrîno
bi stranên mêrxasan
Yêzdanên derewîn radikî nimêjê
kulîlkên tolhildanan
mijgulên te xemilandine
lehiyên ramanan
di ber çavên te re diçin
hişê te
li çiyayê Govendê ma
li kemîna çemê Benavokê
tu stranan bêdeng dibêjî
bi bayê awazên xwe
te hemû pût rakirine dansê
vêga dest pê kir
strana lehengan
strana bê guman
strana xwe di rûbarên gumana de şûştî
dest pê kir bira!
pelên darên maziyan
bi kevokên birindar re dinalin
nalînên pelên daran
dibin awaz û loriyên dayikan
kulîlkên Benavokê
di şînê de dilerizin
çiyayê Govendê
di nav deryaya agir de diheje
Cîlo û Feraşîn ji tirsan digirîn
tîrêjên rojê di ser Govendê re
xwe berdidin
ser neqîşên rondikên dayika te
mîna ketina stêran
hûn ketin delalo
çeka te
xwêdangirtî
di destên te de tevizî

heval û hogiran rahişt xencera te
li Benavokê ye
hezkirina biratiyê
hezkirina hevaltiyê
li wê ye xelata dirokê
tolhildana êşê
li wê xakê
bi hesreta serkeftinê hatiye strîn şîrîno
erê erê ezîzo!
dev ji strana mêrxasan
bernede û vegere jiyanê
herikandina awazên bayê çiyayan
gulên hêviya jiyanê ne
destûrê bide
bila baran êşa dil bireşîne
bila bişo kîn û xemgîniyê şîrîno
hûn destanên kevn dixwînin
li diroka virek dinêrin
û dimenên bi xwîn dibînin
hûn firotina zarokên me
li sûk û bazarên rûreşan
kuştina lehengên dozê
bi stranên xwe dibêjin
hûn wênekêşên dema xwe ne
strana li ser ziman winda
dilopa xwîna ku
di kenarên lêvan de hişkbûyî
ramanên di mejî de sar
fermana di gewriyê de xeniqî
tirsê nimêjê ji zaliman re dike
kirasê rengê kulîlkan lê hişkbûyî
awirên bi xwîné dirêjin ser zinarên bê ax
hûn wan dîkin pirpirîk û difirînin şîrîno
hûn bi Ferhad re peykeran çedikin
peykerê kevn û nû dîkin yek...

hûn naxwazin zarok
 ji pirtûkên dîroka virek
 ji mamostayên zalim
 fêrî hatina xwe bibin
 hûn bi kî nê distrên evînê
 bi tolhildanê mezin dîkin evîndariyê
 ji we fêrî her tiştî dibin zarokên rojê
 û dîrok ji nû ve tê nivîsandin şîrîno
 îro keştiya bihara te li bejê maye-
 awirên te sar bûne
 ava hêviyê qediyaye
 di nav kemîn û davên durû de
 di xefkên xwefiroş de
 xemgîniya danê êvarê
 pencereya rûyê te girtî ye
 bêhna kulilkên Benavokê
 li ber pozê te
 dans û semayê dîkin
 bayê çiyayan
 bawesînê li guliyan te yên xwêdangirtî dike
 cemê xwînmiş
 li defa cengê dide
 çar teref tijî bûne
 ji dengê fermana Cemşît
 rabe binêre
 Leyla jî li ba te ye şîrîno
 lêvên te ziwa
 tu tî yî?
 bi strana “Şahîno” dilê xwe hênîk dike
 kulilkên tolhildanê
 mijgulên te xemilandine
 li dijî berdoş û serseriyên gerdûnê
 ba dê bibînê
 Ala me
 zeviyên me
 tovê hêviyên me
 û hêstirên îro dibarin ji çavên roja me
 çavên te li dûr dinêrin
 tu evîndar î ciwano
 porê te belav bûye
 di nav xwêdana xeman de
 kulilkên hêviyê li vir in

rojên tên yên me ne
 lê ku raneweste
 eniya zayîna zanînê
 û sar nebin
 çekên xwêdangirtî yên tolhildanê
 wê çaxê stêra sibê
 a me ye
 asoyê beyanê li aliyê me ye
 roj dê bibe ya me
 dev ji stranê bernede
 vegere jiyanê
 dema vegera
 Meydana şahiyê hat
 bêhêvîtiyê veguherîne hêviyê
 şikestina bike serkeftin
 dem û çavên ji bêhêvîtiyê ziwa bûne
 rûbarê hêviyê
 bi ser wan de vala ke
 dema dengê te ye
 xwe bi ser
 sûr û bedenên de berde
 aso bigire
 Leşkerê hêviyê
 Mazlumê biçûk
 gula Mamediya
 stêra Çiyayê Agiriyê
 sebr û aram vala ye
 êş û evîn çeka te ye
 ku lêdana dilê te
 êş û kîn
 an şahî û evîn be
 me di teştê dile xwe de
 bistriya
 û bike hevîrê jiyanê
 xweşiko

Çima na

Îsmâîl DÎNDAR

Riya mala Mele Yûnis, di ber mala Narînê re derbas dibû. Her du mal jî di sikakeke teng de bûn. Xaniyên yektebeqî, hewşa wan bi qirşikên pêmbû û hijikên dara biyê hatibûn sênckirin.

Narînê, bi azana meleyî re şiyar dibû. Heta roj diçû ava şiveke hişk di destê wê de bû; zerezewatê ku li hewşa xwe diçand ji mirîşkên xwe, mirîşkên xwe jî, ji pisîk û seyên ziyarok diparast. Kesekî wê yê xebatê nemabû. Mêrê wê, berî heft salan bi wê nexweşiya bêderman ketibû, Narîna bêbext bî, zar û zêç jî bê serî mabûn. Piştî kurê mezin, keça wê ya mezin jî çûbû. Bi tena keçeke heşt salî û kurekî deh salî bê kes û kus bû niha. Li gund çawan be, Xwedê diqedand. Sê çêlek û çend bizinên ku xwedî dikirin têra devê wan dikir. Li gundan, çawa be, kes jî nêza nedimîr. Xwedanxêr pir bûn. Ku bi şîva miriyan be, feqîr birçî naminin. Ma li vî bajarê bêrehm ku kes silava Xwedê li kesî nake?

Çar mirîşkên din jî bi hêkan ketibûn. Êdî dikaribû rojê pazdeh hêkan bifiroşe. Ku çêleka zer jî bizê, ew ê rojê ne kêmi bîst kilo şîr jî bifiroşe. Çi qas ne bi dilê zarokên wê jî bû, wê her du çêlekên xwe yên bişîr û ciwan nefirotibûn. Mirîşkên xwe tevî kurkê kiribûne selikan û mala xwe anîbû vê taxa ku weke teriyekê, xwe bi keviya bajêr ve girtiye.

Narînê, binê çêlekên xwe malîstibû, em û ava wan jî tije kiribû. Li ber diwarê hewşê, ber bi tava rojê ya payîzî rûniştibû. Darikek girtibû destê xwe, weke zarokeke biçûçik, bi serê darikekî, ax dibir vî aliyî û wî aliyî.

Bi hejandina darik, hişê wê çûbû heyama jiyana gund. Hal û wextê wan xweş bû. Hevserê wê li ser xwe bû. Bikêr bû, hoste bû. Destên wî zêr dibirîn. Ji aliyekî ve xanî lê dikirin, ji aliyekî ve sewal xwedî dikirin û ji aliyekî din ve jî çandiniya

xwe dikir. Ji bilî Xwedê, pêdiviya wan bi tu kesî tune bû. Her cara ku dihat bîra wê, digot, “Xwedê mala xêrnexwazan û Beko Ewanan xera bike, ji binî ve. Wan kesên ku giliyê gundiyan kirin û bûn sedema şewitandina gundê me yê mîna bihuştê. Her yek ji me bi aliyekî ve belawela bû. Em bûn feqîrên li ber diwaran, dilên li ber destê zaliman. Hesreta hinan ji me bû gezek nanê tisî. Xwedêyo, tu ji fesad û zaliman re nehêlî, înselâh.

Îro, roja dana mehmîza karmend û karkeran bû. Du kurên Mele Yûnis di karê dewletê de dixebitîn, keçeke wî jî berî du salan bûbû karmenda şaredariyê. Gava serê xwe ji ber xwe rakir, dît ku Mele Yûnis û keça xwe ya karmend ji sûkê ber bi malê ve tîn. Destên her duyan tije bûn. Mele Yûnis, sakoyekî nû mîna yê axayê gund avêtibû ser milên xwe û qondereyêke reş ku li ber tîrêjên rojê weke awênayekê diberiqî, kiribû lingê xwe. Şûr simbilê meleyî nedibirî. Dema gihîştin dehma Narînê, bi serê zimên û hinekî bi tinazî, meleyî got: “Narêêê, tu çawa yî lêêê?”

Narînê, weke navê Xwedayê xwe dizanibû ku, her du zarokên wê bi destê Mele Jehro (Ji roja ku zarokên wê çûbûn ve, ji Mele Yûnisî re digot, Mele Jehro) û zarokên wî gihîştên ên derve. Loma dema ku çav lê dikir, mîna ku çav li neyarê bavê xwe bike, jê aciz dibû. Lê gelek caran, dema ku hinekî kûr li meseleyê û li rûdanên ku li hawîrdor pêk tînin difikirî, digot, “Ma ku Mele Yûnis nebûya dê bi alikariya hinên din biçûna. Her duyan jî ruhê xwe avêtibûn ser çiyê, ku min ew bi zincîran jî girêdana çare nebû, wan dê teqez xwe bigihanda nav refan.

Lê piştî ev qas bûyer, dema bihist ku şaredariyê, ji mala Mele Jehro re gotiye, kesekî ji malbateke ku hin ji wan çûne, ji me re bêjin, em ê kesine ji wan têxin karê

şaredariyê û wan jî tavi lê navê keça xwe ya ku a niha mîna qazên ber çeman qûna xwe xwaro mehro dike, kirine kar, dixwest ku xwîna hinan ji mala Mele Jehroyî vexwe.

Loma gava cara pêşîn Mele Yûnis pê re axivî, Narînê ponijî, qet bersiv nedayê. Lê dema Mele Yûnis, cara duyem got:

“Çavo, Narînê bitir bûye nema bi me re diaxive. Tu dibêji qey me bavê wê kuştîye.” Hingê, Narînê dîn û har bû. Hema ji nişkê ve rabû ser piyan. Desmala reş li serê xwe rast kir, çavê xwe girt û devê xwe vekir:

- Çima na? Zikê te û zarokên te tîr, tûrikê we jî heta ber dev tije ye. Kuro sextekaro, şeytano! Ev hê jî zimanê te digere û bêşerm tu diaxivî jî ha! Ma ku rûmeta mirovan bi te re hebûya, tu derdiketî nav mirovan ha!

- Çima, ma min tirşika bavê te xwariye, ev çi hêrs û kîna te ye li hemberî me?

- Xwezî Rebî, tirşik bibe quzilqurta ser dilê te. Te xort û xameyek nehişt ku te neşiyandin, riya çûnûnehatinê.



- Ma ez çi bêbextê, kes dikare bi zorê kesî bişîne cihekî? De ka bêje.

- Herê, ez dizanim, kes nikare kesî bi zorê bişîne tu cihî lê çima tu li rewş û

tevgera xwe nanêrî? Ku desteyek xort û xama yê gihîştî di mala te de ne. Ne li ser xêrê be, navê hemûyan bi Kurmancî ye jî. Çima yekî/ê ji wan negot, ez jî, ha! Û ev jî ne bes bû, te keça xwe ya rizî ku ne hêja ye neynûkeke keça min a weke xezalan, xist karê şaredariyê. Ma ew para te bû, Ma ji te pêştir kes nemabû, bêbexto ha!

Dema Mele Yûnis ev gotin bihîstin, gavên xwe bileztir avêtin. Dizanibû ku ji vê gavê pêştir ew nikare bersivekê bide. Jixwe gava ku bi ser vana de, Narînê bi gotinên “Ma kurên te nêriyên tov, keçên te xatûnên li ser têxt in ha, xêr ji xwe nediyo?” Ax-aftina xwe domand, meleyî ne li Narînê zivirî ne bersivek dayê. Serê xwe tewand û li nik keça xwe ya ku Narînê jê re digot “Hele li keça wî ya qûnxwar binihêrin, ê nizanibe ew ê bêje, ev ne keça Mele Jehro ye, keça qurqur begê ye.” Ber bi mala xwe ve çû. Lê hêrsa Narînê dilê wê dikeland. Mele, ji Narînê dûr ketibû. Dengê wê nediçûyê. Narînê, weke ku îbadetê bike, destên xwe berhev kirin û piştire ber bi asîmanî hilda û got:

-Xwedo, Xwedo! Edaleta evdan tune ye, ma edaleta te jî tune ye ûûû...



Xwezi

**Ji xala xemê hilpekîm
Di xewna jêrxeran de hilweşiyam
Hêj li hewa
Bûm wexma xizînên gewriyê
Gewriya “xwezi”yê
Xweziya gewriyê;
Xwezi wiha (ne)bûya!
Xwezi wiha (ne)bûya!**

Nasekinim

**Nîvtemen e ku
Di binê bîra bêbinî de digêrim
Li zevî û zibara azadiyê;
Du gavan kêlekanî
Sê gavan dirêjkanî
Ji wir û pê ve dîwar in kambaxê
Jê naborim
Her nasekinim jî**

Vîn

**Li diyarê ku vîn avê diheri-
kîne
Li min bigere
Belkî nexenîqîbim
Lê nexerikî me
Li cihê xwe me**

Zekî KAYAR

Mêrik û dêw

Îsmail GUVEN

Cayêk beno, cayêk nêbeno. Yew mêrik esto, yew lajê ey esto û yew zî cinîya ey esta. Mêrik, qeleyan ra zaf terseno. Tersa qeleyan ra, nêaftano linge bierzo teber. Seba ney zî çer rê teber nêkeweno. Û no rewşê ey, bi seran dewam keno. Wextêk ra pey, cinîya ey zî mêrikî ra eciz bena. Êdî mêrikî, keye de nêwazena. Camêrd ke nan nêyaroye keye, qey camêrd o! Rojêk, cinîye lolikan virazena, zereyî lolikan bi here kena de û dana lajê xo û lajê xo ra vana: *‘Nê lolikan bibere leweyî banî û weyra ra bierze war.’* Laj, sey vateyê dayka xo keno û leweyê banî ra lolikan erzeno war. Cinîye, ca de venena mêrikî û vana: *‘Mêrde, mêrde biewne lolikî hê varanî ezman ra. Hetanî ke şarî heme arê nêdayî, bivêje teber û çend heban zî ti arê de.’* Mêrik, vano qey rasta zî lolikî hê varanî. Vejîyeno teber. Cinîye ca de venena lajê xo; lajê xo gena zere û ber mifte kena. Mera/encax, ew çax mêrik fam keno ke xap pê xo bîya. Ageyreno, çend ke cinîya xo ra vano *ber abike*, zî cinîye ber anêkena. Mêrik, êdî hêvîya xo birneno û cinêke ra vano: *‘Ca ke ti ber anêkena, qinî nanêk û hakêk û tay toraq bide mi, ez xo rê rayir de wena.’* Cinîye, nan û hak û toraq dana mêrikî; mêrik înan geno û dano ra, şino.

Mêrik gelek rayir şino, êdî batalîyeno. Seba aresayîşî, serê kerayêk de nişeno ro. Hema tam nêareseno ke, vînenoyê durî ra dêwêk ho yeno, ver bi xo. Mêrik terseno, ke dêw nanê xo biwero. Ca de, hak û toraqê xo binê ardî de nimneno. Û newe ra serê kerayê xo de nişeno ro. Dêw yeno verê mêrikî û mêrikî ra vana: *‘Ey merdim, ti senî curret kenî ke ti ameyî cayê mi? Qedîyayîşê to mi dest ra çin o; ez do to biwerî.’* Mêrik êdî tam, terseno; labelê tersa xo belî nêkeno. Dêwî ra vano: *‘Ti*

kam î ke ti mi wenî? Ez to ra hîna hêzdar a. Ez pê zengneyî, mezgê ardî vejena, ti eşkenî bivejî?’ Dêw, xo ra êmin: *‘Mêzgê ardî çîyo? Ez zî eşkena bivejî.’* Mêrik vano: *‘Temam. Kam ke nêeşka mezgê erdî bivejo, wa ew bîn ey biwero.’* Dêw vano, *temam*. Xora zengneyê mêrikî çin o, tena zengneyê dêwî esto. Zengneyê dêwî zî hende gird o ke, hendê qama mêrikî yo. Dêw zengneyê xo geno, şino cayêko kerên, çend ke ti ra yena, zengneyê xo keno berz û dano ard rê. Kerayî benî hurdî hurdî, sey wele. Ard de çalêk virazîyena. Labelê bê kereyan û here çik nêvejîyeno binê ardî ra. Mêrik vano: *‘Ho ça mezgê ardî? Bide mi no zengneyê xo û bivîne camêrdî senî mezgê ardî vejênî.’* Dêw zengneyê xo dano mêrikî; labelê hende giran o ke mêrik bi zor besekeno ke zengne berz bikero. Areq de maneno. Zengneyî geno û şino, cayo ke tede hak û toraqî xo nimit bî. Bi zorî zengne ard ra keno berz û serî hak û toraqî de dano piro. Wexto zengne gineno hak û toraqî rê, virtika hakî zît bena werye. Bi here reyde, toraq û hak, vejîyenî teber. Mêrik zengneyî erzeno ard û dêwî ra vano: *‘De bivaje, ez to senî biwerî.’* Dêw vera no rewşî de, mêrikî ra terseno û seba ke mêrik xo nêwero, mêrikî ra efû wazeno. Gelek lêbîyeno, mêrik vano, *temam ez to efû kena*. Dêw vano: *‘Ewro ra pey ti birayê min î. Bê ma şî keyeyê ma. Mal û milkê ma zaf o, şeşna birayê mi estî, ma êdî pîya bimane.’* Xora, ne banê mêrikî esto, ne zî çîyêkî ey. Vano, *temam*. Dêw ey zî geno û pîya şinî keyeyê dêwî.

Seba ke dêw, birayanê xo ra zî vano ke nê mêrikî mezgê ardî veto, zaf hêzdar o, ma heme zî nêeşkenî pê; pêro dêwî, mêrikî ra tersenî. Mêrik zî no rewşî vînenoyê wazeno tersa înan hîna girde

bikero. Rojêk dêwo pîl mêrikî ra vano: *'Bira ti zanî tîya de her karî ma pîya yo. Ma pê dore kenî. Ewro zî dore ameya to, ke ti şêrî ma rê awe bîyarî.'* Mêrik vano, *temam bira. Ti seba kiriştişî awe, mi rê çîyêk bîyere, awe ardiş rehet o.* Dêwo pîl, mêşka gamêşî dano mêrikî û vano, *naye fekan ver deke.* Mêrik meşke geno û şîno verî gole. Gole zî, cayê înan ra zaf dur a. Mêrik ewnîyeno ke meşke zaf gird a. Saetêk de nêeşkeno pir bikero; pir bikero zî nêeşkeno webigiro. Labelê, eke dêwî bivînî mêrik nêeşkeno meşke webigiro, fam kenî ke mêrik hêzdar nîyo û tersa înan zî qedîyena. Û no rewş de mêrikî wenî. Mêrik fenêk keno; tena yewbine awe keno meşke û binê meşke keno de, cayo bîn heme pif keno û bi pifkerdişî meşke keno girde. Mêrik, meşka pifkerdiye erzeno xo şe le û keweno rayir. Wexto keweno nêzê banî, vînenno ke hewt heme dêwî zî serê banî de nişti ro û hê xo temaşe kenî. Da pancas metre durê banî de vindeno, meşke keno qême û pişeno xo ser. Seba ke fekê meşke beno a, heme cîyê meşke şîno û meşke nişena. Dêwî ke leweyê banî ra mêrikî temaşe kenî, wina fam kenî ke mêrikî heme awa meşke werda û qedînaya. Ca da vazdenî, şîni verê mêrikî. Mêrik vano: *'Qisurê mi meewnêne birayîn. Hende rayir ra pey ez biney batalîyaya û bi vat ez biney awe biwerî. Labelê ti nêvanî, mi heme qedînaya. Şîma tîya de bivindêne, ez newe ra şîna û awe kena de û şîma rê ana.'* Dêwî vanî: *'Nê bira, qey beno ke ti şîni? Ti şo ronîşe, ma şîni û awe anî.'* Mêrik xo zere de vano, *xasîya şîma şîni. Xora ez êdî nêeşkena linge bierzî.*

Payîz diyno, her roj dêwêk şîno û game ra qasî çend berdan velg ano. Rojêk, dêwo pîl mêrikî ra vano: *'Bira ti zanî bizi ma zaf î. Ganî ma seba bizanî xo velg bîyare û seba zimistanî binimne. Ewro dora to ya, ti şo velg bîyare.'* Mêrik vano, *temam.* Dano piro û şîna game. Ewnîyeno

ke velg zaf o, labelê do senî bikirişno keye. Mera/encax di, hîrê girzeyan webigiro, di, hîrê girzeyî zî zaf tay î. Mêrik qasî panc berdan velg birneno û erzeno pêser. Dima ra adir nano velgî ya. Dêwî keye de paweyê mêrikî vîndenî, wexto vînenî ke game ra duyêk bîyo berz, danî piro şîni game. Wexto vînenî, mêrik ho velg birneno û adir nano pa, ti ra persenî: *'Bira ti hê sekenî?'* Mêrik vano: *'Xora ma zimistanî, pelo huşk nêdanî bizan? Mi vat, wa nika ra huşk bo; ma nêeşkenî di rey huşk bikere.'* Dêwî xo bi xo vanî, eke ma biverde no mêrik heme game vêşneno. Û mêrikî ra vanî, *temam bira to şo keye, ma herinda to de zî velg anî.* Dêwî velg ardiş ra pey, na rey şîni game ra daran anî.

Seba ke zimistanî tê finî û xo germin bikerî. Her roj dêwêk şîno game, rasneyê xo lêfneno darêk ra û dare bin ra anceno we û ano keye. Rojêk dêwo pîl mêrikî ra vano: *'Bira ewro dora to ameya. Ganî ti şêrî game û darêk bîyerî.'* Mêrik, rasneyê xo geno û dano piro, şîno

game. Darêk wegirewtîş, çîyêko bêimkan o seba mêrikî. Hem zî ristim ra weantiş û dima ra wegirewtîş! Mêrik, ancîya gêreno ke fenêk bikero û no karî ra zî biqedîyo. Dêwî gelek wext paweyî mêrikî vîndenî, wexto vînenî ke mêrik zaf erê kewto, vanî qey çîyêk ameyo sereyê mêrikî. Seba ney zî danî piro û şîni game. Wexto mêrik durî ra dêwan vînano, ca de rasneyê xo hethetî da, vîst daran ra anceno û peşta xo şaneno darêk û cixareyê xo pêşeno. Seke qet haya xo, dêwan nêba. Dêwî, wexto mêrikî ew rewş de vînenî, ti ra persenî: *'Bira, serê sibayî ra ti ça mendî? Ma meraqê to kerd.'* Mêrik vano: *'Birayîn, her roj yew dare antiş û berdiş keye, karî gedeyan o. Mi vat, wina nêbeno. Û seba ney zî mi vat ke, ez no cixareyî xo bişimî û nê heme daran carêk de bianci we û bîyarî keye. Labelê, şîma zî vînenî rasneyê mi kilm o û mera ez eşkaya da, vîst daran ra bilêfnî. Xasîya şîma ameyî. De rasneyanê*

xo zî bidêne mi, ez rasneyan pêser bikî û heme daran carêk da biancî we û bîberî keye.’ Dêwî vanî qey, mêrik rasta zî sey vateyê xo keno. Seba ney zî tersenî û vanî: *‘Wina meke bira, nê darî pawiyeyê dewijan î. Eke ti wina bikerî, do dewijî bi çekanê xo bîyerî ma ser û ma bikişî. Tî qarişî çik mebe, ma her yew, darêk genî we. Ma rê seba no zimistanî bes î.’* Mêrik vano: *‘Ca ke şîma wina vanî, wa sey şîma bo.’* Û her yew dêw darêk geno we û şînî keye. Nê kerdinanê mêrikî ra pey, êdî dêwî tam ti ra tersenî. Rojêk, wexto mêrik keweno ra, dêwî xo miyan de yenî pêser û na mesele ser de qise kenî. Dêwo pîl, dêwî qijî ra vano: *‘Bira ti siba, no merdimî ra bivaje ke êdî ma her kes şînî cîya, şînî yewna keye. Ma heme malê xo bar kenî û tay zî danî merdimî, wexto no merdim ma miyan ra kewt dûrî, ma ancîya yenî pêser û sey verî, keye kenî. Eke ma no merdimî ra nêqedî, do rojêk no merdim ma biwero.’* Birayî bîn heme, no vateyê dêwî pîlî testîq kenî. Û rojo bîn birayo qij mêrikî ra biryarê înan vano. Mêrik û hewt dêwî yenî pêser, malê xo bar kenî. Mêrik vano: *‘Tena zerdan bidanî mi, ez çiyêkna nêgena.’* Dêwî xo bi xo vanî, *ma no merdimî ra biqedî, wa zerdî ma şêrî.* Û seba ney zî heme zerdan danî mêrikî.

Dêwo qij, keweno vernîya mêrikî, zerdanê ey geno we û ey beno gumeyêko verîn û xirabe. Wexto zerdanê mêrikî nano ro, seba ke zaf batalîyayo, nefesêko xorîne anceno û dima ra vano *‘ooofffff’*, nefesê xo dano teber. Nefesê dêwî ra mêrik keweno hewa, sey pelê dare hewa de şiyeno. Dêw mêrikî ra perseno: *‘Bira ti hê sekenî buestun de?’* Mêrik vano: *‘Wextêk, kalikê mi tiya de kalmeyê xo nimit bi, ez do pê kalmeyê kalikê xo sereyê to ti ra bikerî.’* Dêw terseno, qijîyêk ginena piro û xo bi zor erzeno teber; bivazd remeno û şîno. Mêrik, ewnîyeno ke gume, cayêko rind o. Gelek hîra yo û germin o zî. Biryar geno ke êdî gume de bimano. Gume de, verî pixêrî de keweno ar ra û wina vindeno. Labelê, wexto êdî beno şan, vengêk yeno ey. Warzeno we, ke çi bivîno; dêwêk bola bizan eşta xo ver û ho bizan

keno zereyê gumeyî. Dêw heme bizanê xo keno gume û dima ra yeno zere. Dêwêko gelek gird û yewçim! Mêrik vînenno ke yew çimê dêwî kor o. Wexto dêw mêrikî vînenno kêfê xo yeno û dest keno kelê xo sere rê û kelê xo ra vano: *‘Kelo, biewne çend bextê to esto. Ganî mi ewro to biwerdêne, la ti vînenî, merdimêk ameyo, bîyo mêmânê mi, wazeno mi rê şame bo. Tî ewro zî xelesîyayî.’* Dêw yeno zere û berê gumeyî qefelneno û kerayêka girde peyê berî de nano ro. Ageyreno mêrikî ser û mêrikî ra vano: *‘Ez nika zaf batalîyaye ya. Ez ha verê pixerî de kewena ra û şîşa xo zî erzena adir. Kam wext ke şîşa mi adir de bîye sure, mi aya bike. Ez do ew çax to na şîş a bikerî û biwerî.’* Mêrik ters ra, nêşkeno çik zî bivajo. Xo anceno quncikêk. Dêw şîno û verê pixêrî de keweno ra. Şîşa ey zî ha miyanî adirî de. Gelek wext ser de şîno, mêrik vînenno ke şîşe êdî tam biya sure. Xo bi xo vano: *‘Eke ez dêwî aya bikî, xelesîyayîşî mi çin o. Nika rakewte yo, çîyo baş ez pê şîşe çimê ey o weş zî kor bikî.’* Mêrik şîno verê pixerî, şîşe miyanê adirî ra anceno. Labelê seba ke dêw rakewte yo û çimê dêwî qefelneye yî, mêrik nêzano ke kam çimê dêwî weş o. Mêrik gelek fikirîyeno, peynî de hema şîşe keno çimêkî dêwî ra. Qijîyêka wina girde dêwî ra vejîyena ke mêrik qurf keweno. Ca de vazdeno û miyanê bizan de xo nimneno. Yiqbalê mêrikî esto ke şîşe rastî çimê weşî şîya. Êdî dêw her di çîman ra zî nêvînenno. Destanê xo keno a, quncik quncik gêreno. Dêw keweno nêzî mêrikî, mêrik vazdeno qunciko bîn. Hetanî ke dêw raseno qunciko bîn, mêrik vazdeno û şîno yewna quncik. Belkî yew, di seetî wina vînenî. Peynî de dêw batalîyeno. Şîno û verê pixêrî de nişeno ro û mêrikî ra vano: *‘Bivazde, gelo hetanî kem ca? Tî şêrî ça, ti sate ra war nîni? Serê sibayî ez do verê berî de ronîşî û bizanê xo yew yew teber bikî. Ganî ti zî ber ra teber nêkurî. Nika ti çî kenî bike.’*

Mêrik zereyê emarî qaxan û gozan de ca dano xo. Hem qax û gozanê xo weno û hem zî gozan dano emarî rê û veng

vejeno. Bi no hewa nêwerdeno dêw bi rehetî rabikewo. Dêw vano deqê, mere kewto emar. Dêw vano: *'Hero mere. Xora ewro merdimêk mi rê bîyo bela. Ti zî mi hêrs meke.'* Wextêk ra pey, dêw keweno ra. Mêrik emar ra vejîyeno û şino kelê dêwî sere birneno. Goştê kelî heme weno û postê kelî zî geno pira. Êstrîyanê ey zî serê sereyî xo de nano ro. Serê sibayî dîyeno. Dêw beno aya û şino berê gumeyî keno a û fekê berî de vindeno. Fekê berî de palanê xo keno a û her yew bize, yew yew binê palanî xo ra vîyarneno, keno teber. Mêrik ke postê kelî girewto pira, vindeno peynî. Wexto êdî heme bizî qedîyenî, mêrik şino.

Dêw, êstrîyan ra destanê xo çarneno û vano: *'Kelo, ganî mi vizêr to biwerdêne. La êdî ez to nêwena. Hetanî ke ez weş bî ez to nêwena.'* Wexto dêw wina vano, mêrik êstrîyanê xo dano hakanî dêwî rê û xo erzeno teber û dêwî ra vano: *'Mi kelê to sere birna û werd zî. Eke ti camêrdî, bê min de gulaşe bike. Eke to mi na ro, mi biwere. Labelê eke mi to na ro, ganî ti nê heme diwarî xo bidî mi.'* Dêw vano: *'Temam, ez qebul kena. Labelê, ganî ma cayêko duz de gulaşe bike.'* Mêrik vano: *'Bê ma şî cayêko duz. Tîya kerên o.'* Mêrik dêwî xapînenno, beno cayêko kerên û zinarî. Seba ke dêw tewê nêvînenno, rewş ra bêxeber o. Mêrik vano, *'Biewne ma*

ameyî cayêko duz, hadê dest pê bike.'

Wexto dêw, çend gaman erzeno, rehsikeno û gineno ar. Zinar ra lêr beno, gineno kerayan rê û beno lete lete.

Mêrik zî heme bizanê dêwî û zerdanê dêwî geno û şino dewa xo.

Wexto dewijî, mêrikî bi bolê bizan û bi zerdan vînenî, ti ra persenî: *'To nê bizî û zerdî pêro ça ra ardî?'* Mêrik vano: *'Ez şîya, kewta golê Gerdual. Mi vat, yew êstrîn hîrê kolî. Wexto ez gole ra vejîyaya, mi nê bizî dî. Û bi no zerdî zî dêwan ra diznayî.'* Kam ke no vate eşnaweno, vazdeno û şino golê Gerdual. Xo erzenî gole û vanî, *yew êstrîn, hîrê kolî, yew êstrîn, hîrê kolî.* Seba ke çew zî asnawe nêzano, ey ke kewenî gole, te de xeneqyenî. Ey ke dima ra yenî, wexto no rewşê verînan vînenî, tersenî û nêkewenî gole. Ageyrenî dewe û mêrikî ra vanî: *'To ma xapîna. Kam ke kewto gole xeneqîyayo. Ya ti vanî, to nê bizî û hende zerdî ça ra ardî ya zî, ganî ma to bikişê.'* Mêrik înan ra heme meseleyê xo vano. Wexto mêrik êdî qiseyanê xo qedînenno, dewijî ey ra vanî: *'Ganî ma to bikiştêne, labelê hende camêrdîya to ra pey, ma to efû kenî.'* Mêrik, heme zerdanê xo û bizanê xo geno û şino keyeyê xo. Wexto cinîya ey, mêrikî vînenno ca de ey rê ber kena a û gena zere. Ey benî dewlemend, dewijî zî merdeyanê xo rê qehirîyenî.

Kulmek xwelî

Xecê OMERÎ

Ji şevbuhêrk û robuhêrkên lawaz
Ber bi zewiyên komika sêwîyan
ve dipengizim
Û pê dihesim...
Piştî te kendalek e dilkêşî!...

Piştî te kulmek xwelî
Ji xewn û xeyalên qirkirî
Bê hemd li birînên xwe diçerixim
Li çûyîna te dilikumim
Diingirim...
Bes û tamam ji destê vê dema qaşo derman

Xeberoşkeke evînî

Mehmet DÎCLE

“Stêrk hêsirên heyvê ne, bi porê tarî yê dinyayê ve diçirsin.”

Seydayê kal weha dest bi dursa xwe ya dawîn kir. Li derve şeveke zivistanê ya dijwar bi berfa ku dilêland, ji zû ve riya hucreyê ji navçeyê dûr xitimandibû. Şagirtên ku hînî derseke weha nebûbûn, li ber roniya agirê di kuçik de bi çarmêrkî rûniştibûn, bi miraq li benda gotinên Seydayê xwe bûn.

“Ji ber ku heyv evîndarê dinyayê ye, ji roja ku nû çav pê ketiye ve. Gelek sal beriya ku em mirov werin rûkê dinê, evîndarê şînahiya wê bûye. Yê keskahiya wê ya efsûnkar. Ê baran û tofanên wê û çiyayên wê yên ku bi berfê spî bûne. Loma jî ji roja ku evîndar bûye ve li dora dinyayê digere û dizivire. Dinyaya me jî tu rojekê nesekiniye û nenihêriye li rûyê Heyvê yê zivîn. Ji ber ku ew jî evîndarê rojê ye. Yê rûyê wê yê birqok û agirê wê yê ku tu kesî nêzî xwe nake. Loma Dinya jî her tim li dora rojê digere, dizivire. Ev evîneke weha ye, tevî ku bi milyaran sal derbas bûne jî hîna her sibe bi dîtina rojê asoyên dinyayê ji heycanê vediguherin guleke sor a ku nû vebe. Her bihar kirasên heftreng li xwe dike û wek keçeke xama stranên evînî distrê. Dema ku zivistan tê dibe bûkeke nazenîn a serbixelî. Havînan kirasê wê yê heftreng zer dibe, vediguhere rengê hêviyê.

Lê roj bê xem e, gelek bedewên wek

Dinyayê li ser wî dîn û har in, ew her êvar şewqa xwe hiltîne Dinyayê di nav tarîtiya tenêtiya wê de dihêle û bi ser riyan dikeve.

Wê demê dîsa Heyva ku her tim li wê ye, lê ji ber ku çavên Dinyayê bi şewqa Rojê tarî dibin wê nabîne, derdikeve. Ji bo ku Dinya ji tarîtiya xwe netirse Heyv bi tîrêjên xwe yên nermik tenêtiya wê ronî dike. Dibe hevalbend jê re, wê haş dike û bi dizîka digirî. Hêsrên wê dibarin bi porê reş ê Dinyayê ve dibin stêrk, diçirsin. Paşê dibe sibe, roj cardin hiltê, bi roniya xwe ya zer çavên Dinyayê dîsa dîtîyî. Heyv wenda dibe.”

Seydayê kal demeke dirêj sekinî, awirên xwe kuta agirê di kuçik de. Şagirtên wî serê xwe bera ber xwe dan. Hinekan xwe kirin şûna Heyvê, hinek ji wan bûn Dinya di dilê xwe. Kesek nebû Roj ji wan. Seydayê kal cardin domand,

“Vê xeberoşka ku geleki beriya hebûna me dest pê kiriye, bi salan e didome. Heyv sebr dike. Roj pozbilind e, dibêje qey wê bedewiya wê ya ji agir qet venemire. Dinyaya me jî kor e, çavên wê evîna dostê wê yê herî dilovan nabîne. Ji ber ku ew korê şewq û bedewiya rojê ye. Bi hebûna wê geş dibe, bi tunebûna wê diçilmise, loma ku her tim li dora rojê digere, dizivire. Tevî ku dizane jî dema ew roj bê û Roj wê hemêz bike, wê ew bi agirê wê bişewite bibe xwelî.”



Narame

ŞÎNYA

Ji bo bîranîna hevala Sema KOÇER

Her ku stêrkeke nas ji ezmanan dişemite, parçeyek laşê min jî bi xwe re dibe. Ew bîranînên ji her rengê demsalan ve hatiye nivîsandin, birîn dibe. Hêviya dîtina bihareke din diçilmisîne, hişk dike. Pelên zerbûyî diweşîne, li ber bayekî tenik dixê.

Di girtigehê de her rengê xwezayê demsala zivistanê nîşan dide. Û ez di zivistanan de dijîm. Wek dema xwe ya nazdar fistanê bûkaniyê ji rengên spî li xwe kiriye. Pêwîst e ku qetilkirina fermana rengê payîza zerbûyî neyê dayîn. Ew, demên dibistana kujer bîranînên ji payîzan zêde maye. Dil dixwere di wê dema xemgîniyê de û di wî wextê fireh de bêcezir bi xwe re zêde dibe. Zarokatiya hundirê min dicemide.

Dibe ku çûkên ezmanan bi keder û hasretan bi baskên berfirkirî ve difirin. Hêlîna bîra dilê min bêsebr e. Û ez nikarim bifirim zeryayên bê dawî û ezmanê şîn. Baskên min ê berfinî şikestiyê û niha bi bayê payîzê ber bi min ve tê. Di her bawerzî de çiyayek dicemide di hundirê min de. Li kêlekê, ewrên xemgîn kom dibin.

Dibe ku niha li ser çiyayan befir barîbe. Beybûn ji zû ve cemidî û çilmisîbin. Lewre niha beybûnên herî xweşik li çiyayan vedikin. Lê ez dizanim ku herî pir beybûn rûyê xwe yê bi ken nîşan didin.

Tu dizanî? Her ku ji te re dinivîsim hestên bi strî tîn û di hundirê min de rûdinên. Pênûsa min bi bizavên lerizî peyvan dineqşîne li ser pelên spî. Atomên mejiyê min rêya xwe wenda dike, bê qible dimîne. Li ber aloziyeke sirdar im. Dema dinivîsim ji peyvan re nabim serwer. Peyv xwe bi xwe xwe watedar dikan. Di konên reş ên mejiyê min de bîranînên me yên biharî li pey hev rêz dibin. Di jiyana me de ew lîstokên zaroktiyê me têra xwe lîstibû di kuçeyên teng de. Zaroktiya min li diwarên rûsar dikeve û li min vedigere. Dilê min kelegirî ye. Ji bîranînan dilopên xwînê dibarin kuçeyên bê deng û tarî. Çirayeke sor dişewite di nav dilê min de. Li wan kuçeyên tarî û bê deng de tenahiya zaroktiya me heye.

Her yek ji me dibe bîranînek û dûr dikeve, ez dizanim. Tê gotin ku; “Di nav pêvajoya jiyana me de bîranînên bê sinor hene di nav kûrahiya dil de.” Lê bîranînên ku hîna tu kesî dest nedayê jî, hene. Ger kes destê xwe bidê wê xwînî bibin, biêşên. Ev bîranînên me evqas mezin in ku nakevin nav çiroka jiyana me.

Hîn jî xemgîniyek heye hundirê min de, ji ber ku rêyên dirêj û diwarên qalind ketin navbera me û ji ber ku rêyên dûr ve dinivîsim. Dûrahî laşê min dicemidîne. Di nav diwarên cemedî de hestên germ kedî dikim. Wek li ser Pîra Siratê sekinî mame. Li xwezayê û dîrokê guhdarî dikim. Di pêtên agirê azadiyê de wêneyê rûyê te dikolim. Carinan bi awirên tûj carinan jî wek zarokekê şa dibim û bi ken li jiyane temaşê dikim. Dibêjin ku; “Rûyê di nav agir de dikare bi ken binihêre?” Lê nizamim ku agir vejîna pîroz e, xwe jî nû ve diafirîne.

Her çiqas dil sivik bike jî, di gerdûnê de baskê xwe dipêperînim, wek bêsebrîya Sîmûrg. Hêviyên Sîmûrgî di singê min de bask vedidin. Dilê min di demê de cih nagire, dûrahî dibe çol ji bo dilê min. Di nav çolan de li sahrayên bê zivistan digirim. Ji ber ku agirê bihara azad di singê min de dişewite. Dibe meşaleyeke ji agir û her bayê payîzê ya ku bêhna axa welat hilgirtiyê û ber bi min ve tê, pêlên xwe li rûyê min dixê, wê demê agirê meşaleya dilê min jî bi xwe geş dike. Behna axê hildigrim ji bayê payîzê.

Dema rûyên bi ken û nêrînên te yê kûr, li ser pelên rojname û kovarê min dîtin wê demê raperînek ji hundirê min bilind bû, min nizanibû hestên xwe valayî ku derê bikim. Di nav neçarî û hestên bi êş de difûriyam.

Gelek caran min xwest ku ji te re binivîsim. Lê giyan û hestên xemgîn dest nedan ku pênûs rê bikudine. Niha jî hest û ramanên min serî hildane. Peyvên herî bedew wateya hestên min diyar nakin. Bi hevokên nîvcomayî be jî min xwest dengê dilê xwe bigihînim te.

Cemed

Omer FÎDAN

Ruh û can û dilê her duyan bûbûn yek. Her carê ku dilê Xemgîn serî hildida û bi organên derdora xwe diket, firnê pozê hevalê wî yê pîr mezintir dibûn. Her ku hilma xwe dikişand mirov digot qey ku dixwaze rê bikişîne pozê xwe. Gundê xwe bigihîne xwe. Xemgîn bê navber pehnî dida zikê hemrayê xwe. Her ku pehnî dayê, firnê pozê wî mezintir dibûn û her ku firnê pozê wî mezin dibûn, gundê wan nêztir dibû.

Cemeda di heqîbê de diheliya û aveke cemedî bi piştâ Bagero ve diherikî. Ava cemedî û xwêdana keliyayî li hev dihebin. Bagero bûbû bahoze û ewrekî giran li pey xwe dihişt. Çokên wî yên ku hevaltiya gelek salan kiribûn lezgîntir dibezayan. Her ku diçû ber bi ciwaniya xwe ve diçû, her ku dibeziya gemar û zingara salan jê diweşiya. Birq û çikên hesinî ji ber nalên wî dipekiyan şevê, agir bi taristanê dixistin. Bi çavên xwe yên ku tariya şevê ew kor kiribûn çiyayê Lef li pey xwe hiştibûn. Rojê serî hildabû û serê stêrkan xwaribû.

Nikaribûn ku bêhna xwe bidin. Diviyabû ku demekê beriya demekê bigihîştina hawara malê. Şev li pey xwe hiştibûn wekî Lef. Bagero wek dilopeke ku ji taristanê niqutîbe reş dikir û dibiriqî li binê roja havînê. Bûbû birûsk û ji baranê dirêviya, diviya beriya baranê bigihîştina malê û malî şiyar bikirina wek birqa birûskê. Gelo ku hînkahiya cemeda heqîbê nebûya wê bikaribûya hemberiya ciwaniyê bikira li bin roja hezîranê?

Xemgîn xwe spartibû hevaltiya hevalê xwe yê kevnare. Hevalê wî jî di nav daristanê de wek sihoreke biçûk, di riya herî teng de jî baweriya hevalê xwe ya bi xwe nedihejand û bi lez û bez derbas dibû. Dibû wek marekî reş û di beyaran de dilezand. Dibû wek teyreki baz û difiriya di ser newal û cuhên avê de.

Xeber hatibû guhên wî ku dê leşker bi-

gire ser mala wî û Feratê wî bigire ji bo leşkeriyê. Feratê ku çend sal bû ku bi awayekî bavê wî ew dida alî, Feratê ku piştî hilanîna debrê wê bibûya zava, Feratê ku çiqasî bavê wî li çavên wî dinihêrî Rostemê kekê wî diket bîra wî. Rostemê ku di hembêza axeke xerîb û sar de bû. Rostemê ku yek ji qurbanên herba Qibrisê bû.

Çend saetên wan bû ku di rê de bûn. Ji lezê, ji bezê û ji tirsê pê nehesiyabûn ku kîngê roj derketibû û ew hukmê giran li ser wan dikir. Cemeda ku hesreta Feratê wî bû havînê berî nav dewê xwe de û li ber paleyiyê vexwe, cemeda li ser piştâ germahiya hezîranê ya ku li ser piştâ Bagero bû, cemeda di heqîbê de ji bîra Xemgîn çûbû.

Di germa hezîranê de cemed nedibû nesîbê her kesî. Ne ceryan hebû, ne jî sarincok. Başiya herî mezin a ku Xemgîn dikaribû ji Feratê xwe re bike, ew bû ku çend şel cemed bibe jê re, da ku li ber paleyiyê tesîra germê kêmbike.

Ji aliyekî ve kelekela Bagero, ji aliyê din ve roj...Cemed diheliya...Her ku nêzî malê dibûn cemed diheliya... Her ku nêzî malê dibûn cemeda nav dilê Xemgîn canê wî û ruhê wî dîl digirt.

Xemgîn li biniya malê xwe ji hespê de avêt û ber bi qelebalixa ber deriyê mala xwe de bazda. Hawar e, kî ku neçê dewar e! Gundî hemû li ber deriyê wî bûn. Leşker ji gundiyan bêhtir bûn. Ne li gotinên leşkeran guhdar kir, ne jî awirên gundiyan bala wî kişandin. Xemgîn çavê xwe li deriyê malê ediland û di nav qelebalixê de ji xwe re şiverêyek çêkir. Gihîşt ber derî û derî vekir. Xwêdaneke cemedî di ser serê wî re diqelibî. Canê wî qerisibû. Dê tenê ji awir û gotinên sertaca xwe, xanima xwe bawer bikira. Tenê şirika tîrsa wî dê jê re rastî bigota.

Gelo Feratê wî xwe dabû alî?

Gulên bêmiraz

Bargiran ŞANAZ

**Baran dikeve kolanan ji mehên adaran
Dilê min ew qas şil mîna pisîkên bêmal
Ji pencereyeke ji ewran dengê muzîkê tê
Guşeguşî guhê min dibe
Giran dibin ji dengê jiyanê re giran dibin
Xwe li ser kerbûnê ve dibin**

**Bajar bûkaniya xwe winda dike
Di bin esmanê reş de rûyê xwe winda dike
Êdî rû nagire ji ber rewşên qehpikane rû nagire
Di her dilopê de gunehek
Li ser lêvên qirçimî birînek
Şermeke jinî hêj ji keçaniyê ve
Di rûyê mêran de sor dibe**

**Baran tê
Li ser kuçeyên qirêj guleke bêmiraz vedibe
Guleke zer di rawestgeha orispîyan de reng digire
Ji tirs û kelecaniya xwe re stargehê digere
Ji keçîniya xwe re mirinê dipêçe ji xwe re mirin**

Du darvanên botî

Sivan ZEREN (AR)

Di heyamekê de mirovên birincneditî, mirovên çêj û bêhna birincê nestendî, heyama ku ji bo debara xwe; angû bi tenê ziktêrkirina xwe û ya gedeyên xwe bi nanê cehî; karên cur bi cur dikirin.

Di wê heyamê de mirov gelekî saf, gelek bi xwezayê re têkildar, gelek dinyanezan û gelek... Di vê dema feqîriyê de îcar rewşa gundiyan bifikirin. Gundî bê quwet, xulam, hejar bûn. Hinekan şivanî, hinekan ji darvanî dikirin. Çiroka me ji der barê du gundiyan darvan ên bi navê Heso û Elî de ye.

Her spêdê, beriya ku xweza biveje, xweza di nav mişt şewqê de bilebite, dike-tin rê. Dîsa rojekê ji rojan di milên wan de werîs, di destên wan de bîvir û dasik ber bi çiyayê Cûdî ve bi kilometroyan dimeşin. Heso bi dengekî bilind:

- Eyyy Cûdî! Tu çi qas mezin î, çi qas bi hêz û serbilind î! Ne beredayî ye ku keştiya Nebî Nuh li vê derê rawestiyaye. Ey çiyayê Cûdî.

Elî weke ku cara yekem bibîne li kûpîla Cûdî ku di nav mijê de wînda bûye nihêrî. Qey hinek çavê xwe kûr bikira, dê kêzik, balinde, hesp û ker û hemû cureyên ajalên ên li keştiya Nûh barkirî bidîta. Bêyî ku çavê xwe jê bide aliyekî, bersiv dabû Heso.

- Erê weleh tu rast dibêji Heso
- Wa Elîko! Tu qet çûyî aşxaneyê?
- Ew çi ye, îcar ez xulam?
- Cihê nanxwarinê ye. Birincekê çêdikin bi Xwedê tu yê pê re tiliyên xwe bixwî.
- Welehî min navê birincê bihîstibû.
- Tu çi qas nezan î, min jê gelek xwariye loo!!

- Ka behsê bike tiştêkî çawa ye? Çêja wê çawa ye?

- Ser navê Yezdanê mezin, ez çawa ji te re qal bikim ku tu karibî fehm bikî. Xwarina axa û mîran e. Ew qas hêja ye, ew qas çêjdar e ku, nepirse baştir e.

Gihîştibûn dereke asê û zinarîn. Ze-raqa tavê avêtibû. Roj li ser çiyê piştî qul-kirina tariyê, bi pelên daran re dileyîst. Li jor, li rex kulîlkan; bêhna giya-yên catirî, nefel, indeko û rihanê mirov meyger dikirin. Bi ser de jî dengê ava kaniyan guhê wan tije dikir, hesteke aramiyê dida. Berevajî germahiya Cizîra Botanê ya keleqij û dişewitîne, Cûdî hênîk bû. Weke ku Yezdan hemû bereket dabe Cûdî, cezayek ji bo bajêr, yanê xela dabe.

Heso bi dasikê çiqlên dara berûyê dipejiland, qeys dikir û jêdikir. Elîk jî li ser axeke beyar paqên xwe kiribû meqes. Moriyên ku erzaq dibirin moristana xwe bi rêz û bi rîtim dimeşîyan. Elîk hinekî bala xwe da û tiliya xwe ya nişandanê danî pêşiya serekên moriyan. Serekê moriyan berê xwe guhert aliyekî din û karwanê dû wî jî bi heman awayî fetilî. Elîk bîskeke sekinî û dîsa tiliya xwe danî pêşiya wan. Qilqal kete dilê moriyan. Berê xwe dîsa guhertin û bi lez meşîyan. Elîk dom kir. Serekê moriyan xwe bi tiliyê ve girt û karwanê dû jî da dû heman rêçê.

Heso gazî Elîk kir:

- Ka were vana bide hev. Kom bike û zû werîs bîne. De em piştîyên xwe çêkin.

Elîk rabû ser xwe tiliya xwe bir devê xwe û bi çalabala beziya ber bi Heso ve.

Darên belavkirî da hev û zûzûka werîs anî. Li ser hev kirin dêz, girêdan û jîdan-din.

Heso bi aliyê ve Elî zivirî:

- Beriya ku bi rê bikevin em nan bixwin.

Ji tûrikên xwe nanê cehînî, penêrê sîrîkî derxistin. Cewdika avê jî ji darê kirin, danîn ber xwarinê. Xwarina xwe xwarin, ava xwe vexwarin û piştî li ber piştîyên xwe rûniştin û piştîyên xwe dan piştî xwe. Dest bi rêveçûnê kirin.

Li nav kêfxweşiya kulîlkan rengereg, giya-yên şil ên bi bêhn, her cureyên daran

û her cureyên ajalan hebûn. Va ye li vir sihor dilistin, naz û henek dikirin li ser daran; dihatin xwarê, dîsa bi hewa dike-tin. Bayekî nermenerm dihat weke ava qerisî hênîk. Ger bixwazî xwe dirêj bike li binê wê dara ku derdora wê beybînok, kulîlka nîsanê, gangilok û giyayan raxistî. Xwe dirêj bike û fikran radestî xewê bike. Sist bibe û dev ji xwe berde.

Elî û Heso bi xwêdan û bi bêhnçkiyayî xwe gihandin bêrimê. Kovî nemabûn li holê. Çûbûn. Kes û kûs nebû, bêdengî bû. Bi tenê kêzik, kulî, balinde hebûn. Elî û Heso piştîyên xwe danîn. Elî cilê xwe yê bi pîne ji xwe kir, li ser bêrima bi aliyekî wê zinar e, aliyekî wê ax e. Şîlf û tazî xwe avêt avê, xwe noqî avê kir.

Heso aciz bû:

- Tiştê ku tu dikî ma li edetên me tên, qenc e welê? Ne şerm e birê min tiştê ku tu li cem min dikî. Ma ne şerm e lo! Welê bê cil, bê fihêti... Tu ji bav û kalên xwe jî fedî nakî. Min jî digot ez ê wî bibim aşxaneyê.

Elî şaş bû:

- Heso tu rast dibêji, qey çêdibe?
- Çima nebe. Lê belê!
- Çi bû îcar?
- Pirsgirêke heye.
- Çi ye?
- Dev jê berde birê min, him...
- Him çi ye Heso? Çire rasterast napeyivî?
- Him perê me nîn e, çawa, bi kîjan pereyî em ê herin?
- Rast e bi kîjan pereyî?
- Tişteke heye lê!
- Lêê!
- Lêê. Nizanim çawa çêbe.
- Malmîrato çi be bêje. Bes mirov bite-qîne.

- Bi rastî tiştê ku bêjim ev e: Ew piştîyên darên me ji bo firotinê... Ger bi pereyê wan ji malê re, ji zarokan re tişteki em nekirin, em dikarin li aşxaneyê bajêr birincê bixwin.

Du dostên babanî biryar girtibûn. Heso bi tîqetîq:

- Him çi bibe rojekê zarokên me diranê xwe birizînin, bila îro nexwin lo! Qey wê

bimirin bîjiyên çepel. Rojekê devê xwe bidin hewayê. Bila avê vexwin lo!

Gihîştibûn newalekê, Dicleyê xwe bi nazenîni dihejand. Li piştî wan barê êzîngan, di nav xwêdanê de mabûn, dimeşîyan bi pêş ve. Ber bi bajarê Cizîrê ve dimeşîyan. Di Hesoyî de dengê hebû ku rondikên gur, qijik, hirç û kitikan dianî xwarê. Heso distra. Deng siwar bû li ser bayê hênîk û çû çarnikarî olan dida. Stranê qala evîneke demên berê, qala evîneke xwerû, qala evîneke qedîm dikir. Piştî heyranokeke dîlşewat û dilherîşî da ser. Guhê xwezayê girêda li dû xwe.

Du ciwanên ku navê wan Şahîn û Leyla bû, wê demê eşqeke xedar ji hev hez dikin. Bav, keça xwe nade kurik. Leylê bêçare vê heyranoke diavêje ser hezkiriyê xwe Şahîn.

*Wey lawo Şahîno tu dîn î tu ne dîn î
Weyla tu min ne dixwazî ne direvînî...*

Tu bûyî melekê mewtê

Xenceran li ser serê min re dihejinî

Hey bavoo

Wey tu yê rihê min bistînî

Hey lo loo... Hey lo loo...

Hey mala müüüin... Malaaa müüün...

Hey hawaaaaar... Hey hawar...

Hey mala bavê min Şahîno.

Wey min bidinê min bidinêêêê

Weyla nexta min bistînin li gel erf û adeta dinêêêê

Şahîn gula ji gulê yeeee

Kesera ser dilî ye

Wey hawar mala Şahînê min ziyaret e,

Tu bi Xwedê kî min bavêjinê

Hey loo... Hey loo...

Hey mala min... Hey mala min.

Hey loo... Hey loo...

Aaaax mala bavê min Şahînooooo

Piştî zîvronekê, bajar li ber wan hêdî hêdî xuya bû. Ketibûn nav axa Cizîra Botanê.

Hatin ber keştîyê, barê xwe xistin keştîyê.

Keştîvan got "Siwar bibin gelî bira-nooo!"

Hinekan pezê xwe anîne, hinek rêwî

ne, nofek gundî ne li hev kom bûne. Heta ku tev siwar bûn. Du heb çûn ser mecrefan, xwediyê keştiyê jî çû ser kotelê û ji avê derbas bûn.

Di çayxaneyan de mişextvan (qaçaxçî) wek her tim ber bi çav bûn. Cilên wan bi-jarte, di piyê wan de pêlavên boyaxkirî, li ber qayîşên wan çardexur, simbêlên wan badayî bûn. Her kesî nedikarî ev kar bi-kira. Ev karê mêrxasên bê tirs, karê mêrxasên xwînkeliyayî, karê mêrxasên ku hespê xwe diajotin ber bi evînê ve...

Dest bi silavan kiribûn.

Hikmoyê neviyê Hecî Sêfo; silav!

Elûyê Hemîd; qewet be

Heso û Elî; sax bin. Ezîz î, ezîz î...

Ser çavan bira.

Li sûka nû, qada darvanan toz û suhbeta mirovan û xirecirî... Bi wîtewî dixuyan.

Welhasil û kelim dîsa êzingên xwe piştî ew qas bazarî, bi bihayekî bê qîmet firotin.

Îcar pere di berîka wan de bû, di deriyê aşxaneyekê re derbasî hundir bûn. Elî bi çavên şaşwaz û şermokî, bi xefkî dinehêrt. Hesoyê çavbel bangî xebatkarê aşxaneyê kir:

-Ka ji kerema xwe ji me re birincê bîne bira!

Elî serê xwe xistibû nav her du destên xwe, li derveyî şibakeyê li nava sûkê fe fikir, mîna pitikekî aram û nerm difikirî. Xebatkar birinc anî û danî ber wan. Heso dest pê kir bê sekn û li ser hev...

Elî bi çavên beloq li xwarinê dinihêrt û piştî destê xwe yê rastê li binê teyfikê xist. Xebatkar, Heso û kesên ku xwarin dixwarin tevdeyan, berê xwe dan Eliko. Elî kelogirî, his û kerênî jê nedihat. Îcar wek zarokekî qebahetkirî neynûkên xwe dikeritandin.

-Çi bû Elî? Kuro çi hewalê te ye?

Bi çengê Elî girt û kişand aliyê deriyê derve. Xebatkar bi melkesê birincê belawela dimalişt, li erdê teyfika şikestî.... Heso pereyê aşxaneyê da û pev re derketin. Bîskekê bêdeng meşîyan ber bi malê ve. Heso bi hêrs

-Çi bûûûûû....! Kuro bipeyive zû!

Elî weke bi ser hişê xwe ve hatibe; li her du aliyên xwe nihêrî, sekinî û bersiv da.

-Min di nav birincê de kurmik dîtin.

-Malmîrato! Kurmikên çi!? Ew şehîre bûn.

Kurtenameyêke binçavkirî

Ferzan ŞÊR

Ji Tujoyî re...

Min bihîst ku ewrên reş xwe dane ser kulekên te,
Tu di nav tarîtiyêke bêdeng de ronahiyeke kilîtîkirî dimijî
Min bihîst ku nikulên kewên te şikestine,
Tu dilukimî, di hucreyêke sêgavî de.
Min bihîst ku tîlên tembûra te qetiyane,
Tu ji dîwarên vikîvala re distrêyî
Min bihîst ku te hêviya xwe ji royê bîriye,
Qet xeman nexwe wê sibê dîsa hilbê

Bêzar

Mihemed RONAHI

Dem êdî dihat bêriyan. Terşên gund hêdî hêdî ber bi malan ve dihatin. Şivanan danekî din jî li dû xwe hiştibûn. Ji kêfa îniyê re îro terşên xwe piçekî zû anîbûn malê. Îro îni bû. Gundî tev, berî nimêja îniyê diçûn serdana gornan. Li gundê Bedika edetekî kevn bû. Her îni berî nimêjê diçûn serdana miriyên xwe. Beriya ku herin ser gornan, her malekê xwarinek çêdikir û li ser gornan belav dikirin. Malekê şilekî çêdikir, mala din gilûrik çêdikir, mala din patîle çêdikir, maleke din hişkîn çêdikir. Kurta qiseyê tu malek bê xwarin nediçû ser gornan. Ji ber vê yekê rojên îniyan li gundê Bedika dibû weke roja cejnan. Zarokên ku zanibûn yasînan bixwînin, rûmeta şêxekî digirtin li vî gundî. Gundîyan ji bo ku yasînekê ji miriyên xwe re jî bidin xwendin, berî her kesî xwarin didan wan.

Pîrekên gund tev li ber amadekariya rojê bûn ji bilî pîra Bêzarê. Jixwe pîra Bêzarê tu carî amadekariya vê rojê nekir. Tenê her îni diçû ser gorna Îbo, çêr û nîfirên xwe dikir û vedigeriya malê. Ne ji bo yasîn û diayan diçû ser gornan, ji bo nîfir û çêran diçû ser gorna mêrê xwe Îbo, têra xwe nîfir û lenet li Îbo dibarand û vedigeriya mala xwe. Lê îro nexweş bû, pîra Bêzarê nikaribû biçûya ser gornan. Ji vê sibehê de ji nava ciyan derneketibû. Çend caran hewl dabû ku rabe lê nikaribû. Niha hê jî di nava ciyan de ye.

Êdî gelek temendar bû pîra Bêzarê. Heştê û du sal emrê wê bû. Ji ber ku salekê piştî şerê Kalê Şêx hatibû dinyayê bi emrê xwe dizanibû, li van deran kêr pîrekan bi emrê xwe rast dizanibûn. Pîra Bêzarê gelek qar û qotikên dinê kişandibû. Dozdeh zarok anîbûn dinê, ji van zarokan pênc jê bi biçûkî miribûn, heft zarok mezin kiribûn, her yek bi ser û guh kiribû, lê niha yek jî tune bû li balê. Di bin xaniyekî xirabe de bi tena serê xwe dijiya. Ji ber ku ne ji Bedika bû, ji bavanê wê jî kesî wê li vî gundî tune bû. Xwişk û bira jî miribûn tenê birazî û xwarziyên wê li gundê Gulanê bûn. Ew jî bi ser de nedi-

hatin û nediçûn. Jixwe ne xwarzî û birazî, zarokên wê rasterast nedihatîn balê. Ji zarokên wê çar jê law bûn sê jî keç. Lawan, her yekî mala xwe biribû bajarekî û ji qîzan jî tenê Gulê bi yekî ji gund re zewicibû lê Gulê jî ji ber gedeyan nikaribû saxtiya dêya xwe bikira. Lewra heşt gedeyên wê hebûn, heft law bûn tenê ya herî biçûk qîz bû, birek pez bû, karê paleyî û cot û hilkirin û rakirinê û jehr û ziqûmê tev di stûyê wê û mêrê wê de bûn. Jixwe nikaribû serê xwe bixwiranda, îcar dê çawa saxtiya dêya xwe bikira. Ji ber ku wê nikaribû were, pîra Bêzarê tim serî didayê.

Îro tişteke nexwaribû pîra Bêzarê. Niha birçî bû di nava ciyan de lê ji ber agirê xwe nikaribû xwe tevvida. Çend caran hêz da xwe ku rabe lê nikaribû. Agirê wê her diçû bilind dibû. Pir dixwest ku niha rabe ser xwe û biçe ser gorna Îbo. Lewra çûyîna ser gorna Îbo jê re ferzeke weke ricimandîna şeytên bû, lê nikaribû. Gundîyan ji ber vê yekê jê re digotin Bêzara dîn. Kesî nizanibû ku çi kul û keser di hundirê wê de ye. Kesî nizanibû ku emrekî dût û dirêj, bi çi xem û derdan bihurandiye. Hê çardeh salî bû, di nava eşîra Têrkan de keçîka herî rind bû. Dilê wê û Şêroyê Mala Xelo di hev de bû. Şêro xortekî çeleng û lihevhatî bû. Bi rû û sîfetê xwe jî te digot qey kewê gozel e. Peyayekî bi dilê xwe xweşik bû. Şêro jî, hê di şanzdehê xwe de bû. Her duyan jî bi evîneke gējgerînokî dil berdabûn hev. Di wan rojan de çend caran Şêro bûbû guhdarê hinek gotinên der barê xweşîkbûna Bêzarê. Tirsek ketibû dilê wî û ji Bêzarê re gotibû “Bêzara min van rojan gundî behsa xweşîkbûna te dikin. Heke keçîkek di nava gundekî de pir were qisekirin, ew keçîk li wê malê pir namîne, îleh yek tê dixwaze. Ka were em birevin an jî bavê te dê te bide yekî. Wê çaxê mirin ji jiyanê çêtir e.” Lê Bêzarê gotibû “Ez nikarim bi şerefa bavê xwe bileyîzim û tu kes jî behsa min nake niha. Jixwe heke yek min bixwaze jî netirse

ez ji bilî te ji tu kesî re nabim kevanî. Ez ê wê demê bi te re birevim.”

Rojekê Bêzar ne li malê bû çûbû mala xwişka xwe ya mezin. Xwişka wê ji gundê hember wan zewicibû. Wê êvarê xwezgîniyên Bêzarê hatibûn. Xwezgîniyê wê jî Îboyê Emer Axa bû. Ji Bedika bû û serekê eşîrê bû. Di derdorê de merivê herî dewlemend û hêzdar bû. Sê jinên wî hebûn. Bi temenê xwe ji bavê Bêzarê du salan mezintir bû. Niha hatibû doza Bêzarê bi Sefoyê bavê Bêzarê re dikir. Sefo hejarekî bê pergala bû û dizanibû ku ji dayîne pê ve tu rê li pêş wî tune ye. Heke bi dilê xwe bida belkî qelendekî baş jî ji Îbo bigirta yan jî Îboyê bi darê zorê bibira. Bêzar ne li malê bû, Sefo got “Heke were hûn dê werin bigirin û bibin” lê Îbo gotibû “Em ê bûka xwe bi xwe re bibin”. Sefo wê êvarê çûbû Bêzar bi xap ji mala xwişka wê anîbû û dabû Îbo. Niha Bêzara çardeh salî li Îboyê çil û heşt salî mar kiribûn û dibirin.

Ji wê rojê û vir ve şêst û heşt sal derbas bûn. Tu tişt li ciyê xwe nema, her tişt guherî. Tenê dilê Bêzarê neguherî. Dilê wê hê jî bi şewat û bi evîna wê rojê diavêje. Hê jî bi hêviya wê rojê diji Bêzara din. Rojekê guhdariya çîroka Eyûbê Kurmexwarî kiribû. Di wê çîrokê de gelek qeda û bela li Eyûb Pêxember qewimibûn. Çil lawên wî miribûn. Mal û milkê wî ji dest çûbû. Nexweş ketibû, bi salan di nava ciyan de mabû. Goştê wî riziya bû di nava ciyan de. Kurm ketibûn laşê wî. Lê Xwedayê alemê bi mezinahiya xwe lê hatibû rehmê û Eyûb û jina wî ji nû ve bûbûn wekî çardeh saliyan. Bêzarê jî şêst û heşt salan bi vî hêviyê bendewariya miradê xwe û Şêroyê Mala Xelo kiribû. Hê jî bendewar e, li benda wê rojê ye ku Şêro derkeve wê bibe û

dîsa vegerin wan salên xwe yê çardeh salî. Lewra laşê mirovan pîr dibe, dil tu carî pîr nabe. Her tim çardeh salî ye dil.

Niha nexweş bû û di nava ciyan de bû. Nikaribû rabûya ser xwe, agirê wê jî sibeha Xwedê de daneketibû. Heta, her diçû bêtir zêde dibû agirê wê. Ji tîna qirika wê ziwa bûbû. Xwedayo niha Gula qîza wê biketa hundir û qurtek av bidayê. Çavên wê li derî bû lê kesek nedihat. Hişê wê yek caran diçû û dihat. Niha hişê wê nû hatibû serê wê û hêstir ji çavên wê yê temendar dihatin xwarê. Dilê wê pê dişewitî û digot “Xwedayo, Xwedayê erd û esmanan, Xwedayê bêqam û bêmiradan, ma min çi kiribû li ser erda te, ku te vî bîkesîtiya, vî tenêtiya hanê kir para min. Min heta niha tu rojeke xweş nedît. Min heft gende mezin kirin, lê niha yek jî tune ye li dora min. Xwedayo tu bi xatirê mezinahiya xwe bikî tu giyanê min bi vî rewşê negirî. Tu bi xatirê hezkiriyên xwe bikî tu ruhê min di tenêtiyê de negirî. Tenêtiya para te ye.”

Her gava diçû hê sist dibû. Çavên wê tim li derî bûn. Li benda hatina Gulê bû. Qene di dema wê ya paşin de wê bi tenê nehêle. Lê kes nedihat.

Dengê selaya meleyê îniyê dihat ji derve.

Pîra Bêzarê hê jî di wê rewşê de bû, ber bi başiyê ve nedîçû. Ji tîna dengê wê êdî bêtir sist bûbû. Carekê bi aliyê derî ve mêze kir ku xortek ketiye nava derî. Tasek av di destê wî de bû. Baş lê mêze kir. Ev Şêro bû. Belê Şêro bû ne ku şaş dîtibû, Şêro bi xwe bû. Piştî şêst û heşt salan hê nû hatibû. Lê tew pîr nebûbû. Hê jî ew Şêroyê şazdeh salî bû. Bêzarê jî nava ciyan hêz da xwe û rabû ser xwe.

-Şêro ev tu yî?



-Erê ez im Bêzara min.

-Ma tu tew pîr nebûye Şêro.

-Ez jî wekî te pîr bûm Bêzar, lê min ev av vexwar ez ciwan bûm, wekî Eyûbê Kurmexwarî. Niha min jî te re jî anî. Tu jî vexwe Bêzarê. Têr vexwe tu yê pê ciwan bibî, em dê bigihên miradê xwe.

Bêzarê destê xwe dirêjî avê kir. Şêro av dayê lê jê re got "Divê tu vê avê bi tenê vexwî. Dema te vexwar divê kes te nebîne wê çaxê efsûna avê xera dibe. Bisekine ez derkevim derve hê vexwe. Ez dê li ber derî li benda te bim.

Pîra Bêzarê bi kêf û coşeke mezin piyale ji destê Şêro girt. Beriya ku avê vexwe şikir û hemd kir ji Xwedê re "Xwedayo tu mîrê mîran î, mezinê mezinan î, min zanibû tu yê rojekê li min bêtî rehmê. Ez şêst û heşt

salan li benda vê rojê sekinîm. Hemd jî te re"

Şêro êdî derketibû derve. Li ber derî li benda Bêzara xwe ya bê mirad disekinî. Dê gaveke din bigihîştina miradên xwe. Bêzarê piyaleya avê bilind kir û ava xwe vexwar. Di dawiya qulta paşîn de mêze kir ku wa ye agirê wê ditemire û êşên wê hêdî hêdî sist dibin. Bîsteke din li destê xwe mêze kir, qurmiçên destên wê tev rast bûbûn. Niha bûbû Bêzara çardeh salî. Ji kêfan dikir bifiriya. Êdî qediyabûn êşên wê, xemên wê qediyabûn. Niha Şêroyê bejnzirav li ber derî li benda wê bû. Şêro gelek salan sekinibû li benda wê, bila bîsteke din jî bisekîniya. Çû devê sindoqa xwe ya kevn vekir. Kirasê xwe yê şîn ê ku wê roja ji Gulanê hatibû Bedika li xwe kir û bi çîta xwe ya sor porê xwe yê sor ê bi kezî xemiland û derket derve.

Ti vace

Nesrîn NAVDAR

De vace

haydê ti vace!

Ger ti nêşîkê serê sibayan

bi ziwanê xo heskerdeye/ê xo ra vacê:

Rocê to weş!

Û ger bi ziwanêkey bînî rêzgirotîş bidê ba û daye xo

Ti go senîn beşkê vacê ez ez a?

De vace!

Ger ti nêşîkê warêkey bê mayînan

verê linganê tûtanê xo de rafînê

û ger ti di nê serdemî de

îne bi emrêkey qicî pey caxê asmînan de bivînê!

Ti go senîn beşkê vacê ez wahîrê berpîrsîyarî ya?

Vace!

Ger gulê wesarî vare boye jîyanî boyey mergî vila bikerê

heştanê to ser...

Ger di zimistanî de, hewa şûndey azadî,

şewanê to ser esaretî bîyar!

Ti go senîn beşkê vacê ez wahîrê bextewarîya?

Ger ti nêşîkê pacaye kê xo ra roşnîye rocî zerefinê!

Ger amnanî estareyî nêbê xemle şewanê to!

Ti go senîn vacê ez wahîrê vînahîya?

De ka ti vace!

■ ■ ■

Janbijan AR

De min bibihîze û vexwîne gora xwe ha
"Kerbeke ku her roj xweziyên xwe bi duh tîne heye"
Bajarê ku xemla rûyê bê fedî ye
Niha kavlên bermîratî dinimîne

Min ji te re got:
Kulên min ên kizirî hene, wê li xirbeyên kerbê, rûyê xwe yên biraştî rê te
bidin
Û min ji te re got:
Bi ser û çavên te yên beyar ve rondikên xwe yên tî bibarînim, lat im îşev

Mêze,
Ez bi serê sedsalên te yên mistdayî kim
Hembîrên te gunehkar, hunkufên te tewanbar in
Îflah nabin, îflah nabim
Ku di werza 5'emîn de bi ser xwe de ayetan jî bixwînim

Niha çend diranên xwe yên derizî
Di rûyê vê axa kizirî de bikim
Te ji wê kêliya waweylê bipirsim
Bi kerbeke bî re rakevim

Zeryayê!!!
Weledên vî welatî
temenê xwe yên xav bi qehra qedaran re dabeş kirine
Di sekeratên mewtê de
Keserên te kakilên sebrê ne
Noqî axekê dibim
Kî dibîne?

“Di warê nivîsê de ez deyndarê zîndanê me”

Hevpeyvîn: Fatma SAVCI

Li gor min, nivîsîna li zîndanê û afirîna berhemên, bi taybetî berhemên kurdî tolhildaneke e. Tolhildaneke li hember desthilatdaran ku mirovan dixin zîndanê, tolhildaneke li hember hemû diwar û derabeyên hesinî, tolhildaneke li hember rizîna giyan û hestên mirovane ye. Xwediyê pirtûka “Labîrenta Evîna Sêwî” birêz Mehmet Çakmak tola xwe ji zîndanê girtiye. Û pirtûkeke çîrokan pêşkêşî pirtûkxaneyê kurdî kiriye. Pirtûk ji heft çîrokan pêk tê û ji hêla Weşanxaneyê Ronahiyê ve hatiye çapkirin. Wek hemû berhemên ku li zîndanan hatine nivîsîn, Labîrenta Evîna Sêwî jî bala min kişand û min xwest li ser pirtûkê hinekî sohbet bikim bi nivîskarê wê re. Mehmet Çakmak ji me re qala çîroka çîrokên xwe kir. Û min jî xwest bi xwendevanên kurdî re par ve bikim. Bi hêviya ku em gelek berhemên din ên li zîndanan hatine nivîsîn bixwînin û dengê wan î tolhildanê bibihîzin.

✓ **Tu dikarî bi kinasî xwe bidî nasandin?**

Ez di sala 1980'yî de li gundê Qanqirtê ku bi ser Amedê ve ye hatime dinyayê. Heta 7, 8 saliya xwe wek malbat em li gund mane. Piştî wê êdî koç dest pê dike di jiyana min de. Bavê min di kargeheke fermî ya dewletê de ji xwe re karek dîtibû. Ji neçarî me koçî Mêrdînê kiribû. Ji ber ku nêzî mala me dibistan tune bû ji neçarî min li YÎBOyê xwend. Li ser jiyana min bandoreke mezin kir. Sê salên dibistana navîn min bi zora xwe li derveyî YÎBOyê xwend. Ji bo lîseyê jî min berê xwe da bajarê Edeneyê. Ez li wir jî li *yûrdê* dimam. Vê carê min bi xwe tiştêkî wisa xwestibû û min gelek baş jî kiribû. Malbata min ne li wir bû, vê yekê lêgerînê min hêsanîr dikir.

Hîn di lîseyê de ez ketim nava koma ciwa-

nan. Di wan demanan de min HADEP nas kiribû. Dûre min di nava baskê ciwanan de cî girt. Bi vî rengî jiyana min ji binî ve guherî. Lêgerînên min encam girtibûn û ez gihiştibûm armanca xwe. Piştî Edeneyê ez derbasî Enqereyê bûm. Li wir min di navenda ciwanan de cî digirt. Her demê li heremê ez dibûm peywirdar. Vê derfetê jî bo min gelek tişt bi xwe re anîn. Yekem car li Kurdistanê ez derdiketim derveyî herêma xwe. Hema hema ez li hemû bajar û navçeyên Bakur geriyam. Di sala 2001'ê de bi qasî du mehan girtî mam. Piştî wê di nîsana 2002'yan de li Edeneyê hatim girtin. Bi giştî nêzîkî heft salan di zîndanê de mam. Di van salan de ez li heft girtîgehên cuda mam. Eleqeya min a ziman û wêjeyê berê jî hebû. Lê girtîgeh jî bo min derfeteke gelekî mezin derxist holê. Li derve xwendina min jî nivçe mabû, li girtîgehê min ew temam kir. Min beşa kargerîyê (*işletme*) qedand. Di dawîya sala 2008'an de jî ji girtîgehê derketim. Niha jî ez li Amedê dijîm. Ez di Navenda Çand û Hunerê ya Cegerxwîn de xebatên xwe dimêşînim.

✓ **Çîrokên pirtûka “Labîrenta Evîna Sêwî” li zîndanê hatin nivîsandin an li derve?**

Bi giştî me heft çîrok di Labîrenta Evîna Sêwî de bi cî kirin. Her heft çîrok jî li zîndanê hatine nivîsandin. Min ev çîrok di navbera du salan de nivîsandin. Di du sal û du girtîgehan de. Çîrokên li derve hatibûn nivîsandin jî hebûn, lê min xwest ku ev berhem tenê ji çîrokên zîndanê pêk bê û tenê wê derê bisêwirînin.

✓ **Heta niha li ser berhemê tu rexne yan şîrove hatine kirin?**



Belê, hatin kirin. Lê mixabin bi awayekî xurt ku ez karibim xwe tê de bibînim nehatin kirin. Heta niha ez bertekên baş dibihîzim. Kesên ku dikarin kurdî bixwînin zimanê berhemê hêsan dibînin. Ev hêl erênî ye, min jî dixwest ez zimanekî hêsan bi kar bînim. Lê kesên ku nû dest bi xwendina kurdî kirine zimanê berhemê giran dibînin. Çend şagirtên min ên ku ez wan fêrî zimanê kurdî dikim gazindên xwe yên bi vî rengî li min kirin. Dîsa şagirteke min naveroka çirokan pir giran dîtibû. Ji hêlekê ve mirin, xwekuştin, girtin, darvekirin... Çi dizanim, hema her tiştên ku em naxwazin di jiyana me de biqewimin min di çirokên xwe de bi cî kirine. Dema hin mirov van bûyeran dixwînin bêguman di hestên wan de xemgîniyek peyda dibe. Di berhême de rasteqîniya bûyeran û hûnandina wan bala xwendevanan dikişîne. Heta niha bi nivîskî ji bilî danasîne min li ser berhema xwe şîroveyek nexwendîye. Mixabin ji bo gelek berhemen kurdî rewşa heyî ev e. Ez baş dizanim tê xwendin lê şîrove nayên kirin. Li ser dirêjiya çirokan hin rexne hebûn û dîsa zimanê ku min di çirokan de bi kar aniye hinekî di bin bandora

tirkî de maye, rexneyên bi vî rengî jî hebûn. Bi giştî ez dikarim bibêjim hatiye ecibandin. Lê dîsa jî ez hêvî dikim ku bi nivîskî şîroveyên baş bîn kirin, da ku ez karibim hinekî xwe tê de bibînim.

✓ **Çirokên te piraniya xwe bi mirinê, yan bi daxwaza xwekuştinê diqedin, tu dikarî bi kinasî vê yekê şîrove bikî?**

Belê, hûn mafdar in. Ji bilî çirokekê di hemû çirokan de mirin, daxwaziya mirinê, yan jî bêhna mirinê heye. Sedemên vê yekê gelek in. Wek gel em rojhilatî ne. Ev yek bi serê xwe têra hin bersivan dike. Roj tune ye ku bûyerên diltezîn neqewimin. Di mirinan de serobinbûn heye, di mirinan de hilweşîn, talanbûn heye. Lê mirinên ku em dijîn ne ji rêzê ne. Her yek bi serê xwe trajediyek e. Di civaka me de nivîs gelek kêr in, lê berovajî vê yekê bûyer gelek in. Ji ber ku ez ji mirinê nefret dikim, min xwest ez mirina xwe, mirina gelê xwe binivîsim. Di çirokên min de nefret heye li hember mirinê. Di çirokên min de qirîneke wêjeyî heye li hember mirinê. Tu mirin naşibin hev di çirokên min de, her yek bi serê xwe mirinek, her yek bi serê xwe

xwekuştinek e. Min tu carî nedixwest ez lehengên xwe bikujim. Jixwe mirina wan mirina min bû jî, lê çi bikim em ji zû ve hatine kuştin.

✓ **Di çîroka yekem û ya dawiyê de lehengên çîrokan hewl didin ku xwe bikujin. Te paşiyê hiştiye ku lehengên pêşin dev ji xwekuştinê biqerin, lê di çîroka dawîn de, tu dihêlî Xezal xwe bikuje, çima gelo? Çima di çîroka pêşin de tu xwekuştinê mehkum dikî û di ya dawîn de weke rîyeke xelasiyê, ji lehenga xwe re nîşan didî?**

Ger hûn pirseke din ji min bikin û bêjin herî zêde kîjan çîrok li ser te bandor hiştiye, ez ê bibêjim çîroka Xezalê. Bi giştî çîrokên min ji nava jiyane hatine hîlbijartin, lê tu yek ji wan rasterast nehatiye jiyîn. Min her yek li gorî xwe hûnandîye. Hejmara van çîrokan jî ne hindik e. Mîna hemû xwendevan û mîna te ez jî lehengên çîrokên xwe nas nakim. Piştî ku min ew nivîsandin ji min re bûn nas. Ji ber vê jî min nedizani ew ê çi bikin. Hew min Xezal nas dikir. Çend şev û rojan min di ber wê da. Ez li ber digeriyam, min xwe diavêt ber lingên wê... Bila bawerîya te bi min were ku ji bo Xezal xwe nekuje ez gelek têkoşiyam, hema çi bikim wê carekê biryara xwe dabû. Jixwe di nava çîrokan de tenê Xezal xwe dîkuje. Çîroka Xezalê di nava rondikên keserkûr de hatiye hûnandin. Berpirsîyarê xwekuştina Xezalê ne tenê ez im, hinekî para we, para xwendevanan, para vî gelî jî heye. Em li jiyana dayikeke ciwan xwedî derneketine! Bi ya min bûya, min ê mîna çîroka yekem Xezal ji xwekuştinê xelas bikira. Lê Xezalê ev yek nedixwest, min jî nikaribû çavê xwe ji vê yekê re bigirta. Di çîrokê de min xwekuştin nedabûya ber Xezalê jî wê yê dîsa xwe daliqandibûya. Tenê ew ê kêfa me li cî bima. Me mirina Xezalê nebihistibû û her tişt tîkûz û durist bû. Xwekuştina Xezalê ne xelasiya wê ye, tenê rûreşîya me ye. Dê, bav, bira, xwişk, cîran, derdor, gel,

zîlam, jin û em li ku bûn gava Xezal di nava wan qeyranan de dijiya.

Di çîroka yekem de kesê ku dixwaze xwe bikuje zîlam e, lê di çîroka dawîn de ya xwe dîkuje jin e. Li vê erdnîgariyê herî zêde jin xwe dîkujin. Civaka ku em tê de dijîn vê hêlê derdixê pêş. Mixabin me hîn jî ev yek çareser nekiriye, çi dizanim belkî niha jinek dixwaze xwe bikuje... Xwekuştina Xezalê ji bo me peyamek e, divê em vê peyamê rast fam bikin. Her kesê/a ku vê çîrokê bixwîne hinekî sûcdar e!

✓ **Di çîroka “Generalê Evîneke Kujdar” de te hêleke balkêş a psîkolojiya mirov vegotîye. Heta niha nêzîkbûneke baş a wêjeyî li jiyana gerîla nehatiye kirin, an heqerat tê kirin, an bes bi zîmanekî propagandeyî tê vegotin. Tu dikarî çi bibêji li ser vê mijarê?**

Ev çîrok jî balkêş e. Ji demeke dirêj ve ye min dixwest ez li ser gerîla çîrokekê binivîsim. Ji ber ku ez di nav gerîlayan de nemabûm, bîranînên min tune bûn ku ez wan binivîsim. Lê belkî min bi hezaran li bîranînan guhdarî kiribû. Hema hema ez dikarim bibêjim ez ji nêz ve bi jiyana gerîla dizanim. Bi hezaran bûyer hene lê sed mixabin pir kêmtên nivîsandin. Ger min propaganda bikira ew ê ji gerîlayan re bibûya heqareteke mezin. Min nikaribû ev yek bikira. Bîranîn min jî tune bûn ku ez wan bi awayekî resen binivîsim. Ji ber ku bûyereke bi wî rengî tenê min di serê xwe de sêwirandibû, ez hinekî rihet bûm. Heta niha min rasterast du çîrok li ser gerîla nivîsandine. Di pêşerojê de ez dixwazim bi bûyer û çîrokên cuda li ser vê meseleyê bisekinim.

✓ **Tu bi salan di zîndanê de mayî, vê yekê li ser nivîskariya te tesîreke çawa kir?**

Ji hêlekê ve ez ji bo xwe zîndanê wek derfeteke mezin dibînim. Belê bilêvkirina vê yekê wisa ne hêsan e, lê dîsa jî ji bo min rastî ev e. Di warê nivîsê de ez deyndarê zîndanê me. Bi taybetî di warê psîkolojiyê de li



ser min bandoreke mezin kir. Di girtîgehê de em bi gelek mirovan re radibûn û rûdiniştin, vê yekê ji bo nasandina mirovan derfeteke mezin derxist holê. Xwendin, lêkolîn û nîqaşên zîndanê bûn sedem ku ez karibim ji rêyekê bidim ber xwe. Bi dehan hevalên min hebûn, me li ser wêje û ziman nîqaş dikir. Parvekirinên wê demê ji bo min bûn destpê-keke girîng. Her tiştê ku min dinivîsand bi rihetî min dikaribû bi hinekan re nîqaş bikim. Belê ez dikarim bêjim ji bo min zanîngeha wêje û jiyanê bû.

✓ **Li gor te pêdiviya nivîskarên girtî bi çi heye, sazî û dezgeh dikarin çawa bêtir xwedî li berhemên wan derbikevin û piştgiyaya wan bikin?**

Dema em di zîndanê de bûn, pêdiviya me bi gelek tiştan hebû. Di warê pirtûkan de zêde problem tune ye, lê bi taybetî di warê

têkiliyan de zehmetî tê kişandin. Potansiy-eleke xurt di zîndanên de heye. Heta niha ji ez bawer dikim ku em ji sedî li dehan ji xwedî derneketine. Hewce ye ku sazî û dezgehên me yên heyî berhemên zîndanên zêdetir binirxînin. Ez mînakekê bidim, hevalê min hebû ji bo ku karibe pirtûka xwe bide çapkirin bavê wî otomobîla xwe firo-tibû. Gelek berhemên ku ji zîndanên hatine şandin di bin refên weşanxaneyên me de wînda bûne. Hejmara van berhemên ne hindik e. Ji demekê pê ve di zîndanê de nivîsan-din ji bo gelek kesan diqede, ji ber ku tu kes li wan xwedî dernakeve. Saziyên me yên bi vî karî re eleqedar hewce ye ku wek polîtî-kayeke nû nêzikî vê mijarê bibin. Ji bo nirx-andina berhemên zîndanên têra xwe derfet ji hene. Ez nabêjim qet tiştêk nayê kirin. Hin hewl hene, lê wek karekî giştî û cidî li vê me-seleyê nanihêrin.

Parseko

Berfo BARÎ

Di bin geremola bajêr de
Hêviyên xwe yên rojane
Bi peyvên ji ferhenga Xwedê
Dilefand

Lingên bê serî
Ferhenga Xwedê
Avêtin ser poxanan
Peyvên parseko jî pê re
Ziman û çavên wî
Di bin tinazên
Ji aşîkê tijî û
Ji berîkên germ dertên de
Li pey peyvan digeriyan
Di nav tenekeya ku
Ji heyteholên jiyane zengarî bûye

Awirên parseko
Neynika sedsalan
Ger bixwestina

Wê xwe tê de bidîtina
Lê nexwestin
Ne xwe dîtin
Ne jî tu dîtin parseko

Û ez her şeveq
Ser û pêl gijomijo
Ber bi te ve dilezînim
Di kêliya ewil de
Ji rûyê xwe yê
Di awirên te de
Şerm dikim
Ji xwe
Ji te

Ez xwe dikujim wê kêliyê
Pirtikên min belav dibin
Ser ferhenga Xwedê
Û ser kefa destê te
Derbas dibin mirovên ku

Li pey demê bi erdê ve kaş dibin
Berî ku mêze bikin li pirtikên kefa
destên te
Tu yeko, yeko
Bi gora bavên wan de mîz dikî
Û bi gora min de jî

Etiriyên şîva êvarê
Dagir dikin
Dema te ya kurt
Tu li wijdaneke ku ji
ferhenga Xwedê fêm bike digerî

Ew jî di paş te de derbas dibe
Ji bo xwe bigihîne limêja êvarê
Û destên te qerimîn
Lêvên te werimîn
Di bin lingên bê serî de
Ferhenga Xwedê herimî



Amadekar: Lal LALEŞ

✶Hevpeyvîn bi Kawa Nemir re

Lal LALEŞ

✶Zimannameya Kawa Nemir

Zana FARQÎNÎ

✶Ji keviyên helbesteke birîndar bîşenga berzûrî
heyatê dibe

Berken BEREH

✶Mistek mirin

Ehmedê HUSEYNÎ

✶Serkîsof

Arjen ARÎ

✶Pêwîst û giranbuha

Samî HÊZIL

✶Li babîlê pêlwanek: Wergêr Kawa Nemir
Yunus EROGLU

✶Li ser sînoren rengîn siyek

Îsmail YILDIZ

✶Nameyeke mişt bêrîkirin li dû Pilingo Sedêyê
SEHERNAZÊ

✶Çika berbihevanînê

Elîxan LORAN

Kovara W, ji bo ku reh û kokên wêjeya kurdî ji xwendevanên xwe yê ezîz û zimanhezan re derxe holê; ev demeke dirêj e bi hûrgilî li ser berhem, jîyan û bûneweriya nivîskarên kurd disekine. Bêguman ev hewldana Kovara Wyê ya ku li ser nivîskarên kurd disekine, hem ji bo dîroka wêjeya me û hem jî ji bo nîrxandinên edebî û rexneyî dibin çavkaniyên gelekî girîng. Dosyaya wê ya der barê romana kurdî de rê li ber gelek nîqaş û afirîndeyên nû vekirin.

Xwendevanên ezîz, Kovara Wyê di vê hejmara xwe ya nû de jî li ser xîmekî hêja yê wêjeya kurdî, Kawa Nemir disekine. Çima Kawa Nemir?

Şaîr, nivîskar, wergêr, kovarger û editor Kawa Nemir di jiyana me ya kurdewar û rewşenbîrane de gelek xebatên hêja û bi rêk û pêk kir.

Ger mirov bi awayekî teferûatî li rola wî ya di Kovara Rewşenê de nenihe, hem mirov heyameke kultura kurdî ya Bakurê Kurdistanê ya salên piştî 90'î kêmtir zanibe û hem jî mirov nikare pîrsa kurdî ya ziman û çandê jî hêla aborî, politîk û sosyolojîk ve baş fam bike. Weke hemû xwendevanê me dizanin NÇM jî wan mektebên hebûna ziman, çand û hunera kurdî ye. Kawa Nemir jî yek ji wan şahid û xebatkarê heyama NÇM'ê û salên piştî wê ye.

Divê helbesta Kawa Nemir a ku yek ji qûçên helbesta kurdî ya hevçax e û azmûnên wî yê cihêreng bi nivîsên hêja bi-hatina nîrxandin.

Her wiha beyî ku mirov rola Kawa Nemir a di tevgera wergera kurdî de behs bike, wê dosya gelekî kêmtir bima, ji ber ku wî emrê xwe di ber wergerê de buhart.

Nivîskarên me jî we xwendevanên me yê ezîz re wêje û rewşenbîriya Kawa Nemir pêşkêş bikin. Bi hêviya ku em bi hev re qûçeke din li qûçên zimanê xwe zêde bikin.

“Sîsik û bîbika bînahiya helbesta min welatê min e”

Hevpeyvîn: Lal LALEŞ

✓ Lal Laleş: Heke helbest tişteki, kar û bareki peywendigirî wijdana mirovahiyê be, wijdana helbesta te li ku diavêje?

Kawa Nemir: Baweriya min pir bi wê yekê qewîn e, ku dibêje, helbest tişteki, kar û bareki peywendigirî wijdana mirovahiyê ye. Ez devê gotinê û serê giliyê vekim: Em di hundirê xelekeke dogehî de, bi kolîpoşmaniyeke sermedî, li welatekî nav û nişanên xwe ji dest dayî ji dayik bûn. Xeleka dogehî Kurdistanê me ye, ku me bi hezar û yek awayî tunebûna wê peyda kir, an jî hiştin ku tunebûna wê ya dûr û dirêj em bi xwe peyda bikin. Gava ku ez di ser sermîla xwe re dizivirim û li rabirdûya bi mij û moran, li çûyîya ciyê derdeseriyê dinîhêrim, dibînim ku *li wir bîr vala ye, li ber sêrî melekek dîlorîne*. Ne ku min di helbesta xwe de şaş dît û ev riste li ber siya tenik a bişenga xwe kelimand. Di nava sedsalan re, bi hemû çeksazî û alavên xwe yên dirinde ve, li min, li te û li her kes û kûsekî vî welatê dêran ferz kirin, ku em ne ku bi hema wisa baweriya xwe pê binin, lê li me hemûyan ferz kirin, ku em rast îmana xwe pê binin, ku bîra me ya dîrokî vala ye!

Belê, wijdan û redkirin li ba min yek tişt in; du tiştên jêk, lê dîsa jî tîk in. Bi yarmetî û palpiştan çendî çivan bidin xwe û hilgêr û dagêrî ku dibin ne xem e, ew her du li ba min heman qonaxê hiltînin û diçin di heman derê re derdikevin. Û ji bo ku ew ferzkirina ku kirin li min ferz bikin fût here, ji bo ku ez dawîya dawîn wê *bîra xwe ya ku li wir e û ne vala ye* peyda bikim, ji bo ku, ne ku biçespînim, lê ji bo ku beriya mirina xwe hebûna wê ya teqez biçêjim û bibêjim, *min hebûna te ya dûr û dirêj wiha peyda kir, Lêlê Kurdistanê*, min welatê ku ez bi kolîpoşmaniyeke mezin lê ji dayik bûm, bi hemû şax û şovên wî ve, ji sêrî de ji xwe re kir ew cîgehê ku wijdana helbesta min lê diavêje.

Bêguman, ku ez bibêjim, ev xweserî min e û min bi tenê peyda kiriye, ew ê ne rast be. Ev yek tîkildarî wijdana helbestkar-

bûnê bi xwe ye û ez helbestkarê helbestkar im; bînahiya jiyana min û helbesta ku ez dinivîsim, yek û heman tişt in, ku ev yek jî rê nade ya qelp, ya derew. Ji ber ku di jiyana min gişî de, xasma jî di van deh salên çûyî de, gelek kesan xedîr li min kir, di ser keda min re derbas bûn, ez êdî baştir dizanim bê wijdana helbesta min heye an na, an jî ew li ku diavêje.

✓ Baş e, lê sosyolojiya helbesta te?

Dirêjîpêdana wê yekê ye, ku min gava din hebekî behs jê kir. Heke wijdana mirovekî hebe, çavên wijdana mirov dûr dibînin; hêz û şiyaneke wisa berfireh bi wan çavan re heye, ku ew jî bînahiya helbesta ku tê nivîsandin peyda û bi laş û gewde dike. Û ew bînahî dişê her babeteke ku di nava gerdûna jiyana rojane ya civakî de dixulxule, bi lemelem dikişe, zeft bike û bihûne.

Min got, sîsik û bîbika bînahiya helbesta min welatê min e, lê ew ji xaniyê min ê ku ez jê derdikevim, paşê lê vedigerim û tê de bi nivîsandinê bêhna xwe vedidim û pê ve fonksiyoneke wê ya din tune. Di deriyê wî xaniyî re, di derwazeyê hewşa wî xaniyî re ez xwe berdidim nava jiyana ku jê re ne tu sekn e, ne tu sikûn e. Civat û cimaeta ku bi helbestê bizê min lê naçe, jê hez dikim, dixim binê erdê, derdixim, dişom û vedişom, dikujim û vedijînim, bi hemû çînen xwe ve, bi hemû şax û şovên xwe ve, bi hemû sûret û dîmenên xwe ve, bi hemû hal û hewalên xwe ve helbesta min pêk tînin. Sûretên bizav û dihevgera kêş û vekêşa civakî, bi riya kitekîtan tînin, bi riya yên ku ez *bi kuja çavên xwe* dibînim. Bêguman, çendî xef û qaşo fesîh nebin jî, dîsa jî hemû stran in û ji *gula cimaetê* ne.

Ez *tiştê heyî* bi şeweyekî din dixwînim û dinivîsim, nexwe bila yên xwendevan jî piçekî xwîne ji xwe berdin û bi şeweyekî din bixwînin û *tê bigihîjin!* Ew ê tê de hest bi rehjena bajêr bikin. Ew ê hest bi movikên

demê, xulxulîn û lemelema cîgehan û rewş û bûyer û qewamên veguherandi bikin.

✓ **Gava ku ez dêhn û bala xwe didim helbesta kurdî ya bi kurmancî, eşkere dibînim te têtikiliyeke ciyawaz heye li gel bireseran, an jî tiştan. Bo nimûne, navê wê helbesta te ya ku pir tê zanîn; *Serkî-sof*, an jî navê wê helbesta te ya ku te li ser *Selpakê* ava kiriye, an jî *Takarof*. Tu yê der heqê bireserên helbesta xwe de çi bibêjî?**

Ez cilikê li cehenemeyê ranexim! Ev yek pêşî encam û akama lêgerîna min a poetîk e, ku bi salên dirêj pê ve ez di nav re çûm û diçim. Ev yek *penetration*, dinavreçûna min e. Tişt her kêlî, bi şeweyên xwe yên cihêreng ji min ve xuya dibin, xwe nîşanî binahiya min didin û ez bi alîkariya teknîkên ji disîplinên hunerê yên ciyawaz wergirti – bo nimûne, sînema, fotografkêşî, nîgarkêşî, muzîk – bireseran tevî bizavên wan, tevî yadgarên wan, tevî asîkên wan gili dikim. Di helbesta min de, tu îşê min bi gili û gazinan, bi rewşa giriyokiyê nîn e. Ez bizava çi ya westar, çi jî ya tevgerbar dinivîsim û berê xwe didim bireseran, an jî tiştan. Tiştê ku Ritsosê gewre jê re gotiye, *synthetique*!

Min hê di destpêka helbestnivîsandinê de da pey nûxwaziyê, da ku *nû bikim rêz û civatim*. Bêguman ew yek bi riya ku Cegerxwîn dabû ser, dê nebûya; mebest ji helbestê, tê heye ku ji derdeserî û viyana xwegilîkirinê ji zêdetir, kûrkirina derfet û delîveyên hêz û şiyana xwederbirîna bi zimanekî berdest û heyî ye û kişandina sûretên bizavbar ên tiştan an jî bireseran di vê rêkê de kartêkertirîn rê ye bi raya min.

Û min rê û nîşaneyên vê yekê cara pêşîn bi giştî û bi bêhnefîşk di *Selpakfiroşê* bi xwe de, hê di navîna salên 90î de daye. Dubare bibêjim, hê jî ew xwendina ku wê deqê û yên ku di pey wê re hatin ronî bike nehatiye kirin, ew deq hê jî li hêviya xwendevanên xwe yên zîrek in.

✓ **Nexwe em tên ser pirsê teknîkê! Tu pir caran teknîkên poetîk dupat dikî. Ji *Selpakfiroşê* heta îro, ew teknîk bi çi şeweyî ne te bi kar anîne û tu bi kar tînî?**

Bêguman dibe ku ne ji hêz û şiyana helbestkarekî ye rê û rêgehên ku diçine ser helbesta nûxwaz yek bi yek li dû hev rêz bike. Ger çi ji kar û erkên wî, ji hêz û şiyana wî bûya jî, xwezaya helbestê bi xwe, *modus operandi*ya helbestê bi xwe, mixabin, rê nade helbestkar reçeteyeke bi vî rengî ji çav, guh û hişên dereke re binivîse. Vêca, tiştên ku ji min bê ez der heqê teknîkên poetîk de li vir derevekim dê ne encama sercemekê bin, lê dê encama sûretekî giştî bin!

Pêşiyê; lêgerîna bédawî ya di warê helbestê bi xwe de pêwîst e ji teknîkê bi xwe bê hesibandin. Sercema mîrateya helbesta mirovahiyê bi xwe tiştek e, heta ku helbestkar di dereke wê re nekeve û di dereke wê ya din re dernekeve, wê helbestkar bi xwe ji hemû teknîkên hatî ceribandin bê par bimîne! Teql û rîtmî zimanekî di nava ceribandinê bi sedan salan re xwe bi sed-sala me re gihandiye û her ceribandineke berê ji teknîkeke nû tê hesêb. Bo nimûne, di helbesta Rojava de, *sonnet* (sone) şewê û şewazeke req û diyar e, lê Shakespeare di çarçoveya soneyê de teql û rîtmî xwe ya nerm, leygîr û bêtir ahengbar aniye û li şewê û şewaza klasîk a soneyê bar kiriye, ku navê wê bûye *Soneya Shakespeareyê*! Lokman Polat ne di nav de, xwendevanên ku dikarin bi Îngilîzî bixwînin, bila ew bi xwe lê bikolin û vê yekê bibînin!

Du; xwendina kelepura wêjeyî bi awayekî din! Kelepore sercemek e, ku pîrî caran qutîkeke gewher û zêr û zeberan tîne bîra nîfşên heyî û bê; qutîkeke ku divê devê wê bê vekirin, lê zêde neyê vejandin û tevdan. Ev dişibe odeya mêvanan! Hûn pê dizanin, berê wisa bû, heta ku mêvan nehatina malê, deriyê odeya mêvanan bi heft qufleyan hişkehişk dihat radan û morkirin. Divê helbestkar, bi awayekî ji awayan, bikaribe bikeve wê odeyê, ango devê wê qutîka giranbûha veke, wê vala bike, tijî bike, vejîne, berevajî bike, ji babetên wê re şirove û raveyên nû bîne! Bi gotîneke din, faktora mereqê di çarçoveya kelepura wêjeyî û zeregiya takekesî de!

Heke ne wiha bûya, pirsê min ev e, gelo em ev serê bîst salan e çima Xanî, Cizirî û Feqiyê Teyran, wan klasîkên xwe yên gewre, bêtir ku em formên wan ên klasîk û req

bînin bîra xwe, ji çi re em babetên wan bi awirekî ciyawaz dixwînin?

Sê; başebaş famkirina qonaxine guherîn û veguherînê di diroka helbesta mirovahiye de û sûdwergirtina ji van qonaxên mijara behsê! Mebesta min ji vê yekê ew e, ku pê-wîst e helbestkar berê xwe bi hûrgilî bide zanyariyên der heqê zemînên nêzîktêdayî-neke poetîk. Bo nimûne, peywendiyên tenik di navbera Blake, Aloysius Bertrand, Laut-reamont, Rimbaud, Baudelaire, Mallarmé, Yeats, Rilke, Amy Lowell, Pound, Eliot, Ka-vafis, René Char, Ritsos, Seferis, Cansever û Anday de hene û ji erkên helbestkarekî/ê ye di bîra xwe de zincîreya van qonaxan durist bike, xelekên wan qewîntir bike. Ez nimû-neyê ji *îmajîzmê* bînim, ya ku min gelekî jê sûd wergirtiye! *Îmajîzma* ku Amy Lowellê û Ezra Pound di destpêka sedsala 20'êmin de dibe û nabeyên wê nivîsand, yek ji teqînên teknîkî yên helbesta sedsala borî ye. Bi riya hinek wergerên min kirî, ev panzdeh sal e ez hewl didim vê teqînê bînim rojeva helbesta me. Bo nimûne, vê pêlê bi xurtî xwe spartîye fotografan û sinematografiyê û narasyonê. Ê


min, beriya niha bi bîst salan, dema ku min xwe berda nava xwendina nimûneyên vê pêlê û teknîkê, min coş û peroşeke nedîtî ya helbestî zeft kiribû, ku ev kelecane hê jî bi min re heye.

Çar; bi raya min, ev nêzîktêdayîna Rit-sos a bi navê *synthetique* pir girîng e! Ango helbesta ku kêliyan li gel lept û livê, dîme-nan û sehekên mirov zeft dike. Gelo Ritsos vê parçecîhana poetîk a efsûnbar çawa du-rist dike? Divê lêgerîna bo bersiva vê pirsê bibe serêşî û kêferata her helbestkarekî/e kurd. Ritsos bi xwe jî rênexşeyeke bi hûr-gilî der heqê vê yekê de nade, lê bi raya min, helbestkar bi hewldana bo xitimkirina berhema hemû jiyana helbestkarekî/e din dikare van bersivan ji xwe û helbesta xwe re peyda bike!

Û wiha, heta wê roja ku ez bi wê hêviyê bim ji xwendevanan re der heqê teknîkên poetîk de tiştêkî zelaltir û berfirehtir bi rê û zê bikim, ta bi derziyê ve bikim.

✓ **Bivê nevê ez hest pê dikim bêtirî refe-ransên ku tu hûrik hûrik didî, xwe dis-pêrin helbesta Anglo Sakson. Dizanim gelek caran ji te hatiye pirsikirin û tê pirsikirin, lê ez ê di vir de bi hêviya ber-siveke vebir bipirsim. Bi wateya sûdjê-wergirtinê dibêjim, tu bo çi wiha ji hemû helbestên cihanê zêdetir xwe dis-pêrî helbesta Anglo Sakson?**

Pêşiyê ev pirs a ku bi berdeyamî ji min tê pirsîn, vê yekê timî tine bîra min: Ji nebûna rênexşeyeke poetîk çetir e mirov rênexşe-yeke poetîk hebe. Lê her gav şaş hatiye têgi-hîştin! Yekane riya min a poetîk çu caran nebûye helbesta Anglo Sakson; angos helbesta îngilîzî, îrlândî, skotî û amerîkî. Qor-zî-berên helbesta ku ez dinivîsim gelek in, heye ku bi wateya sûdjêwergirtinê girîngtirîn qor-zîbera helbesta min helbesta Anglo Sakson be, lê ne ya yekane ye! Ango ez bi zimanê kurdî û bi zaravayê kurmancî, helbesteke namoyî, bê reh û rişal û biyanî nanivîsim! Ebeden tiştêkî wisa tune! Lewma ez nas dikim ev pirs pirî caran bi mebesta ku di-bêje, va ye, em helbesteke ku tê famkirin û malhazirî dinivîsin, lê karê te yê poetîk ne ciyê têgihîştinê ye. Ez jî dibêjim, ez ji xaka Kurdistanê, li ser xaka bav û kalên xwe bi



Îlustrasyon: Şener Özmen

vê kêferata jiyana xwe rabûm û min rehên xwe berda nava bajarên dûr û giran û ez la-yengirê danîna sifreyên dewlemend û *aora*-yeke şeravî me. Tiştê ku ez bi helbesta xwe dikim ew e; ew cihana hûrgiliyan e!

Belkî di dest xwe re bê gotin, piştî ku te bi salan ew qas deq ji wêjeya Anglo Sakson wergerandine kurdî û werdigerînî, tu bi xwe çawa dikarî di helbesta xwe de xwe ji qonaxên havibûnê biparêzî, ez ê demildest dîsa bibêjim, yek; çu caran tîrsa min ji meseleya kartêka silsileta deqên wêjeyên biyanî ne-bûye, çî ku ez di heman katê de cihanî me, du; min çu caran zarvekirin, zarîkirin û resenî têkelî hev nekiriye, çî ku xweş nas dikim her wêjeyêke cîran an jî biyanî ji ya me re awêneyek e.

Yek jî, di wêjeyê de kadên ku di nava hev re diçin, çî bi riya wergerê çî jî bi riya xwendinê, wêjeya me ya neteweyî dê bigirin bibin astên bilindtir, ku ew ê jî me ji herêmibûnê, tengbûnê û koreweriya heyî rizgar bikin.

Dêhn û bala xwe pak bidinê! Wekî di her warî de her wisa bûye û wisa ye û dê wisa bibe jî, hewldana vejandin, famkirin, nûkirin û damezirandina wêjeya me ya neteweyî, meseleya pêşbaziya şaristaniyê ye. Baweriya min pir bi wê yekê heye, ku kurd dê êdî bikaribin qonax bi qonax qorzîberên şaristaniyêke mezin deynin. Ev jî encax bi hişên mezin, bîrên tûj, bi sebr û arameke ku em hemû ji hev hevî bikin û bi xebatên dûrebîn pêkan e.

Helbest jî yek ji girîngtirîn qorzîberên van qonaxan e. Lewma ez wiha di vê asta bilind de wêjeya Anglo Sakson ji xwe re dikim yek ji girîngtirîn nimûneyan.

✓ **Ku ez xwe bispêrim yek ji derdên yek ji pirsên çûyî, ez ê ji te bixwazim tu behsa peywendiya mekan û helbestê bikî**

Mekan, angû cîgeh, belê, yek ji arîşeyên helbesta min e. Gava ku asîka bînahiya min dide ser cîgehekî diyar, ku peydabûna van cîgehan bi ger û geryanên min ên aram ve ye, an jî sekna min a ku li derawayeke westar disekinim û li lept û liva cîgehekî, hûrgiliyên wê û gelek taybetiyên wê temaşe dikim, *kuja çavê min* dest bi tomarkirina xwe ya *pîlewer* dike, pê re jî, yekser piştî to-marê, bîra min a *xudreste* dest bi veavaki-

rîna wî cîgehî dike û di têgihiştina min a poetîk a cîgehî de mirov teqez, bi awayekî ji awayan, ileh cî digire. Ez nimûneyekê ji *Sal-nameyê* bînim, helbesta bi navê *Şeva Gul-dankî û Kulîlkî*:

tikîtenê

û serdestî leza mestereya şeva rîtol

a ku wê li serê pal daye

jinik çavên tariyê yên şûşe

lept û livên lêvên wê, arşîva bîranînên zer

şivîka teqereqê ya li ser caxên şaneşînê

Alaz û lêgerîn û ger û geryana min a di vê babetê de, ya ku ez di berhemên xwe yên berfirehtir de kûrtir dikim, xebateke tomar-kirin, veguherandin û dewlemendkirinê ye û hewldaneke berdewam e û şervaniya ber-bangî ye.

✓ **Her wiha bi babeta mekanê re, heke terîf bi cî be, pîrsa politîkaya te ya li ser ziman û çandê. Lawaz be jî, rexneyek heye li te tê girtin: Tu zimanekî têkelî devok û zaravayên kurdî durist dikî. Gelo ev stratejiyek e û têkiliya vê yekê bi bîr û boçûna te ya çandî re çî ye?**

Belê, rexneyeke bi vî cureyî *sui generis* e, lêbelê lawaz e! Helbest zimanê mirovahiyê yê xef e, ne ku şêlî ye, lê bi xefbûna xwe kûr e. Helbestkarê helbestkar çênabe xwe bi tenê li zimanê heyî, yê ku tixûbên wî teng û kurt in, bigire. Helbestkar ew kes e dikare bibêje ya ku ji her kesekî nayê bibêje û vê yekê jî zimanekî têkerese û têralav divê, ew jî çav-kaniyên zimên bi xwe ne, devok û zaravayên me ne. Lewma ez matmayî dimînim, gava ku dibînim hê jî tixûbên zimanê gelek helbestkarên kurd ne dirêjtir û ne kûrtir in ji tixûbên herêmên wan ên berteng.

Nêrîna min der heqê vê yekê de ev e û ev jî béguman stûna stratejiya min a çandî ye. Stratejiyek divê, ji ber ku helbest ne bi tenê ew war û diyar e, ku mirov bi tenê tê de bizûre, gilî û gazinan bike. Helbesta ku ji çav-kaniyên ramanê, bînahiyê, demê û cîgehan vexwe, ew helbest, bivê nevê, dibe pêşenga qonaxên duristbûna çanda nû ya xurt, ya ku civakê gişî rake ser zîn!

Heke ne wiha be, tu kesî navê rûnê helbestan binivîse!

✓ **Bi boneya vê bersivê, gava ku ez di vê çarçoveyê de sed sala 21'emîn bînim bîra te, xuya ye tu yê li ser rewşa helbestkar, her wiha nivîskarên kurd jî çend tiştan bibêjî, ne wisa?**

Deynê stûyê min e bibêjim û ez ê deynê xwe bidim. Em bibêjin, sermesele, dibe ku hêzên dereke û dînamîkên civaka me ya şikestî dest û mil dabin hev û di nava demê re *bîr* vala kiribin, lê îro êdî helbestkar û nivîskarên kurd heke wekî gumgumokan xwe bavêjin ser piştê û gunehê xwe bikin, mekrobên wêjeya bindestiyê belav bikin, teriya xwe qut bikin û wê li erdê bihêlin jî, dê *Dema Dehaq* dîsa jî li wan were xezebê.

Binihêrin, Ehmed Huseynî got "bejnên kurt û zimanên dirêj" û wî mesele ji gelek hêlan ve zelal kir û helbestkar, nivîskar û lêqewimiyên *Sendroma Stokholmê* rast li ser mîzê hatin girtin. Lê ez dibêjim, ne bes e! Çawa gotî, diroka

çandê efû nake, heke ji me kê di avabûna xaniyê bûnewera me de kevirek danîbe ser kevirê û xwe bê deng bike, wê diroka çandê wî kesî û wê kesê efû neke!

Vêca heke ji min bipirsin û bibêjin, tu bi van gotinên xwe ve behsa kê dikî, ez ê bibêjim, ez behsa wan kesan dikim, yên ku li ser navê helbestkariyê, nivîskariyê û wergêriyê hezar dek û dolaban digerin, şelaflî û dêldoşaniya serdestên xwe yên dereke û navxwe dikin û bi nezaniya xwe ya bi hezar cureyî, bi rewşa xwe ya "rewşenbîrê hilbijartî" kanalên televizyonan çap dikin û diwêrin şîretan li me

bikin.

Ne ku dijminatîya hinekan bikim, lê kesê ku ji welatekî be û bawerî û îmanê bi hêviya hebûn, serxwebûn û bixwebawerîya gelê xwe neyne, ew ne tu kes e! Mijar helbestkar bin, bila nimûneya her helbestkarekî kurd, René Char be, Ritsos be!

✓ **Ev mijar pariyekî jî têkiliya siyaseta kurdî û wêjeya kurdî bi xwe re tîne.**

Bêguman tîne. Wê têkiliya ku pir pêwîstî pê heye bê ravekirin. Bala xwe bidinê, rewşeke wiha jî heye! Çawa çêdibe wêjeyek û endamên wêjeyekê bikevin wê rewşa parsekiyê û hêviyê ji siyaseta kurdan, an jî ji desthilatdarên kurd bikin. Rewşa me ya ku em neteweyek in û şerê azadiyê dikin li aliyekî, her çî dibe bila be, desthilatî desthilatî ye. Rûyên vê meseleyê çiqas bin jî, ez ne bi van kesan re me jî!

Ez azadiya xwe ya takekesî, reseniya ramana xwe, bê awarte di her rewşê de, li hemberî tu kesî ji dest bernadim. Ew ê ku ji dest berde, hûn bizanibin bi xwe ne bawer e û hê nehatiye ber dergehê wêjeyê, helbestê, nivîsê û ramanê.

✓ **Wekî vê mijarê, heye ku ji wê zêdetir jî, tu der barê mijara wergerê de jî bi fesal î û xebatên te û berhemên te yên di vî warî de ji aliyê raya giştî ya kurdî ve baş tînin zanîn. Piştî ku te ew qas berhem wergerandin kurdî û hê jî werdigerîni û bi salan e li ser wergerê dipeyivî, edîtorîya berhemên wergerandî dikî, îro, wergera kurdî ber bi ku ve diçe?**

Te nepirsî, lê ez ê dubare bibêjim, ku werger yek ji pêwîstîrîn warên jiyana me ya çandî ye. Lê heke bi awayekî bi fesal, bi rêk û pêkî, bi zanîn, bi pîr û pergalê bikevin û di destên sextekarên vî warî de nemîne. Ku wiha neyê kirin, wekî encam, em ê li hêviyê bin qantir bizê û em ê seba çaqûyê ga mirar bikin!

Qonaxa Stokholmê jî tê de, qels be jî,



Serdar Kestay

ji destpêka salên 90'î û vir ve ye di warê wergerê de hewldanek heye, em vê yekê dizanin. Û ev hewldan, ev karê wergerê, ciyê dilxweşiyê ye, çiqas diçe, ew qas zêde dibe; îro ji salên 90'î zêdetir berhemdariyek heye di vî warî de, di nava wan de, kesên ku bi profesyonelî ranêzikî vî karî dibin, bi qanûnên wergerê bi wergerê radibin kêmbin jî, hejmara wergêrên kurd êdî zêdetir e û ew ê hê zêdetir bibe jî. Ev baş e, lê faktora girîng ew e bê ka em ê kîngê bi awayekî bi pîr û pergal û sistematîk dest biavêjin karê wergerê, em ê kîngê dest pê bikin bi riya komeleyekê yan jî yekîtiyekê van wergêran bi rêxistin bikin, em ê kîngê destnîşan bikin bê ka di kurmancî de wergerên baş kîjan in, yên nebaş kîjan in, em ê kîngê bi hûrgilî dest bi helsengandina wergerên heta niha hatî kirin bikin, di çarçoveya meseleya wergera ji zimanên resen û wergera ji zimanê duyem an jî sêyem em ê kîngê kêmasiyên mezin ên di vî warî de beşbelek bikin. Bi raya min, refikên pirtûkxaneyê kurdî ji vî aliyê ve bi wergerên bêkêr tijî ne û ez dibêjim, di vî warî de, di gelek newalan de gelek hesp hatine kuştin, lê ji bilî çend kesan, hê tu wergêrekî/e kurd nebûye beytar. Ne ku ez *qîçqirme* hesab dikim, ez dibêjim, wergêrên kurd ên ku xwediyên zanyariyê kurtedîroka wergera kurdî ne, mixabin kêmbin û wergêrên dema ku dane ser vê riyê, ji xwe re rênexşeyêke neteweyî çêkiribin jî kêmtir in.

Ji ber çi wiha dibêjim? Werger yek ji mezintirîn pêdiviyên zimanê kurdî û wêjeya kurdî ye. Ji ber ku ji me re pêdiviyêke ew çend mezin e, pêwîst e wergêr pak jê beled be bê ka li jêr van şert û mercên me yên neteweyî yên qels û qitût, wekî deqên ku beriya hemû deqên din bîr wergerandin, me pêdivî bi wergerandina kîjan deqan heye. Ez dibêjim, bila wergêrên me yên jêhatî, çi yên kevn çi jî yên nûjen, berê xwe bidin wergerandina berhemên sereke yên klasîk û dema xwe bade û belasebeb xerc nekin. Çi ne ev berhemên ku ez behs dikim? Bo nimûne, wergêrekî kurd heta ku rûnê deqeke erzane nivîskar an jî helbestkarekî erzane neteweyên cîran wergerîne kurmancî, bila dest bia-

vêje wergerandina berhemên wêjeyên xakên dûredest ên rojava û rojhilat.

Heke ez di vê çarçoveyê de bibêjim, şikra îro, wergera kurdî hê ji şahperên xwe venekiriye, hê jî bi firê neketiye. Lê ez gelekî pê bawer im em ê heta bîst salan wêjeyêke wergerê ya pîr dewlemend pêk bînin û ev ê jî bi awayekî nebînayî kar di geşedana wêjeya me ya neteweyî bike.

✓ **Bêguman pê re jî Rewşen dê bê bîra xwendevanan. Wekî kovareke wêjeyê, ji destpêka salên 1990'î heta sala 2003'yan, bi navên Rewşen, Jiyana Rewşen û Rewşen-Name, Rewşen li Bakur bû navenda wêjeya kurdî û wekî editor rola te ya di vê qonaxê de sal bi sal zêdetir diyar dibe. Ev ji zû ve ye, wekî encama van kovaran, ji hebûna Nîfşê Rewşenê tê behskirin. Heke tu wiha vegerî ser wê qonaxê, çend têbîniyên stratejîk ji dahatûyê re bihêlî...**

Rewşen bi her awayê xwe ve *giyanê he-yamê* ye. Dûmahîk û dirêjîpêdana dirûvgirtina serdema ronîbûn û ronîkirin û rewşenbîriya kurdan a di sedeya 20'emîn



de ye. Gava ku ez zincîreya ku ji rojnameya *Kurdistan*, kovara *Hawar*, *Ronahî*, *Tîrêj* û *Nûdemê* pêk tê tînim bîra xwe, rola *Rewşenê* ya di salên 1990'î û destpêka 2000'î de bo min zelaltir dibe. Ji ber ku *Rewşen*, bi taybetî jî *Jiyana Rewşen* û *Rewşen-Name*, hêlînên germ bûn, gelek nivîskarên îro xwedî gelek behrem, xwe lê girtin, yekem deqên wan di wir de çap û belav bûn; navendeke geş bû, ya ku bû meydana afirandina wêjeyî; wergerxaneyêke ezmûngerayî bû, ya ku li Bakur yekem car pêwîstiya wergerê anî, kir rojevê.

Rewşen ew cîgeh bû, ya ku ez kirim edîtor; ew warê çandê bû, yê ku hişt ez bi serbilindî bi kesên wekî Feqî Huseyn, Zahir Kayan, Esmâ Eksen, Cemîl Denlî, Mirad Badikî, A. Rahman Çelik, Nûrten Demirbaş, Berfin Zenderlioğlu, Mehmed Dicle, Esra û Sîmavê re bixebitim.

Niha, ez wekî edîtorê salên *Jiyana Rewşen* û *Rewşen-Nameyê* divê bibêjim, ne ku wê hingê tu kovarên din tune bûn; hebûn, bo nimûne, *Nûbihar*, ku li Bakur bûye temendirêjtirîn kovar û hê jî derdiçe. Lê bizav û dînamîkên ku *Rewşenê* û kovarên ditir bi xwe re anîn, wekî çil û çiya dûrî hev in. Bo nimûne, *Nûbihar* timî wekî weşaneke, dengêkî cimaetî ma. Lê *Rewşen* bû nûnera gelek beşên civaka kurd. Lewma jî, bi vê zerengiya xwe ya gotî ve gihiştîye asteke bilindtir û berferehtir, ku êdî ji mafê me ye em bibêjin, wê qonaxê, wan xebatan *Nîfşê Rewşenê* bi xwe re anî.

Wekî diyar e, di mijara *Rewşenê* de, niha ji her tiştêkî din girîngtir ew e, ku em

dikarin bibêjin, belê, êdî *Nîfşê Rewşenê* heye. Ew nîfşê ku îro bûye zar û ziman û şêweçêkerê îro. Di vî barî de, tiştê mayîn hûrgiliyên dûdirêj û xebatên li ser arşîva wê heyamê ne, ku ez li vir dubare bibêjim, wekî ez ê di pêş de xebateke taybet li ser bikim. Ev hem ji berpirsiyariyên min e, hem jî ji mafê min e!

✓ **Wekî te çelî giyanê heyamê kir, ev 35 salên ku kurd tê re derbas bûn, pîrsa min ev e: Rewşa aloziyê dikare wêjeyêke çawa biafirîne?**

Wêje ji nava rewşên bextewariyê û kêf û henekan serî ranake, geş pê nake! Li cîhanê, timî wisa çêbûye, heke em bikaribin li Kurdistanê behsa hebûna wêjeyekê bikin, li ba kurdan û li Kurdistanê jî wisa çêbû. Lê belê, bi raya min, ev qonaxa geşedanê ya ji serûbinbûna me ya civakî, kavi û dêrisbûna Kurdistanê peyda bûyî, hê jî neçûye serî, berhemên xwe yên mezin û gerdûnî bi temamî nedaye. Ji bo ku ev çêbibe, pêdivî bi awirên xurt ên nivîskariyê heye, pêdivî bi çavê dereke heye.

✓ **Ango, xasma bo romanê, divê mijarîne mezin piçekî sar bibin, da ku bi şêweyekî bêne nivîsandin...**

Belê. Em ji bîr nekin, ku Tolstoy *Şer û Aştî* piştî bûyerê bi demeke dirêj nivîsand.

✓ **Çawa gotî, destpêkên me bi dawiyên me nizanin; em bîr di peyvê re derkevin! Tu wekî helbestkar, nivîskar, wergêr û edîtor, lê beriya hemûyan jî wekî helbestkar, mebesta jiyana te peyva te ye. Jêderkên peyva te çi ne?**

Ez kurt lê xim! Deştî min a dûr e; Îdira



Zimannameya Kawa Nemir

Zana FARQÎNÎ

Ez li Farqînê bûm, Lal Laleş telefonî min kir û ji min xwest ku ez nivîsekê li ser Kawa Nemir bi navê 'Ferhenga Nivîskêr' bi-nivîsim. Ez bi kurt û kurtasî bibêjim ku min ev teklîfa wî pejirand. Lê min jê re got ku ez niha li Farqînê me û tu berhemeke Kawa li ber destê min nîn e ku ez li serê bixebitim da ku ji nivîsa xwe re jê kerese derxim. Li ser daxwaza wî min riya xwe bi Amedê xist û min ji Weşanxaneya Lîsê diwana Kawa Nemir a bi navê 'Salname' û wergera wî ya navdar 'Hemû Soneyên William Shakespeare' anîn û ez li ser wan xebitîm û min ji xwe re li gora mijara nivîsa xwe ji wan nimûne hildan.

A rast ez Kawa Nemir ji demeke dirêj ve dinasim û dostaniyeke me ya germ ji heye. Şêwaz û zimanê wî ji min re ne biyan in, lê dîsan jî diviya ku min li hin berhemên wî bikola û ji wan malzeme derxista da ku min bikariya çend tiştên berbiçav bigotina. Min welê jî kir. Li ser daxwazê, min sînor û tixûbê nivîsa xwe teng kir û min nexwest ez balê bikişînim ser mijar û dabaşên din û bergehê li xwe firehtir bikim.

Kawa Nemir, kesatiyekî ciwan î berhemdar e. Helbestkarî, wergêrî, weşangerî û edîtorîya wî tîn zanîn ku dahatûya wî jî geş e. Eger ez bi awayekî din rewşa wî bibêjim, ji bo dahatûyê xwedî stêrkeke geş e û ez bawer dikim ku dê bi xebatên xwe yên pîrhêl di cîhana kurdî de bibe xwedî nav û dengê hîn xurt û çalaktir.

Çawan min di serî de aşkera kir û daxuyand, ez ê li ser çawaniya xebat û berhemên wî ranewestim û nîrxandinan nekim, ne ku li ser warên Kawa pê dibile gotinên ez bibêjim nîn in. Na, hene lê min niha navê ez di vî meqaleyê de binivîsim. Ez ê bi tenê li ser taybetiya zimanê Kawa rawestim; hem jî hinek bi berfirehî, lê rastnivîs û rêziman dê li derveyî mijarê bin, ku loma min xwest di bin sernavê Zimannameya Kawa Nemir de tîbînî, nêrîn û nîrxandinên xwe vebêjim.

Min tîr bala xwe dayê û di zimanê wî fikirim ku Kawa di warê bikaranîna zaravayê kurmancî de gihîştîye merhaleyeke girîng. Ew ji ziman re serdest e û haya wî baş ji devokên kurmancî heye ku wan jî di berhemên xwe de bi kar tîne. Çendî ew xwedî devoka Serhedê ye û peyvên wê jî bi kar tîne ji wisan cih dide awayê bilêvkirina peyv û bêjeyên vî devokê jî. Gava vî yekê dike, ferq û meylê nake navbera devokên din ên kurmancî. Heta cih dide peyv û biwêjên kurmanciya jêrê (soranî) jî. Lê divê bê gotin ku rêjeya bikaranîna devokan di nivîs û nivîsarên wî de ne ew çend zêde ye. Ez gihîştîm wê encamê ku ew xwedî zimanekî tîkel î nivîskî ye û xwedî hewleke wisan e ku dixwaze zimanê standard ê nivîskî bi kar bîne. Devokan wek çeşnekê bi nivîs û berhemên xwe wer dike, bi wan berhem û helbestên xwe dixemilîne.

Ji bo ez karibim û bişêm bi zelalî mebest û alaza xwe xweş û hêsan diyar bikim, ez hez dikim di bin navbernavan de dirêjî bi nivîsa xwe bidim û nîrxandin û nêrînên xwe vebêjim.

Peyv û gotinên ji devoka Serhedê

Min xwest ez serê pêşîn ji devoka nivîskêr dest pê bikim û wisan bi mijara xwe de herim. Ez ê di serî de peyv û gotinên ji vî devokê bidim û paşê jî şêweyên wan ên zimanê nivîskî yan jî awayên wan ên ku di zimanê nivîskî de pîr tîn tercîhkirin û derketine pêş pêşkêş bikim.

anîzaz: ango anîsaz

cab: cewab

cinyaz: cenaze

ça: çawan (ça dibe; ango çawan dibe)

çong: çok (çongên pêxemberan)

danavî: kedera zêde, bêzarbûn

dêris: wêran, xerabe

devîdevî: kêr zêde, xwar jor

deyax: tirûş, liberxwedan

fêz: hember
fiq: dûdûk
kawî: kibarî, xurûr
kokel: heykel, kolît, şekil
kurmal: lawê malê
lex: leq, pergî (bi lex/leq min de hat)
olk: qebîle
sersîçe: ser û sinc (xûy, exlaq)
şerav: şerab, mey
zang: zang û zinar

biçûkêd hozanan: biçûkên di hozanan
 (an jî *biçûkê di hozanan*)

duayê xêrê be li wî yêd van keviran bi-parêze: duayê xêrê li wî be yê di van keviran diparêze.

Di devoka botan/behdînanê de ev –yêd wekî –yêt e ku jixwe nemir Celadet Bedir-xan behsa vê diyarkera (artikila) /di/yê di xebatên xwe yên li ser zimên de dike ku ew hem bi awayê yekejimar hem jî bi awayê pi-rejimar tê bikaranîn. Çawan me got, di devoka botan/behdînanê de wekî ‘biçûkêd hozanan’ tê bikaranîn ku em di berhemên helbestkarên xwe yên klasîk de rastî vê yekê tînin. Her wiha di zargotina me de îcar mîna gotinên ‘*saet şeşê di şevê bû*’, ‘*ez nayêd ser dinê di îslamê*’ derdikevî pêşberî me. Di van her du mînakên dawîn de, ku min bi zanebûn ew her du nimûne hil-dan nivîsa xwe, Kawa Nemir diyarkera /di/yê bi taybetî li gorî forma kurdên me yên Serhed û Qafkasyayê bi kar anîye û min jî xwest dêhn û balê bikişînim ser vê rewşa hanê.

Peyvên Kawa

Qesta min jî vê navbernavê ew e ku ez peyvên hevedudanî yên Kawa Nemir çêkirine pêşkêş bikim da jî me re fikir û ramanek der barê vê rewşê de çêbe ku nivîskar xwestiye bi vî awayî zimanê xwe zengîn û dewlemend bike, riya vegotin û hêmayê ya derbirinê li ber xwe fireh û ronî bike û afirîneriya xwe ya di warê dariştina qalib, şayes, vegotin, hêmayên ziman de jî bide xuyakirin.

Bêyî ku ez li ser van çend peyvên nimûneyî ku xweserî helbestkar in, şîroveyan bikim û wateyên wan aşkera bikim, ez wan rapêş dikim:

agirdûdayî
awirbende
berfeşîn
cilgeş
çavzerya
delalbişkoj
derbxedar
dermanbêj
dijmingaran
dilkolk
erdesmer
geşpêketî
gewdeşêr
henasekêş
hêvîdewlemend
kevnekul
kevnesûret
nexşeçolistan
nîvrêmayî
nûnîgar
pakviyanbarî
palanxwar
parzîbaran
perîmîr
polahêlî

pûçkemilî
serwerdîlber
serwerzeman
sînemdefter
sonenûsî
stêrkgir
stêrzarok
şevsaman
şîirfiroş
şîirkuj
takemizgînî
takeşev
takgewher
timpeya
tîrşikestî
torebaran
tozaran
vibirêzkirin
venêz kirin
xamriste
zaroknetewe
zêrgor
zêrînbengz
zimanpelinkî

Ev peyvên hanê jî bo min çend nimûneyên balkêş bûn ku min ew jî her du berhemên navborî yên Kawa hilbijartin û min xwest ez wan bêşîrove pêşkêş bikim da ku der barê afirîneriya wî ya di warê ziman de û li ser zerengiya jîrahiya wî jî bi me re hizîrek peyde bibe û bê ka Kawa çawan û bi çî mantiqê nêzîkahî li zimên dike.

Peyvên ji devokan

Di destpêka nivîsê de min amaje pê kiribû ku Kawa ji devokên zaravayê kurmancî haydar e û bi ya min bi zanebûn peyvên wan devokan jî di berhemên xwe de bi kar anîne da ku hêza derbirina zimanê xwe xurt bike, gencîneya peyvên xwe zengîn bike û bigihîje asta zimanê hevpar ê hevgirtî û xwe di nav sînorên devokekê de heps neke. Va ye çend mînak ji van devokan jî li jêrê ne:

çu car: tu car

halo: wiha

mezyandin: mêzandin, nêrîn

jêkve: jî hev ve, jêve

li ber dîwarî: li ber dîwêr (an jî dîwar); li

gorî tewanga nêrîtîyê ya devoka botan/beh-dînanê

pêkve: bi hev ve, pevve, bi hev re

pevre: bi hev re

qaneh: qanî

têkde: tevde

tikîtenê: tiptenê (ku wekî *tiktenê*, *tipû-tenê* û *tiqûtenê* jî di zimanê devkî de heye)

vêkre: bi hev re

wanî: wisan, wilo

wer: wisan, wilo, wergî

wilo: wisan

xikîxalî: xipxalî (ku wekî *xipûxalî*, *xikxalî* jî di zimanê devkî de heye)

zuha kirin: ziwakirin (ziyakirin)

Bikaranîna derfetên zargotinê

Kawa çawan xwestiye jî devokan xwe nede alî wisan xwestiye qalib, biwêj û şayesên zargotina kurdî jî ku pir nas in di helbest û wergera helbestan de bi kar bîne û çêj û lezetekê bide zimanê xwe. Bi gotineke din, jî bilî afirîneriya xwe ya di warê bikaranîna zimên de û çêkirina qalib û şayesan, welê dixuye ku xwedî helwesteke wisan e ku dixwaze jî derfetên zargotina kurdî jî sûd û kelkê wergire û bi vê yekê ez hezîr dikim ku ketiye nav hewldanekê da têgihîştina jî zimanê wî hêsantir bibe û zimanekî rewan î fehmbar û fesih derkeve rastê. Bêyî dirêjkirinê va ye çend nimûneyên jî zargotinê jî:

bêzar û ziman

birc û kelat

bi rê û zê kirin

can û cesed

cila xwe jî avê derdixe

çem û kanî

çiya û banî

daw û doz

derd û kul

dev dilê min yek e

li çeçeqê geriya

li darê dinyayê

mal û milk

rast û durist

rê û dirb

sing û ber

soz û bext

şewq û şemal

tehb û sehb

ter û teze

xas û am

xelk û alem

xeml û xêz

xerîb û xerîbistan

Çend peyvên ji soranî:

Rastiyeke berbiçav e ku zaravayê soranî gelek peyvên nûjen û yên ku hewcedariya kurmançî pê heye, dane kurmançî. Kurmançî bi vê yekê hêza xwe xurtir kiriye ku jixwe divê zaravayên kurdî xwe nêzî hev bikin ne ku xwe jî hev dûr bikin. Divê ev siyaseteke hemû eleqedar û têkildarên ziman be ku ez bi xwe yek jî parêzkarên vê yekê me. Lê bi şertê ku em tehde li zaravayên xwe nekin û guherînan di peyvên xwe yên heyî de nekin, bi fonetîka wan jî neleyîzin.

Kawa Nemir, jî bilî ku me çawan got û daxuyand wî xwe jî devokên kurmançî nedaye alî, her wisan serî li peyvên soranî jî daye û bi ya min wî bi helwesteke bizanebûn û îradî di nav nivîsên xwe de bi kar anîne û ez dixwazim çend heban jî wan li jêrê pêşkêş bikim da mijar û mebesta min ron û zelaltir bibe:

belam: lê, lê belê

berawird kirin: hevberî kirin (qiyas kirin)

çak: çê

çiroknûs: çiroknivîs

helsengandin: nirxandin

li qelem dan: li qelem xistin, tomar kirin (qeyd kirin)

namoyî: biyan, biyanî

romannûs: romannivîs

sonenûs: sonenivîs

şanonûs: şanonivîs

xerîk: bilîn, bilî bûn (mijûl bûn)

Min divê ez çend gotinan li ser awayê bilêvkirin an jî vekît û rastnivîsa *çiroknûs*, *romannûs*, *sonenûs* û *şanonûs* bibêjim. Ev paşgira (parkîta) *-nûs* jî zaravayê soranî tê ku kurmançiya wê *-nivîs* e û her du jî jî lêkera nivîsîn û nûsîn tî. Lê Kawa Nemir (heta hin hevalên derdora Weşanxaneyê Lîsê jî tê de) wek tercîhekê forma bi zaravayê soranî jî xwe re dipejirîne û welê dinivîse jî. Helbet ev tercîha wî ye, lê wek kesekî ku

serê xwe li ser zimên diêşîne û pê re eleqedar e, hez dikim bibêjim ku ev yek bi min rast nayê. Ji hildana peyv û têgihan re erê û belê, ji deformekirin an jî ji lêanina peyvên zaravayekê ji zaravaya din re na.

Hez dikim dubare bikim ku ez xwedî ramaneke wisan im ku divê em zaravayên xwe nêzî hev bikin, wan ber bi hev binin, aliyên wan ên hevpar (muşterek) derxin pêş û cudahiyên di navbera wan de bi helwesteke wiha kêmtir bikin, nemaze têgih û peyvên nû yên ku hewcehiya zaravayan bi wan heye em bikin ku ji hev û din bistînin, lê deformasyonê di zaravayan de pêk neynin.

Çend şaşiyên vekîtê

Min diyar kiribû ku ez ê li ser rastnivîsê û şaşiyên rêziman ne-sekinim, lê min nekarî ku ez xwe ragirim û behs ji vê rewşê nekim. Çend şaşiyên rastnivîsê bi awayekî beloq derketin pêşiya min û wan dev ji min berneda û min jî nekarî ku ez xwe li dîtina wan da-neynim û nebin xwedî. Bi kurtasî be jî ez ê behs ji van çend hevokan bikim ku çewtiyên mezin ên rêzikên rêziman û vekîtê di wan de hatine kirin. Êdî ez nizamim ji nivîskar qewimiye yan jî ji redaktor.

Pêşî, yek ji wan jîneke xortxapî-nok î fêlbaz î dilse ye: Rastiya vê hevokê ji aliyê rêzika gramerî û vekîtê ve wiha ye. Gava di hevokekê de raveka zincîreyî hebe û çî navdêr çî jî rengdêr yekejimar be veqetandeka pêşîn eger nêr be /-ê/ dibe /î/ û cihê tê nivîsandin, na heke veqetandek mê be /-a/ dibe /e/ û cuda tê nivîsandin. Lê ku veqetandek pirejimar be /ên/ di rewşa raveka zincîreyî de îcar dibe /en/ û cihê tê nivîsandin: Eger em bi kurt û kurtasî bibêjin: Veqetandekên nebinavkirî gava dikevin pêşiya rengdêran û wekî şeklê î, e û en cihê xwe digirin. Li gorî vê rêzikê em hevokê sererast bikin: *Pêşî, yek ji wan jîneke xortxapî-noka fêlbaz e dilse ye:*

Niha jî em bîr ser awayê pirejimar û he-

vokê rast bikin: Hevoka mînak wiha ye: *Çawaniyên razbar î geh penî geh nepenî:* Awayê wê yê rast: *Çawaniyên razbar en geh penî geh nepenî.*

Hevoka din a dawîn jî ev e: *Li dara dinyayê:* Lê diviya ku bi awayê '*li darê dinyayê*' bûya.

Piştî van nirxandin û tehlîlên li ser taybetiya zimanê Kawa Nemir ez dikarim bibêjim ku Kawa gihîştîye asta zimanê me yê nivîskî yê ku ber bi standardê ve riyeke xweş û baş xwe dikudîne û nake ku meriv bibêje sal bi sal xwezî bi par. Her wiha qesta min a ji gotina devokan jî ev e ku ew jî şêwe û şeklê peyvan û bilêvkirina wan e. Ne ku peyv û

biwêjên ku piranî di devokekê de hene û gurahiya bikaranîna wan di wê devokê de zêde û zehf e.

Na, hemû peyv û bêje, biwêj û gotinên pêşyan, qalib û şayesên di devokan de tevde malên kurdî ne. Hewce û pêwîst e gişt bîr bikaranîna û zanîna da ziman û gencîneya me ya peyvan bi wan xurt û qewîn bibe. Lidîjbûna me ew e ku nivîskar an jî helbestkar tenê bi awayên bêje û bilêvkirina devoka xwe binivîse û bipeyvîve.

Careke din ku ez vegerim ser taybetî û xweseriya zimanê Kawa, dişem bibêjim ku li gorî bîr û baweriya bi min re çêbûye helwesta

Kawa ew e bi zimanê standard ê nivîskî hîlberîna xwe bike, lê bi reng û taybetiyên devokan û heta zaravayan jî zimanê xwe bigihîne hêza derbirîneke pêşketî û ji xwe re xweseriyekê, xetekê biafirîne û cudahiyekê pêk bîne. Çendî jî derfeta bikaranîna devok û zargotinê îstifade dike jî, ev rêje di helbestên wî de gelek hindik e û bi ya min di warê bikaranîna zimên de xwedî helwesteke neteweyî ye jî. Jixwe, ji ber ku rêjeya bikaranîna şêweya peyvên ji devokan û îstifadekirina ji zargotinê ne pir zêde ye û meriv aciz nake, heta bi ya min, mirov dikare bibêje ku vê yekê rengê xweş jî daye zimanê wî.



Ji keviyên helbesteke birîndar bîşenga ku berzûrî heyatê dibe

Berken BEREH

Octavio Paz di berhema xwe ya bi navê “Helbest û Dîrok”ê de wiha dibêje “Qedera helbestvên, bi taybetî jî di serdemeke wek a me de ku dixwazin reng û dirûv û wateyeke din li peyvên gel bar bikin de, her yek e. Ji ber vê jî helbestvan û helbesta wî nikare jî hev veqete. Her du heman tişt in. Helbest jî her wek helbestvên, bi jiyane ve girêdayî ye û bi wê ruh û can dibe û xwedî karakterekê ye.” Em dikarin lê zêde bikin û bibêjin ku, nexwe helbest di hundirê xwe de hemû bermayiyên kevn û tovê dahatûyê dihevine. Ango rêwîtiyeke dûr û dirêj, keşîfkirina dinyayê û rastiya xwe ye.

Dema min “Selpakfiroş”a Kawa Nemir xwend jixweber ev tiştên li jor di hişê min de xwe dan der. Pê re jî gelek pirsine din ku dê di gotara xwe de car caran wan bînim bîra xwe û we, hatin mêvaniya min. Kawa Nemirê ku gelek keda wî di nivîskarî, wergêrî, kovargerî û wêjeya kurdî de heye bi helbesta xwe jî xwedî nasnameyeke resen û rengîn e. Ewî bi helbesta

xwe û destnîşankirinên wan, rê li ber derbirîneke zelal û bi tehm vekir. Kawa Nemir hê di emrekî ciwan de xwe da ber karê weşangerî û wêjeya kurdî ku ev kar û bar her tim bi civaka kurdî re bejn avêtiye, dirûv û teşe girtiye. Ji ber hindê berhemên wî di heman katê de rastî û heqîqeta civaka me ye jî.

Ew xwe davêje ber bextê “kelama qedîm” daxwaza vegeerê lê dike ku “pişt a qewmê wî yê çiyayî” bi wê rast e. Bi vî awayî daw û doza derbirîneke resen, kurdewar û xwedilêderketina zimanê kurdî dide pêş û birîna xwe bi destê xwe jî hev vedike û dikeve riya ku wê biçe “Terra incognita”yê. Ji bo vê jî dibêje “Bi xatirê te welato! Roj baş qanûna bahoze/şahînsahiya zimên.” Belê ew rêwî ye êdî, ji bo bîdestxistina derfetên vegera “kelama qedîm” Di vê rêwitiyê de her ku bitengîye wek cotkarê zeviya xwe cot dike, dest diavêje çeltê xwe û biranîneke qewmê xwe jê derdixe, sebra xwe pê tîne û bi vî awayî hêz û şiyana wî xurtir dibe. Ma bav û kalên me jî di şevbuhêrkan de her carê serpehatiyêke xwe venedigotin da ku em baş têbigihên û bibînin xweşmêrê qewmê xwe. De ka em çeltê xwe serberjêr bikin; Va ye “qiseta hespên esmanî”, “serkîsofa” wext û demê bo me vedibêje, “siwarên berbangê”, “heyva li ser riyan” û “vî dilê hawar navê”.

Belê her helbestek dimen, wext û deqek e ji serboriya qewmê wî yê ku “fena hespekî bê gem û bê zîn, ling li pêkolyê, li ser û binên xetên vala” Lê “mar û kûçikan dor li me girtiye, lewma divê hinek bixebitin, ên din jî rîman bigirin.” Her der û war bûye cihê lehengên “kelama qedîm” belê mar û kûçik jî carinan “Star”an hildiveşînin.” Di “ro li ava de” Simir per û



baskên xwe dadiweşîne ser û “li zomê/şesek nan derdixin ji Kawa re” ji dîrokê hatiye, westiyaye, paşê wê têkeve govendê, şer bike; bireqise bi zomê re.” “nîndaristan”, “amadekarî”, “destgirê-dayî”, “peng”, “binemalekî serî hilda”, “şevnemşev”, “kanîzil” “poş” çend dime-nên Kawayê ku ji dîrokê hatiye û dixwaze “kelama qedîm” sererast bike ye. Helbet di vê hewldanê de gelek niştecih ber bi xerîbiyê ve dimeşin da “kelam” dirêjî hêzên mezin bibe, kilam berzûrî hozên mezin bibe. Her bi vî awayî bûye; vê xaka bi adan û bi ber, car caran serî kutaye li hember dîrokê û carinan peng bûye wek avên bêrm. Lew “di jankişandinê de qîza kezî ne / nazik û nazenîn in, nezan in.” Lê vê carê wê gelek dom neke ev rêwîtî lew “em ê çend salekan, li ber siya dare-gûzekê bimînin.” Lê heyho! sal bihurîn wext riziya û “madama li ber pencereyê “dûrîkan didêre bi ser katjimêrên diwaran ên Frenk de.” Piştî baranê “ji hev re digotin derî bi derî, xanî bi xanî”; “mêrê wê berdidin, dibêjin bûye îtirafkar.” û “jinebiya çavê wê li valahiyê diqerime û mêrê xwe yê çûyî bajarê Îskenderiyeyê dipê.” Belê hê strana mirovahiyê nehatiye gotin û “şewekarê nemir” radigihîne me direfşa xwe; dibe dengê newal û geliyên jibîrbûyî, dibe çiya bi xwe.”

Kawa Nemir di “selpakfiroş”ê de welatê xwe û jiyana xwe û civaka kurd ya bi erdnîgarî û hemû heyberan ve ketiye ber pêlên tofanekê ku carinan mizgîniya dahatûyeke rengîn û carinan jî têkçûn û serûbinbûna erdnîgariyekê dinexşand wek filmekî, di ber hiş û çavê me yê “trahomî” re dibe û tîne. Da ku em şok nebin û hiş û mêjiyê me çilqe her qewimîn û bûyerekê bi yeka dilxweşker re dixwe rêzê, wisa em hino hino hîne eş, têkçûn, şaşîti, çewtî û destkeftinên xwe dibin. Vê çîroka ku G. Judanîs wek xezîneya neteweyê bi nav dike bi nermenerm û henûniya dayikekê vedibêje, ev çîrok ku duh, îro û tovê dahatûya me di xwe de dihevine, di heman demê de dibe hêz û şiyana me û hevîrê hevgrirtin û yekîtiya neteweya me. Jixwe ji ber vê ye ku K. Nemir dibêje “helbestvên

welat afirand”. Nivîskarê afrikî Nugugu dibêje “li Afrîkayê du estetîk hene; yek a serdestan ku dixwaze koletiya me bidome û ya din jî ya afrikîyan e ku dixwaze wan azad û serfiraz bike. Ji ber hindê berê estetîkê ka helbest çiqasî jiyana reşikekî/ê xweştir dike girîng e.” Kawa Nemir tam jî poetîka xwe li ser vî esasî ava dike, ew di ber destnîşankirina xweşkirina jiyana kurdan re binyada vegotin û estetîkeke kurdewar jî datîne. Vê jî li ser bermayî û mîrateya helbesta kurdî durist dike. Em di tevahiya berhemên wî de rastî vê dahûnandinê tînin. Lew; “here, daw û devling hildayî, pal li xewna Xanî / di hiş re here, ku diwana mîrgan lê tê xwendin”ê lê dike. Baş zane ku derman û melhema vê birînê her giya û benîştê kurdî ye.

Her çiqasî K. Nemir berhema xwe kiribe du beş jî, ji hêla naverok û tîmayê ve yek e. Bes beşa yekê ew tişt in ku di serdema rêwîtiyekê de ketine ber zooma mekîneya fotografan. “Selpakfiroş” piştî rêwîtî û konvedana wî ya li Stenbolê û pê de tiştine ku ketine ber objektîfa wî ne. Lê ew kes in ku terkiserî welatê xwe bûne û hatine vî bajarê ku nasnameyeke dinyayî bi stûyê xwe ve daleqandiye. Belê ermen in, cihû ne, kurd in û ji her din û olî ne. Her kes dixwaze kilama xwe rast û durist bike, dengê xwe ragihîne dinyayê. Giş bi hemû hêz û şiyana xwe gelek caran dadikevin qadan, stranên xwe vedibêjin, alên xwe dimilmilînin. Lê bi gazind e helbestvan “xwendina we zor û zehf e, lê ne kilama we ye.” Lew, ev bajarê dişibe dêwekî heftserî her tiştî dixwe û dikuje yan jî dişibîne xwe. Ji ber wê ye “dîrokek bihurî Selpakfiroş / em neketin defteran.” Wek xencerekê xwe bera dilê me dide.

Di dawîya “selpakfiroş”ê de Zerdest serê xwe radike ji dîrokê û vê rêwîtî û berxwedêriya salan şîrove dike “koçer in qewmên bêziman î qemer / zanyariya hişyarbûnê jehra qîlên marê min e / di nava we de me, venagerim şikefta baçermokan” û berhem bi “pesn”ê ku mizgîniya vegera kelama qedîm radigihîne me ye.

Belê wek min li jor jî gotî, “selpakfiroş” çîroka neteweya kurd a van sih salên da-

wiyê ye ku pireke saxlem ava dike di navbera rabirdû û îroya me de. Vêya jî bi figûr û rîtûelên olî, dîrokî, civakî, wêjeyî ava dike. Bi vê hewldana xwe jî reng û dengêkî nû û nûjen e di helbesta kurdî de. Ger ez ji hêla ciwankariyê ve binirxînim em dikarin van tiştan lê zêde bikin;

1 - Selpakfiroş zimên û girîngiya zimên destnîşan dike û rolên wan ên di avakirina netewe û wêjeya wê de bi awayekî zanistî tîne zimên. Poetîka wî ya zimên xwe dispêre helbestvanên beriya xwe; zimanekî şayik î rewan û peyvên di nava civatê de di jiyana rojane de tîne bikaranîn. Vegotineke ji kaniya wêjeya devkî ango ya dengbêjiyê derbûyî bi zimanê îmaj û hêmayê re dikeve govenda ciwankariyê û derfet û delîveyên adanî vedike ji helbesta me re. Ferhenga wî gelekî xurt e, peyvên bajarvaniyê daxilî helbesta xwe kiriye.

2 - Gelek cureyên hunera îmaj û ciwankariyê hatine bikaranîn; şayesandin, mubalexe kirin, şibandin, îstîiare...

3 - Kawa Nemir ne tenê deng û hawara kurdan her wiha ya gelek gelên din e jî; ermen, cihû, afrikî... Bi vê helwesta xwe dixwaze mirovahiyê gişî hembêz bike.

4 - Yek ji wan kesan e (di helbesta me de çend kes hen e?) ku bajar û bajarvaniyê û pirsgrêkên wê û wehşet û barbariya kapîtalîzmê, bi awayekî henûnî lê bi zanistî destnîşan dike.

5 - Selpakfiroş, bawerî û zanîna me geş û xurt dike, ev jî pala xwe dide xwendineke kûr û xebateke dûdirêj. Ev jî ji taybetiya wî ya wergêriyê tê.

6 - Berhem her çiqasî bi rêbaza vegotînî hatibe lêkirin jî, jidilbûn û dilsozî û newaya wê ya ji kaniya dilê wî derbûyî ye tê.

Kawa Nemirê ku her kêlika wî bi kilam û serboriya kurdiya wî re dide û distîne, kir ku di kateke zû de xwe bigihîne derbirina rastîn a kurmanciyê û bi newaya wê ya dilhebîn û vegotina rastîn dinyayê û wateya hebûna me şîrove bike. Ez vê ji ku zanim û bi çi ve girêdidim? "Bîşenga Deşta Dûr" Kawa Nemir, di vê berhema xwe de bergeh û objektîfa mekîneya fotografan heta dawiyê vedike û li derdora xwe

û heta asoyên dûr û li paş deryayan digerrîne. Ji me re pencereyên nû vedike û riyên diçin nehênîyên zanîn û bextewariyê li ber hiş û hizra me radixe. Vê, bi peyv û hevokên toza sedsalan ji xwe dawêşandî û wek stêrkeke bi şewl tîne odeyên me yên di şevtariyê de di orta wê de dadîçikilîne û em di van pencereyên ku bi ser hiş û hizrên nû de vedibin rastî pirs û pirsyarên dijwar tîne. Geh em feodaliya xwe ya wek şerekî li ser riya veguherîn û veberhênanê çik li ser piyan rawestiyaye tîne, geh em li xwe diwarqilin ku "tiştêkî nû nîn e / ji bilî peyvên me" yan pêrgî "her kesek, hinekî be jî, mêrkuj e / di cimeata şaşan de" tîne û paşê wek rûbarê berê xwe biguhere "û min piştî sedsalan serî rakir ji destpêka helbesta zarê xwe / û got, xortaniya min bûye diz û bigire / bireve li kuçe û kolanên Bizansê." dikevin hewldaneke pîroz a xwenûkirinê.

Kawa Nemir, carinan helbestên bi zimanê îngilîzî raberî me dike da ku qîm û bawerîya me bi afirandin û dahênana qewmê me û helbesta me bê. Bêguman ev reng dibe bawernameyek bo K. Nemir jî.

"Bav û kalên torin" û "bîşeng û siya arzebê" du helbestên girîng û balkêş in ku hem bi awayê vegotin û honandinê û hem jî bi peyam û ramana di hundirê xwe de dihewînin de. Bi ya min ev her du helbest hêjayî nîrxandin û analîzeke cuda ne. Di ya yekê de rastiya civakê ya olî û bandora wê ya li ser cimaeta kurdan û ya gelê anatolyayê xweş şîrove dike û hêza wê ya di ponijîn û ramana me ya di derbarê jiyan û gerdûnê de tîne ziman.

"Bîşeng û siya arzebê" rexneyek kubar û nerm, lê wek xencerekê birînên kûr dihêle li dû xwe, di canê me de. Lew, eşîrî û êlparêziya me dide rûyê me û guneh û çewtiyên me rêz dike; "Hûn! Hûn ji dil û can diparêzin eşîreke li ber sirkatê / cara pêşîn e wê xelata hewldana we bibe mirina / kesê ku dil dîkin rizgar bikin û biparêzin!" Lê, paradoksa me jî ev e. Helbestvan vê dibêje, "ne Meleka/ê em li benda wî/wê ne. Çare aşkere ye "hekîmê kurmancî" ye.

Em di berhemê de pênasiya helbesta

Kawa Nemir jî dibînin, ez meyla wî ya ber bi ristê û razberkirina helbestê tîm û ez namînim li benda berhemeke din, di çend rûpel şûnde “va ye mitirbekê bajar da hev”, “strana ewî ku diçe” û “lûtke.” Lûtkeya ku gihaye kokelên helbestê û konê xwe vedaye li esmanê derbirîneke rastîn ê razberî helbestyane. Ez bê hemdî jê re diçim sicdeyê!

Evîn nehatiye piştguh kirin. Ew bi hemû xweşikî, adanî û cazîbeya xwe daxilî helbesta rengîn a Kawayî bûye û mirovbûn û arezûyên me bi awayekî keçînî aniye zimên.

Di berhemê de ez rastî gelek şêwe û formên ciwankariyê hatim; reng û dirûvên romantîzmê li kêleka sureralîzmê mexel hatiye û tam, çêj û bêhnna Pûşkîn, Elûard heta Ezra Pound, di qehweya Kawayî ya helbestî de belavbûyî ye.

Pexşanhelbest, di “bişenga deşta dûr” de, di çavpêketinekê “dibace”, “du sî”,

“girê ku hitlê”, “şîna darberûyê” û di “hespê di odeyê de” serkeftî hatiye bikaranîn.

Ev demeke dirêj e ku serê xwe bi pîrsekê diêşînim û dixwazim vêya bibêjim; gelo zayenda helbestê heye û helbest dikare bibe nêr û mê? Belê bi ya min her helbestek xwedî nasnameyekê ye û di wê nasnameyê de zayenda wê jî hatiye nivîsîn; nêr an mê! Bi ya min helbesta nêzî “helbestê, yan gihayî wê hêjayiyê, mê ye. Helbesta Kawa Nemir jî helbesteke mê ye û wê di pêşerojê de zarok(helbest)ine jîr û spehî diyarî me bike.

Û ger Kawa Nemir, xwe ji vegotina çîrokî û derbirîna bi peyvên zêde dûr bixe û qedr û qîmetê bide ristê û wê parzûn bike û tîriya wê baş pêk bîne dê ala helbesta kurmancî li navenda wêjeya cîhanê bide milmilandin.

Dest û pênûsxweş Kawa Nemir,
Her bijî helbesta kurdî!

Diwana Kucya Arazînkî

Lo Mîro! Bîla destên te yê karîbarî li ser
fîsta bajêr bin. Porê cilakî yê wê navgendiyan
ku Eîlî Paşayê Arazînkî dîke; laşika bertîrî;
destmala li destê Îstara. Tûlayên li asîtana
peristgehê dîkî helkehelke, li laşika dîkî ber
gomiyan Evarn ku dîkilke! Lo Mîro! Bîranî
dîbarî, diwana B'îyê cardin serav bibe!

11 Pûşper 2003

Amred

Kawa Nemir

Mistek mirin

 Ehmedê HUSEYNÎ

“Bo Kawayê Nemir, ger tu mirî, dê ev şînîname, piştî mirina min, bi ser darbesta te de bibare!”

Em li wir, li ser devê şûr; şûrên xerîbistanê, di ferhenga tozê de, du peyvên windayî, du êlên bê serî, du şevên bê star bûn. Em li ser keviyên kavîlên ji kevirên reş ên Bazîdê, hem sermest û hem jî birîndar direqisîn. Dengê hesinê te, çakûçê nemiriya kewan, ji dengê tozê û ji dudiliya ahengan û ji lêgerîna nebûnê direviya! Min dilê xwe, wekî ku kevir be, di nav destê te de, bi mebesta ku tu êşa min ji bîr bikî, ji bîr dikir. Û min jî te re bi zimanê şevistanê digot “de li rojê binêre ku çawa sirûdên mirina me, evdalên doza me, xweşmêrên feleka me û siwarên hespên kihêl ên berbanga me, dinoşîne!”

Li Bazîdê, li ser eniya şikestî ya azadiya serhişk, min dest bi mirina kulîlkên te dikir û te jî dest bi dêrana xweliya laşê min dikir!

Yê ku ji berbangê ber bi agirê te ve dihat ez bûm!

Xwîna ku ji tîpan diherikî, nalîna ku ji axê dixeyidî, dengvedana ku bi çiyê diket jî dengvedana kolanên laşê min û spîndarên laşê te bû!

Me li hev dinihêrî, em gulava bûneweran û şehîdên xewna xwe bûn. Em ji mêj ve di rojçebûn û di newalên xatirxwestinên xwe de wer bûbûn.

Vê sibehê, em li Amedê ne, em bi hev re biryarê didin ku em rihên xwe bi ser mirina pêxemberan de kur bikin.

Xwîna min bi ser kevirên sûrê de dipijiqe û ava peyvên te jî kevirên Deriyê Çiyê ji bîranînên Pîranê dişo!

Ez dibêjim xwîn tu jî dibêjî rondik.

Ez dibêjim sînoren şengebiyê û tu jî

dibêjî diroka serjêkirina Serhedan bidin min!

Ez ji te re dibêjim de em ber bi Agiriyê ve dagerin, tu dibêjî na ez naxwazim darbesta dapîrê xwe di şînahiya ava çeman de bibînim.

Ez ji te re dibêjim ev çiya neviyên Xwedê ne û tu jî dibêjî na na, birînen xewnê û herikîna rewan a çavkaniyên bîra Şêx Mehmûd in!

Lê dîsa jî em li wir bûn.

Em li Qesra Îshaq Paşayê ji tava heyvê, di sîbera bîranînan de bi hev re dimirin û demsalên westiyayî jî li pey me dimirin û nema rojçebûnên gulvedanan dihatin bîra wan.

Ehmedê Xanî li aliyekî me govenda peyvê digerland û heftbelayê hişê me di xwêdanê de dixeniqî. Êrîşkaran jinên me direvandî, av ji avîtiya xwe direviya.

Xwîn ji xwîniya xwe didexisî.

Sira bayê, ji Agiriyê dihat û rûyê Xanî yê nûranî didiqdîqand.

Xanî ji me re digot: de vê bobelatê dûrî min bixînin!

Piştî mirina me, baran dihat, dibariya, balinde dihatin û dilên me ji xwe re dibirin, deyndarên me jî dihatin û zarokên me dil dikirin, şengebiyên me ji desthilanîn diketin û kewên me jî firîna xwe ji bîr dikirin.

Em ji goristanan wekî ku em goristan bin, derdiketin, em li xeyala xwe, li zaroktiya xwe, li şikeftên hişê xwe, li xwîngermiya ciwaniya xwe û li perav û tenhatiya gernameya xwe dipirsîn.

De dest ji girî berde

Digel ku bêçav im jî, were di çavên min de goristana xwe ya delal bikole!

Serkîsof*

Arjen ARÎ

Di riya ku çar salan, her sihar tê re diçûm û her êvar tê re dihatim, siharekê, sihara rojeke têrbîşirîn li xwe warqilîm ku sed gavekî dûrî rê, li naverasteke nîvxewle, çar xaniyên bi hişkeberê ava, mezrayek heye.

Wê kêliyê dîmenê ku bi ber awira min ketibû, mîna kelemekî di çavên min re bûbû û kiribû ku vê pîrsê ji xwe bikim: Di çar salan de çi kiribû ku heyîna van çar xaniyên nîvkavil ji ber çavên te bireve?

Vê pîrsa min ji xwe kirî, heta dawîya rê, mêjiyê min di nava gerîneka bersivan de tevizizandibû û vê lêgerînê kiribû ku serê min bibe petîxekî dewibî!

Soxî, min ji xwe re got, “her rêwîti koratî ye hebekî”!

Ne koratî bûya di çar salan de min ê çawa neditibûya, her çar malên ji hişkeberê lêkirî, di ber û li rex hev ristik?

Koratî ma ne xitimîna bîrê ye jî pir an jî hindik?

Ji wê rojê de, her gava ku risteke helbestekê dikêmin rê û li serê dibim rêwî; gopale koratîyê datînim rexekî, hemû paceyên girtî yên hest û dilînan vedikim û paşê fersê ser devê bîrê didim aliyekî.

Lê bîr, di geliyê bîranînên kêlikî de gelek caran meriv sernişûvî têwerbûnên din dike. Ev sernişûvbûn ne noqbûna binê bîrê ye pîrî caran; li yek tûşê di ber bîrê re bihûrîne!

Di bîrê bibihurin jî; bîr, bîra wê kêlikê sernixumandî; wekî çavpêketina min û pê re dîtina xaniyên ji hişkeberê, serban ax, bi derî û pace, bi şîrînek û sifirne; ristên helbesteke bîrkol di rêwitiyeke di nava erdnîgarîya helbestê de dikare bîra jibîrbûyî bike ku bikeve bîra me.

Helbest bîr e jixwe! Bîreke li gel hest û dilînen ji me dûrketî, hîzr û têramîn û tehmijî-nên jibîrbûyî jî bixe bîra me.

Ku ne ji bîrê be, mirov bi xwe jî cendekekî xwîn jê kişiyayî, termekî sik î sar e.

Bîr, me ji herikîna jiyana xafil, dijîne û

vedijîne.

Û em bi saya bîrê, bi saya bîra ku me dixê hêlekana zemên û me doş dike, di nava bîrên rabirdû û dahatû û kêlikî de de diçin û tên. Bo mînakê bîritiya helbestê, Kawa Nemir bi helbestên xwe yên li ber dest geh me di bîrên dûhî wer dike û noqî bîrên binî-dem dike, geh jî bîrkêlikên jibîrbûyî dixê bîra me ya îro.

Helbesta bi navê “Serkîsof” - *ku yek ji wan helbestên ku ez jê hez dikim e* - mînakê herî sereke ye.

li deştên dipdirêj hespên çargavî
difnên wan hilma tivingên kurmancî
qerpûzên vala, bêhnefişk misk û emberî
ji kîjan çaxê dibezin, dibezine kîjan das-tanê

Derwêş lê hiştin, bi xwînê şûştin herasa meydanê

li deştên dipdirêj dîroka çargavî
li nava du tiliyên min cixareya biharê
dikişînim, wezê nemirim, sozên min hene hê

yek, çiya dikevin bextê min
yek jî, katjimêraSerkîsof a kalikê min
dest hişkehişk li bijiyên kurîyên bayî
çawa jî şevêkê ji çiyayên Pinyanişî rabûye
hogiro, lo zar û zimanê mino
di bêrika êlegê min de ye mîrata te hê
neviyên te welatekî qerisî li serên xetan
serma dîkin, min hembêz bikin kuliyên
berfa zarokatîyê

zivistanîm çîrokên min di binê berfê de
çil sal e dizivire, dizivire Serkîsof

Serkîsofa mîna ku siwarek rişmê hespê
ragire û bixwaze bisekinîne; bi zeman re ser-cotik dibeze ha dibeze.

Bi vê bezîne re Kawa bi “Serkîsof”ê me di kîjan bîrê wer dike?

*Selpakfiroş, Kawa Nemir, *Weşanên Rewşen-nameyê*, 2003

Pêwîst û giranbuha

Samî HÊZIL

Ambrose Bierce di ferhenga xwe ya navdar a bi navê Ferhenga Şeytên (Devil's Dictionary) de ji bo peyva rexnegir wiha dinivîse; "Rexnegir: ew kesê ku bêhesab methê xwe dike ji ber ku kesek tune methê wî bike." Ew gotina hanê ji bilî nêzikbûneke balkêş her wiha diyariyek e ji hemû rexnegirên ku egoyên xwe di pişikên xwe de diwerimînin re.

Çaxa ku mebest rexne û rexnegirî be, xeyn ji vê diyariya tehl a Bierce, sos-retiyên din jî hene li cem me, li van deran. Yek ji wan; mafê her kesî tune ku rexne bike! Her çiqas listeya mafdarên eşkere nedaliqandî be jî, mafdar û bêmaf hev û din dinasin. Di çarçoveya vê feraseta ku di cihê xwe de çikiyayî, mafdar pêwîstiyê bi rexnekirinê nabînin û bêmaf jî rûreş in û rexneyê na, bes şermê dikin. Yekî din ji wan; yên rexne dikin ka çi kirine! Belê, hûn bibên an jî nebên, pîvan ev e. Herin 5, 6 romanên binivîsin û paşê behsa rehmetî Mehmed Uzun bikin. Hûn bin, hûn xwe şaş nekin û wekî xwediyê diwaneke helbestan a ku parsa çapbûnê dike navê Cegerxwîn piştî "lê", "bes" an jî "mixabinê" neynin. Û yekî din ji wan; me rexneya çêker divê, ne ya xirabker! Fermo, klîşeya nemir a ku tansiyona Bakunîn radikir. Xwelî li ser tiştê bi rexneyê çêdibe û mizginiya wê tiştê ku bi rexneyê xirab û wêran dibe. Di nav ri-hetiya hişmendî ya bi saya serê wan baweriyên ji xwe razî, zû bi zû nayê bira me ku dibe pîvaneke gerdûnî jî hebe. Ku dibêje mafê her mirovî/ê heye ku di her mijarê de bêtî destûr û destûrnameyê, beyî tiştê kirinê, hindî jê hat û çiqas

karî, dikare biaxive û binivîse.

Lê hin xebatên pêwîst û giranbuha jî hene ku rexneya wan hindî qîmeta wan pêwîst be jî, ji meriv nayê ku ji bilî pesindanê tiştê din bibêje. Xebatên Kawa Nemir jî hema bibêjin xwedî etiketa "pêwîst û giranbuha" ne. Haya min jê heye ku bi hemû wan gotinan atmosfera nivîsê hinek şêlû bû û konseptêke aloz derhat, de ka em ji cihekî dest pê bikin.

Ji bo nirxandina berhemên wergerandî û karê ku wergêrekî/ê kiribe hin pîvangên kifş hene. Beriya hemûyan pêbawerî tê. An ku wergêr naveroka

berhema zimanê jêder çiqas rast û durist, bêtî şîroveya şexsî û bêtî kirpandina beşekê yan jî wateyek ragihandiye zimanê armanc. Lê ev pîvaneke bi nîqaş e, di ser de jî heke behs li ser wergera wêjeyî be. Lewre wergêr du zimanan li qadekê digihîne ber pozê hev. Di vê hêlê de divê hemû arîşeyan bi awayekî afirîner – beyî ku bi xwe biafirîne- çareser bike. Vêca ziman kurdî be, mijar werger be, wergêr jî qasî Don Kîşot dilovan be, hingê şerm e ku mirov qala rastî û duristiya naverokê bike. Wergêrek ji nivîskarekî û ji berhemê nevê, wernagerîne. Bi hevoka yekem re dilsoziyek di navbera wergêr û nivîskar çêdibe. Wergêrê xayintiya nivîskar bike, bawer bikin nasitire.

Krîterek din jî têkildarî terzê wergêr e. Paul Goodman wiha behs dike; "Ji bo wergerê divê wergêr xwedî terza xwe be, heke na, hingê di wergerê de dê ritim û nûans tune be. Ew terz jî ji proseya fiki-randina hunermendî ya li ser hevokan tê û hevok çu car bi texlîdeke bêserûber nayên sazîkirin. Pirsgrêka werger jî ev e



ku xwe dispêre tenora basîd a terza wergêrekî/ê û bi awayekî afirîner wê yekê jî li terza nivîskar tîne.” Baş e, têkilbûna wergêr a nav pêvajoyê qebûl, lê, heta ku li ser kîjan esasan û bi çi awayî? Ev pirs her û her tîn nîqaşkirin. Ya rast ev e ku ev pirs ji bo her wergêrî/ê û ji bo her berhema wergerandî cuda cuda bê nîrxandin, wekî din krîtereke giştî ne erkedar e. Her wiha divê neyê jibîrkirin ku hestiyariya wergêr a kûr û motivasyona wî ya şexsî dêrî li wergera bi şîrove û kirpandî vedike. Wergêrên bi xwe jî nivîskar bin, carinan bi awayekî serbest tevdişgerin û wergereke dînamîk dikin. Li dewsa ku qîma xwe bi risteya bêjeyan û bi rêzimanê bînin, hewl didin ku fikr û raman û dilîniya di berhemê de derxin pêş.

Bi rastî hêjayî lêkolînê ye ku mirov li ser tîkiliya motivasyona şexsî ya Kawa Nemir û nivîskar û berhemên wî bijartine, bisekine. Bi nêzîkbûneke bi ser û ber mumkin e hin tiştên balkêş ên der barê wergera dînamîk, dilsoziya wergêr û nivîskar de û wekî encam jî naverokeke bi şîrove - heta ku, bi çi awayî- derkevin holê. Qesta min bi tîgeha şîroveyê ne bi awayekî şexsî watedarkirin e, berevajî wê yekê şîrove di vir de naveroka bi estetîk e. Em bifikirin, Kawa Nemir li qulçê odeya xwe li ser Soneyên Shakespeare diponije û Şakiro wî aş dike. Û li girava Sardînyayê wergêrekî/e sardîni heman Sone raxistine ser maseyê û Paganini bi kemana xwe wî carê carekê vediciniqîne. Bêguman ne motivasyona wan a şexsî ne yek e, ne jî îmajên di mejiyên wan de diqilqilin wekî hev in. Lê Shakespeare heman Shakespeare û Sone jî eynî Sone ne, bi ferqeke biçûk, çaxa ku rastî hev bînin dibe ku beriya hev nas bikin, hinekî hev û din biceribînin.

Wergêrekî/e serkeftî divê pîrsgirêka bingeîn a şewazê çareser kiribe. Çareserî jî bi lihevkarîna şeweya wergêr û nivîskar û lihevhatina estetîka xweser a berhemê û halê wê yê nû yê wergerandî çêdibe. Dawiya dawîn jî divê kêfa xwînerê zimanê armanc jî bi xebatê xweş be. Hin wergêr

bi dil û can şeweya nivîskarê xwe diparêzin, qet peyvekê jî xerc nakin, bi gotinên basîd û dîlnîzm arîşeyên vegotinê çareser dikin. Wekî encam wergereke ewle, bes ne rengîn dertê. Lê hin jî hene her çiqas şeweya nivîskar piştguh nekin jî, bêtir cûredkar in û bêjeyên wisa hît û qerase bi kar tînin ku porê mîrîv bizbîzî dibe. Encama wê terzê jî bi risk e, bes bi kêf û sebr e. Wisa xuya ye ku Kawa Nemir ji riskê hez dike; Di soneya 19’emîn de ji bo gotina “Devouring Time” gotina “Dema Dehaq” bi kar tîne. Mirov dikare ji du alîyan ve wê yekê binîrxîne.

Wergêrekî/e din dikarî bigota “Zalim Zeman”, yekî/e din dikarî gotina “Xirab Zeman” bida ber, heta gotina “Xaris Zeman” jî dibe. Ew hemû rasterast ji tekstê derdikevin. Kawa ji aliyekî din wê nêzîk dibe, gaveke pêşdetir û bi cilhet diavêje û gotina “Dema Dehaq” bi kar tîne. Dibe ku wiha fikiriye; ji bo xwînerê kurd kîjan dem ji dema Dehaq zalimtir, xirabtir û xaristir e. Dîsa di eynî Soneyê de ji bo “beauty’s pattern” gotina “rindiya Mem” bi kar anîye. Xuya ye bi heman egerê ev tişt pêk tînin. Wergêrekî/e kurd ji ber barana Shakespeare dikeve bin siwana Xanî.

Herikbarî (fluency) sêrê wergerê ye, yan ku wergereke herikbar yeke temambûyî ye. Ji bo herikbariyê jî bilî huner û pîsporiya wergêr, pêwîstî bi şert û mercên din jî hene. Wekî minak, heke mijara berhemê, bûyer û tewrên tê de, bawerî û pêşekiyên nivîskar li rewş û amadebûna zimanê armanc were, di ser de jî pîsporiya wergêr û terzê wî yê xweser li wan were, wê çaxê karekî xweşik pêk tê. Bînhêrin zimanê me ji ber hevpariya qedêrên reş ên du gelan - kurd û îrlandî- ji rêzîkên W.B.Yeats re çendî nas in. Û wergêr Kawa Nemir jî bê zehmet daregula îrlandî dixê nav gulistana welat;

‘Lo kul bi mala gotinan bikeve.’


Pearse gote Connolly,

‘Heye ku henaseyeke gotinên kone

Daregula me hişk kir;

Bi min Kawa Nemir wergêrekî xwedî şeweya xwe ye, ew şeweyê jî di berhemên wî wergerandî de xuya dibe. Şeweyeke herik-

Îlustrasyon: Şener Özmen



bar, curedkar û bi rîsk. Ev şêwe di “Mirin Niqutî Dilê Firokevanekî Îrlandî” de diçirûse, di “Pêşengno! Lo Peşengno!” de geştir dibe û di “Hemû Soneyên W. Shakespeare” de êdî cihê xwe digire.

Mirov wergerên Kawa Nemir bi deqên

zimanê jêder û yên wergerandî bide ber hev, ji hin hevokan qayîl nebe, li şûna hin peyvên ên li gor xwe çêtir bibîne, ji gun-caniya şêwazê şikdar be û rahêje pênûsê û bi rexneyeke sar mejiyê xwe hênîk bike, belê divê mirov vê yekê bike. Bes divê mirov ji bîr neke jî wergêr di heman demê de, belkî ji her tiştî bêtir, navbeykar ne. Lewre dema wergêrekî/e kurd bixwaze Shakespeare bi xatirê Xaniyê zimanşîrîn bi kurdan bide hezkirin jî ev wisa ye. Û dema banga demokrasiyê ya Whalt Whitman, rûspiyê emerikî, li guhê banga sibê ya welatê me dikeve, navbeynkar dîsa wergêr e;

“ez ê bajarên mil di stûyên hevûdin re birî ava bikim,
bi evîna hevriyan,
bi evîna mêrane ya hevriyan,
ev ji bo te ne ji min, Lêlê Demokrasiyê.”

Ma heq e ku mirov ji Kawa re bibêje te çawa bi lez û bê mezro û bê pîvek Shakespeare wergerand? Bizanin dor hatiye James Joyce û Oscar Wilde û camêr li benda wî ne. West e ku Kawa bi xwêdana xwe ya şor toza li ser “Portreya Dorian Gray” ramûse, Ulyssesa Joyce a çîrdirêj 24 saetan jî bi kurmançî bide axaftin.

Lê dîsa jî heyf û xebînet ji Kawa Nemir re! Çima nizane werger emrê meriv kurt dike, hinde dilezîne.



Li Babîlê pêlewanek: Wergêr Kawa Nemir

Yunus EROGLU

Di salên xwe yên zanîngehê ku xem û hizra min zimanekî bi tenê yê ji bo teva cîhanê bû de, ez cara yekemîn leqayî navê wî hatim. Hingê di nav kêşa hebûn, xuyabûn, têgihîştinê de, tez û argumanên feylosofên ku ev gelş dianîn li ser mexdera zimên didan rûniştandin, sêwra min a der barê cîhana di hundirê zimanan de tûj dikir. Min guman dikir ku zimanekî ku bi riyên xweristî pêkhatî, yê ku di heman demê de behreya xwe ji *parametre* û *prensîbên* hemû zimanan wergirti, dê jiyana me û têkiliyên me yên bi heqîqetê re biguherîne û *meseleyê* saf û zelal bike. Belê, piştî ku darek hebû li pêşberî min, çi pêdivî hebû bi hezaran peyvên cuda yên li seranserê cîhanê. Ziman çiqas belav û cuda bûna, şolîbûn, leqî, xwarî, fehmkorî û nerastiyên ku di nav wan zimanan de dibûn rêçik û kite bi kite em ji esasê, reseniyê vediqetandin, berdidan. Ev e, îdealistîya xortaniya min hespê xwe ber bi helwestine wiha destêwer û mudaxelekar de dibezand. Wisa wisa, bi pêlikên barûya Babîlê ve hildikişiyam. Bê hay.

Û zimanê kurdî. Di berikan de xareke sindoqî. Stareke tenê û sobe di mendereya wê barûya bilind de. Qîza ku em çawa bi xwe hesiyan, me gişan xwest em mêraniya xwe li bakîretîya wê bicehdînin. Tenê di vê şikefta Babîlê ya xewle û tarî de delîveya welidîna zarokekî, berekî dixuya. Pêkan bû ku zimanekî tenê ku bibe yê her kesî çenebe, lê pêkan bû ku zimanekî ku tenê bibe yê *min* çêbibe. Di pêlikên Babîlê de Xwedê tenêti da nivîsevanên kurdî û belkî her kurdî nûs bi vê hestê hewl dide zimanê kurdî ji nav parantezê derxe. Lewma, belkî ne zimanek, lê zimanê *yekî*.

Wê demê, di bergên pirtûkan, di nav rûpelên kovar û rojnameyên kurdî de bi vî şiklî rastî vî navî hatim: *wergêr* Kawa Nemir. Bi hêrs û azweriyeke mezin ji behra zimanekî wek oqyanûsê av dikişand ji bûka rû bixêlî, kurmanciyê re. Nexwe “dara” ku Yeats,

Plath, Hughes, Hulme, Whitman, Wilde, Tennyson, Dickinson, Eliot û Pound didît, dara heman zimanî, heman heqîqetê bû û ev yek jî di barûya Babîlê de, di dalaneke ku Xwedê ji bir kiribû ecaca tenêtiyê bi ser de bike de, bala dibû: Di kozika wergêran de.

Ez dizanim ku *helbestkar* Kawa Nemir bi reng û ruhekî hunermendî karê wergerê dike. Ziman ne tenê weke navgîna ragihandinê, lê weke berhemeke hunerî didêre. Ez wisa hest pê dikim ku ew dildar û hijmetkarê nivîsar û kişifkirina riyên nepen ên di rêç û dalanên navbera zimanan de ye, her çiqas di hevpeyvîneke xwe de gotibû ew vî karî bi *profesyonelî* dike jî. Lewre ancax dilekî bi *amarê* (hezkirinê), davê û bi *amatorî* xwe bidîyê, dikare ji vê renc û cefayê neinitîne, vê kêşeyê bike daw û doza xwe. Çi ku ev ne tenê şuxla qulibandin û raguhezîtinê ye. Şuxlekî berzbûnê ye, sermestîyeke helbestkarî ye di cama cem de. Yên ku bixwazin li ber kavilê Babîlê ciyê xwe li ser paldanka teqawidiyê xweş bikin ancax wek *profesyon* (pişe) nêzîkiyê lê bikin û tevbigerin. Ancax ên amator in ku nikarin kar û qezenca xwe ya ji vê barkêşiyê çi ye, çawa pênase dibe, wergerînin. Ev e, tişt a ku wergêr Kawa Nemir wernegerîne û tu carî pê teqawid nebe.

Em werin ser wergerên ku kirine û hê dike. Di vî warî de belkî gotinek bes be: Îro li zanîngehan ji bo xwendekarên beşa ziman û wêjeya îngilîzî *Antolojiya Nortonê* çi be, di wergera îngilîzî û kurmancî de ciyê Kawa Nemir ew e. Giraniya wergerên wî ji îngilîzî bin jî, tibabek wergerên kurmancî û tirkî jî kirine. Weke helbestkarê di rêzeyeke fireh û dirêj de wergerên helbestî kirine û wergerên wî yên neçapkirî, mixabin, ji yên çapbûyî gelek zêdetir in. Em ê di nav salan re ferqa ku yekî helbestê dijî û dinivîse û wergerê dike bibînin. Li Babîlê helbestkarên mezin her tim ji romanûsên mezin, mezintir in.



Lê gelo çima werger? Kawa Nemir bi helbestkariya xwe tenê bimaya, dem û derfetên ku ji bo wergerê terxan dike, arasteyî karê xwe yê helbestî tenê bikira nedibû gelo? Ez ê li vir balê bibim ser ramaneke xwe: Kawa Nemir ne yekî girî û zarîna xêşimî, bakîretî, neamadeyî û nekamiliya zimanê hunera xwe dike ye, ew têkiliya herî henûn a bi zimên re, bi riya cebirandina birînên wê, şayikirina girûziyên wê, xurtkirina kêmasiyên wê û sererastkirina bêkeysbûnên wê datîne. Malûm e ku galegala “afirandina zimanekî ji nû ve” gelek kedkarên vî zimanî bêzar kir. Bes, divê mirov nemukemelî û têrnekirina zimên jî qebûl bike. A soxî, pertewên zimanekî din jî carinan quncine tarî yên di pergal û vegotina zimanê mirov de ronî dikin û dihêlin ku riyeke xitimî li ber me vebe. Ez vêya tenê ji bo xurtkirina awayên vegotina me nabêjim, her wiha îro gelek şeweyên ku pal û bergeha wan di mantiqa me de hazir in lê ciyê wan bi awayekî vala mane hene di zimanê me de. Ne hewce ye ku mirov her tiştê ku ji zimanekî din zabe yan tê de cî girtibe, weke mantiqa wî zimanî bihesibîne. Yên di nav karê wergerê de, guman dikim ku, xweştir dibînin carina hin biwêj û gotin di zimanên bi-

yanî de derbas dibin, dema mirov çav li wan dikeve, tavilê wan *ji malê* dihesibîne, her çiqas ew awa di zimanê me de tune be yan wînda bûbe jî. Hewce nake îro tiştê ku di hêle em ji zimanekî bo yê din wergerekê durist bikin, ker ker bikin û her keriyekî bi “mantiqeke nerast” bi nav bikin. Wek nimûne, ez bi xwe di pirtûkeke îngilîzî ku a niha dixwînim de pêrgî gelek awa, gotin û biwêjan tîm ku bi heman awayî di tirkî de jî hene. Û bi gumana min gelekên ji vana bi riya wergerê ketine tirkî. Lê îro tu yekî tirkî ku bi îngilîzî nizane gava vana di zimanê wî de tîm gotin nabehite, ango tu xerîbiyê nabîne, weke ku *li mala xwe be*, weke *awayê xwe* dizane. Taliya talî, di gerdûna zimanan de, ji aliyê binesazî (*underlying structure*) û nîşandêriyê (*significacion*) vê ihtîmalên bê ser û ber nîn in. Hin rêgez hene û hemû curbicurbûn di çarçoveya van rêgezan de pêk tê. Werger jî derfeta ku em riya pêjndarî, mantiq û bergeha zimanê xwe qewîn bikin dide me. Di cîhanê de ezmûneke wergerê tune ye ku bi riya wê tiştên ku berê di wî zimanî de nehatiye gotin, piştî wê neketibê û nehatibe gotin. Zimanê ku îro em, do diya me û bavê me, pêr kal û pîrên me dia-

xivîn jî tê de. Hewce nake em keviran biavê-jin kaniya ku zimanê me avê jê vexwe.

Ez dizanim ku yên ji vê hestiyariyê dûr, bi rexneyên bêpûte yên weke “zimanê çê-kirî”, “zimanê giran”, “wergera nayê fehmkirin” û hwd dadiweşînin helwesta Kawa ya firehkirina bergeha zimên bi riya wergerê. Îro ku bi riya vê wergerê li gorî pêkanî û gengaziyên zimên, gavek bi pêş de were avêtin, ew ji bo kê biçûk be jî, ji bo pêşeroja vî zimanî gaveke mezin e. Bêguman, tu werger ne wergera dawîn û *nîhaî* ye, tu werger ne wergera herî serketî û berketî ye. Lê her ez-mûnek bi serê xwe serketinek e. Di vî warî de, bo nimûne, ez helwesta Kawa ya li hem-ber van wergerên ku li tu dera wan nehatiye nivîsandin ku ji kîjan zimanî hatiye wergerandin ji hinekî daxbar dibînim. Rast e gelek wergerên ji zimanê yekemîn/resent nehatine kirin hene. Bi ihtîmaleke mezin şiyana vana ya ku tekstê bi awayekî ji wî zimanê orijînal bidin kontrolkirin jî nebûye. Dibe ku metna ku ew digihînin ber destê me jî ya bera pir cuda be jî. Bes, vêya ancax dema ku wergera wê ya resen derket, mirov

karibe bibêje kîjan werger serketîtir e. Îro ne tiştêkî dûr e ku wergera çîrokên *Hezar û Şêvekê* ya ji zimanê tirkî hatiye kirin ji ya zimanê frensî yan erebî serketîtir derê. Îro roj di literatûra cihanê de berhemîn hene ku hema çî bigire kesî ku bişê wan di hal û zarê wan î resen de bixwîne nîn in. Yanî, bi ya min, hewce nake mirov helwesteke yan ji binî ve redkirinê yan ji binî ve pesendkirinê bigire, li hemberî van hewldanan. Çinku ez ne bawer im ku derfetên wergerandina ji zimanê yekemîn hebe û bûbe û tevî vê di ser de yekî/ê rabûbe weke fanteziyekê îcar wergera di ser zimanekî din ê dûr re kiribe.

Vêca nanûavkirina zimanê wergerê jî heye. Tiştê ez dibînim van salên dawiyê, hêdî hêdî derketin û kişîfbûna mîrata wê-jeya kurdên kaskasyayê heyecaneke mezin dide Kawa Nemir jî. Di werger û nivîsên wî de kartêkerî û sûdwerigirtina gotin û vegotinên ji van tekstan tê dîtin. Ji bo ro bi ro wergereke tekûztir û mikemeltir bi dest bixe, karê xwe yê şopandina wêjeya kurdî yê kûr û hûrbijêr di hemû şaxan re didomîne. Ew qas wêrek e ku soneyên Shakespeare bi dur û mircanên Xanî, Mela, Feqî û Cegerxwîn jî birêse. Her çiqas ez di wergerê de aligirê parastina çand û *context* (peywend) a wê ya resen bim jî, Kawa Nemir bi wêrekî û curetkarî şûrê xwe li meydana zimên û wêjeyê di-çikîne û xwe ji dergistikirina her du terefên babeta wergerê nade alî. Û weke hewldarekî ku çav li herçî kaxiza ku bi bêjeyeke kurdî belekbûyî bigerîne, bi dilhêsayî nav û şanena-xwe li bin karê xwe dixê.

Kawa Nemir vêga yek ji çalakîrîn endamên tevgerê ku ez jî weke Lal Laleş yek ji sê piyên qehîmkirina vî zimanî û vê çandê dibînim û pê xuroş dibim de, ye. Ew jî wergerandina berhemên sereke yên ji wêjeya cihanê ye. Li gel her du piyên din ên ku yek ji wan derxistina *klasîka* kurdî, çand û keleşorê; û yê din jî weşandina berhemên nûjen e, di amadekirina vê rêza ku min jî heta niha çar pirtûkên wergerî, du ji îngilîzî û du ji spanyolî amade kirine, ked û xebata wî bê rawest e. Helbesta wî û helwesta wî ji bo me şansek e.

Êdî ku wî bivê, Xwedê bila Babîlê walgerîne.



Îlustrasyon: Şener Özmen

Li ser sînorên rengîn siyek

Îsmail YILDIZ

Li gorî Hyppolite Taine, ku ji wan nivîskaran e, yên ku cara ewil der barê felsefeya hunerê de raman afirandine, bûyerên xwezayî û bûyerên hunerî dişibîne hev e. Ango ne bûyereke xwezayî, ne jî bûyereke hunerî heye, ku di makbûna wê de têkiliya sedemtiyê tune be. Taine bi vê jî nayê ser, bi dîtina wî, ji bo her nivîskar an jî afirînerî/ê, tevî veguhezîna siyasî û çandî, bandora roj, baran, xweza, av û hewayê jî bi têra xwe heye. Bêguman ji bo deqeke wêjeyî, bi taybetî jî ji bo deqên ku li ser rewş û bûyerê tîne honandin, cî an jî erdnîgara kesê afirîner ciyekî taybet û girîng digire. Ji ber ku her bûyer an jî honandin li ciyekî diqewime, ew cî bêguman taybetiyên wê derê jî di hembêza aheng û rengîniya xwe de diheve. Bi vê rastiyê jî, bandora erdnîgarî û xwezayê li kesê ku dihone digîhîje asteke ku çênabe bê paşguhkirin. Di vê çarçoveyê de, bandoreke din jî, helbet civak û civaknasî ye. Ji ber ku mijara wêjeyê mirov an jî civak e, pêlîngeke afirîneriyê jî şiklê jiyana civakê ye, ku nivîskar pê re diji yan jî xeyal dike. Wekî berhemên ku jî aliyê nivîskarên ku li welat an jî xakên nermeyam û av û hewayeke nerm dijîn ve bi ziman û honandina xwe ya naîf tê pê, van mîhengên di naveroka xwe de bi cî dikin, di berhemên nivîskarên ku li welatên çolter, hişkhewa yan jî sar dijîn de jî, dîsa taybetiyên bi wan awayan xwe didin hisandin. Ango çawa ku li welatên bakur ên bêtav, bi baran û mij û moran pêşî li hunereke melankolîk vebûye, eyamê nerm, bertav û zelal jî, li welatên başûr rê li wêje û hunereke tîjî coş û hêvî vekirîye. Her wiha ew şîrove, di warê felsefeyê de jî jî aliyê Nietzsche ve, di pirtûka wî ya bi navê *Ecce Homoyê* de tê selimandin. Bi raya Nietzsche, hewayaya hişk a Parîs, Provence, Qudîs û Atînayê dihele ku metabolîzmaya mirov bayê bigire û li ser berhemên jî bandoreke wisa dike. Dîsa, bo

nimûne, mirov dikare listika şanoyê ya Bertolt Brecht a bi navê *Dayîka Wêrîn û Zarokên Wê* bi bîr bîne, ya ku rewşa siyasî, bi taybetî jî herikîna şer di her replîkê de bi cî ye, yan jî listikên Shakespeare, *Hamlet*, *Macbeth* û çend listikên wî yên din, ku hemû taybetiyên civaka hevçax li nava xwe direşîne. Ji ber ku mijar têkiliya di navbera afirînerî û erdnîgarê de ye, pêwîst bû pêşî bi kurtî ew yek bi çend nimûneyan bihata zelalkirin.

Em bîr ser wêje û hunera kurdan û têkiliya wan bi civak, xweza û serdema xwe re. Ji bo ku pêwîstî bi hinekî din taybetkirina sernivîsê heye, em dikarin bibêjin, têkiliya erdnîgariyê û afirîneriya Kawa Nemir. Her çî qasî zehmetiya mijareke wiha kûr û watedar ne barek e, ku ez bi karibim rakim jî, heke mijar Kawa Nemir be, ji ber ku ev demek e me hin rê û cîgeh peyda kirine û em li ser bingeha dan û stendina wêjeyî êdî nêzenasên hev in, an jî em di heman serdemê de ne, belkî jî mafê min be çend gotin bi min re derkevin.

Beriya ku mirov qala wêjeya kurdan bike, hewce ye mirov vê bi du beşan bi nav bike. Wêjeya kurdan a nûjen û ya klasîk. Her çiqas her du beşan jî xwe negihandibin temenê xwe yê tîr û tîjî jî, di çarçoveya wêjeya cîhanê de tu lê dinîhêrî, hewce ye ew zelal bibe. Li vê qadê, wekî tîbînî, mirov dikare bibêje ku wekî mînak Kawa Nemir xwediyê şanseki girîng e. Ji ber ku Nemir li herêma ku yek jî girîngtirîn qonaxên dîrokî yên wêjeya kurdan tê hesibandin de peyda bûye, di sedsala 20'êmin de, gelek berhem lê hatine afirandin û hîmên mezin lê hatine danîn, ji dayîk bûye. Ango, li Îdira Serheda rengîn, li Îdira li ber serê Çiyayên Elegezê û Girîdaxa ji Xwedê bilindtir, li perê Çemê Erezê, yek ji dergêhên Kavkazan û parzemîna Asyayê, warê bi dehan gelên ji hev cuda, xwezaya bi dehan çandan û şeweyiyanan e. Û helbet cî û

warê afirînerên kurdan ên wekî Erebe Şemo, ku romana kurdan a pêşîn *Şivanê Kurmanca* nivîsiye, Heciyê Cindî, Qanatê Kurdo, Ûsivê Beko, Tosinê Reşîd, Fêrikê Ûsiv, Eliyê Ebdirehman an jî Wezîrê Eşo... Gava ku mirov li berhemên van nivîskarên navborî binihêre, bi naverok û mijaran ve, bi pêşqebûlî, têkiliya erdnîgariyê û afirîneriyê bi awayekî berfireh tê piştrastkirin. Wekî ku Heciyê Cindî di seranserê romana xwe ya navdar a bi navê *Hewariyê* de, ji henasegirtinê heta rabûn û rûniştina civakê, ji şeweyên çiyayan heta newalan û riyên kesertijî, bi hemû hostetiya xwe dirêse. Ku em xwe bispêrin van nimûneyan, em ê bi rastî jî bibînin ku têkiliya erdnîgariyê û berheman di wêjeya kurdan de xwedî ciyekî hê firehtir e. Dîsa di berhemên nivîskarên serdema niha yên serhedî de jî, heman taybetî, hem di warê zimên de, hem jî di honandina qarakter û mijaran de, xwe bi ber çavan dixe.

Her çiqas Kawa Nemir hê di warê romanîsiyê de ranehiştibe pênuşê jî, hem di berhemên wî yên poetîk de, hem jî di jiyana wî ya rojane û nêzîktêdayîna wî ya li wergerê de, heman mîheng xwe hema davêjin qeraxa jiyana wî. Bi piraniya helbestên wî re û di jiyana wî ya rojane de, ew aheng û têkiliya bi erdnîgariyê re têra xwe heye. Belkî di helbestên wî de veguhezîna civakê bi awayekî jandar û takekesî firehtir cî digire, lê têkiliya bi erdnîgariyê re, li gorî nivîskarên ku li jorê navên wan hatin hildan, dûrtir û teniktir e. Bêguman serdema vê yekê jî ew e, ku Kawa Nemir zêdeyî 20 salan e bi wêje û hunera îngilîz, amerîkan û îrlândî re radibe û radizê. Bi taybetî jî di helbestên Nemir de bandora risteyên Shakespeare û W. B. Yeats ne tişteki veşartî ye. Dîsa jî, gava ku mirov bêyî dîtina navê wî helbestên wî dixwîne, ji ber bikaranîna wî ya hinek navên çiya, deşt, kuçe, kesan û heta rîyan, an jî cîdayîna rengîniya herêma ku maka wî ye, xaka jîdayîkbûna wî xwe dide der. Li aliyekî jî, eynî wekî gotina Nietzsche, di honakên Nemir de, şînî û nermiya eyamê Serhedê tevî psikolojiya bajarên rojava ya hinekî depresîf jî dibe. Ev xal di berhema wî ya duyem a bi navê *Bîşenga Deşta Dûr* de jî, ji

her du berhemên wî yên din, *Selpakfiroş* û *Salnameyê*, zêdetir bandorê dike. Her ku diçe, di berhemên wî de tehma herêm û xwezaya ku lê ji dayik bûye, bi şeweyekî hê hostetir xwe digihîne jiyana hevçax a cihanê, Tirkîyeyê û Kurdistanê. Lê tespîten me çî dibin bila bibin, di *Selpakfiroş*, *Bîşenga Deşta Dûr* û *Salnameyê* de, di her sê diwanên wî de, xala hevbeş ev e, ku Nemir wekî neviyê Ehmedê Xanî pirên dirêj di navbera bûyer, mijar, cîgeh û deman de ava dike. Helbet psikolojiya takekesî jî, rewşa nîrxandina jîyan û cihanê jî, wekî her kesî, di berhemên Nemir de jî heye. Her wiha melankolî û hinekî tehma depresîf û epîk jî di risteyên wî de mêvan in, lê ferqeke wê yekê ji ya gelek nivîskar û helbestkarên kurd heye, yên ku bi tenê êşe û psikolojiya xerab a siyasî bi kar tînin.

Ji ber ku Nemir -her çiqas piraniya wan hê jî nehatibin çapkirin jî- ji wêjeya cihanê gelek berhem wergerandiye kurdî. *Hemû Soneyên William Shakespeare* di dîrokê de yekem car ji aliyê wî ve bo kurmançî hat wergerandin û çapkirin. Divê hinekî jî li ser vê rewşê bê sekinandin. Nemir di temenê xwe yê ciwan de, êdî bê şik û guman e, bi vê rastiya xwe ve hîmek daniye û ji bo pêşeroja wêjeya me ya neteweyî karekî pîroz bi cî aniye. Tevî gelek rexneyên cuda û bi psikolojiyê hestiyar, ku li zimanê wî bê sînor tene girtin, helwesta wî ya ku ji zimên tawîzê nade ji tişteki pîroz e. Dibe ku ne niha, lê piştî demeke ne dûr û dirêj, qîmeta wî û qîmeta karên ku wî ji bo wêjeya kurdan kiriye bêguman wê bê zanîn. Hema wergerandin û çapkirin li aliyekî, bi tenê xwendina şexsiyetên wekî Shakespeare, Yeats, Ezra Pound, Whitman û Eliot di nava kurdan de çiqas bi pêş ketiye, ev yek li holê ye. Di vê çarçoveyê de, ji ber ku ez pir caran dibim şahidê jiyana wî ya rojane, ez dikarim mizgîniyê bidim ku Kawa Nemir, ango siyeke ku li ser sînorên rengîn, li Serhedê ajlo daye, xwediyê disîplin û kar û hêzeke taybet, dê ji bo wêjeya kurdan gelek gavên mezintir biavêje. Di serî de helbest û werger, lê di romanûsî û çîroknûsiyê de jî, hêviya taybetiyeke mezin dikarim bibêjim ku di rehên Kawa Nemir de bi rê ketiye.

Nameyeke mişt bêrîkirin li dû Pilingo*

Sedêyê SEHERNAZÊ

*Bihata Melek lek bi lek,
Dê birjiya zincîra serbest
Kawa Nemir*

Hat! Pilingê min î bedew û bi rik. Hat û daqulî ser etleza singê me yê kevgirtî bû. Hat û veçirand qefesa singê me bi neynûkên xwe yên jakaw. Û qelaşt qefesa singê me û jê derxist dilê me, bi vî aliyî wî aliyî ve bir û anî û kirp sekinî, got: Ev dil, ev dilên we yên almastî divê çerx bibin li dora gora Xanî.

Hat! Pilingê min, westiyayî... Ji deverên dûr û dirêj hatibû, daristanên biyanî, li rûyê wî bêhna erxewanî. Hat! Bêrî kiribû deşta Îdirê, bişengê, dargerînkên şaneşîndagirkirî.

Û hat av da Dara Sylviayê ya li ser dilê me bûbû kêran, li ber derbên kêran, bişkivî dara me bû qelemeyekî serî li ezmanan çikiyayî.

Pilingo hat û dûredest kir ew bajarê ji ber derbên çilkên tozê dikir zarezar. Hişyar kir Selpakfiroşê li ser peyarêyan di xew re çûyî, cixare kişand ji dinên bajêr re. Sohbet kir bi tinerçiyê serî hejriyayî re. Divê wiha nebûya bajarê Xanî Baba, divê sîkakên wî zêr û zîvîn bûna, divê kavilbûn keserek û qederek nebûya.

Pilingo hat! Û em siwarê hespên helbesta wî ya kihêl bûn. Me bi çargavî ajot hespên xwe bi şevan û li bestan. Û xuricîn kolanan, olan da dengê singê hespên me yê

reş ê beş.

Û me zanibû ev xewn, xewneke derewîn e, dê ew qas dirêj nedome. Me divê, em bi rastiyan re mijûl bin. Xewn ne karê me ye!

Û tu çûyî, xikîxalî sikakên Xanî.

Tu çûyî, bajar belewela.

Tu çûyî, me xitim kir *Pênc Kilam Li Ser Şeva B'ye*.

Tu çûyî, em dişa çerx bûn li dor zîgurata Xanî. Tu çûyî me Xanî xelet xitim kir. Tu çûyî, me dişa dest bi başkûriyên xwe yên berevajî kir.

De tu çûyî; pê kuta ser me, demsal payîz e, zîz e û li şûna te ba dilîze. Belgên spîndaran lib lib, giran giran dawêşyan û em ponijîn li qeraxa Murada bêmiraz. Tava payîza tînşikestî alast rûyê me yê qurmiçî, a ro bi ro, bi ro de çûyî di rûbarê zemên de.

Wa ye dageriyan zozanî ji zozanên esmanî; Sînek, Delavên Derencekan, Erez, Gola Masiyan... Gişt, gişt daketin bestan û xikîxalî ma zomên zerîn, avên qerqêşûn, golên şipîşîn. Û tenê ma dûvpişk, ji kerban bi mişkê veda. Mar, xwe li kirasê xwe aland û xuricî qula waweylê. Revî roviyê sor, xwe da fêza zomê û îskeşk pê ket.

Û hatin hespên esmanî, hatin bi çargavî, difirin. Kuro

lawo birevin, xwe bidin alî, rêyên hespên kumêt asê nekin, ji deverên dûr û dirêj hatine, tî bûne, westiyane, bêhnfişkî bûne, divê bi lez biçin ser ava Mûradê.

Hatin! Hespên boz hatin. Xwe di tozê wer kirin, gevizîn di nav qûmên agirîn de. Berdin! Berdin, rê li ber hespan vekin; bila



bikin hirinî, biherikin, bifirin di nav singên mêrgên esmanî de. Ku hûn bernedin, ew ê ji kerban biteqin.

Û hatin hespên me, helbestvanê min! Asê bûn li mêrgên şilek, rastî lilavan hatin, lal bûn, ker bûn, kor bûn çavên wan ên kesk, şîn û genimî. Çûn! Çûn û cûm bûn, di lilavan de wer bûn. Çavên wan jorî çiyayên asê bûn û bêriya belekiyan kiribûn. Bestan şehitandin hespên me, helbestvanê min! Bi lilavan xapiyan, mirin hespên me.

Belê Pilingo, va te êlata Îdirê jî hat, semerên pezên qerqêşûn qetqeti bûye, diçêre û diçe. Ma li dû êlatê miha belek û kulek. Me çav lê ye em bidizin, bidizin û tev li pezê xwe bikin.

Wa ye dîsa wextê benderan e, jin genimê sor didin ber bê, li ser serê me dicivin qîjik, qîj qîj. Parsek hatin, tûrikê wan li pişt wan, di devên wan de diayên jiberkirî. Divê tu zikatê bidî, ji destên wan xelasbûn nîn e. Navên wan ên di bîra dîroka me de ev in: Feqiyê Pêçîgopal, Siltana Cinî, Sedoyê Diranketî û Gulîzera lehenga zaroktiya Bavê Siyabend. Bazinên zîv ên zendên wê yên qerçûmekgirtî wînda bûne û dîsa êrîşî dikanan kir, dîsa dide xeberan “Ez ê diya we bigêm, ka pereyan bidin min. Bazinên min wînda bûne, ez ê ji xwe re bazinan bikirim.” Û kalikê min feyz girt ji helbestvên û got: “Bidin! kurê min bidin, guneh in, zikat zikata Xwedê ye, feqîr jî feqîrê Xwedê ne.” Vebû devê çewalê wan, vala bû kodek genimê zer î sor.

Koça qewmê lanetî didome, koça kokqelandî, qedandî.

Pilingo! Min bêriya te kiriye, kurmê te tê min.

Belê dîsa bar dîkin mal, diçin. Duh mala Mikoyê Mûsa, pêr mala Mihemedê Ûsiv, îro jî mala Mecîdê Heseno. Diçin, diçin ber bi otogaran, otobanan, metropolên jehrpêketî. Kavil bû aşê Seboyê Ecem jî, bi ser de miçiqî şîpa ku di zaroktiyê de serê me yê di gerînekên wê de gēj bûyî. Bê av ma, miçiqî, nazivîre berazê eş, kirp sekinî. Nema kodek genim û çirnikê ceh ku em bihêrin.

Pilingo! Xikîxalî man sikakên Xanî. Û min bêriya te kir!

Erê Pilingo, me dîsa xwe avêt bextê Melek. Divê xwe bigihîne hawara qewmê

kokqelandî û tengezar. Divê biçe hawara wan, ew ên di otogaran de, di otobanan de, di metropolan de dêrbûyî.

Piştî çûyîna te, Pilingo, bajarê kavlîbûyî em bêhneçikî kirin. Me deyax neda û em ketin qeraxên avan, ser latan, deştan, bestan. Em bûn beredayî. Me çêkir ji xwe re hêlekanek li qeraxa çemê Mûradê. Me aland werîsê xwe li bedenên spîndaran. Çêbû hêlekana me, fenanî hêlekanên zaroktiya *ciya* me, ya piştî dewkeyandinê vala mayî. Û em ketin hêlekana xwe, bi vî aliyî bi wî aliyî... Bi vî aliyî wî aliyî... Çûn û hatin... Çûn û hatin... Hênîk bûn piyên me di avên qerqêşûn de û em ketin xewnên mêrgên esmanî bi zimanê Melek ê qedîm.

De bê Pilingo, de bê. Bê û bibe guvegûv dîsa di nav daristanên me yên xeyalî de. Ku tu vê carê bēyî, soz û bext ez ê jî sor bikim cixareyeke qûnpenbû û em ê pifi dūyê tije kezabên me bûyî kin, da ku gulokên şîn çêbibin li ezmanan. Û em ê çî bikin tu zanî? Em ê, tirêna di pişt katjimêra serkîsof a kalikê te de xêzkirî siwar bibin. Em ê bifirin, di nav wan gulokên şîn re derbas bibin û ber bi welatê xwe yê di nav ewrên qerqêşûn de asê mayî ve bibezin.

Serencama me û helbestê, serencama me û şairê helbestê divê bi dawî bibe. Divê *ciya* me lihêfa sibê ya xewn û xeyalên bedew ji ser me bikişîne, divê em aveke sar a sibehê li ser rû û çavên xwe yê şiltoqgirtî de wer bikin; da ku ji xewa sibê hişyar bibin û dagerin li nav toza rastiya jiyanê ya kul û kederan.

Keke êdî dem dema xatirxwestinê ye. Divê herim, hin karên min ên dinyaligê hene; de dema benderan e, divê em genim li patosê xî, nê bibin eş, de dibistan vedibin amadekarî lazîm e, dūre çend kitêbên nîvcomayî hene divê biqedînim.

Û dūre, dūre xêr û xweşî.

Wan destên te yên bêhna hibr û titûnê jê difûre maçî dikim.

Silavên Memê, Evdî, Ozal, Mehmet Elî, Mûtlû, Serhad û Feqî ji te re hene... Xêr û xweşiya te dixwazin û yeko yeko te maçî dîkin.

**Navê helbesteke William Blake ye, ew helbesta ku helbestvanê dilê min herî zêde jê hez dike.*

Çîka berbihevanînê

Elîxan LORAN

*Ji Kawa Nemir re, li van kuçeyên xeramokî erza me ricif û lerza me ye,
kes peyvê li me nexê jî em ê biperizin per û baskên rûçikandî*

Disincire kila kildanka çavreşê
Gihayê abadîniyê Ziya, her şev li ber seriyan
Selpakfiroşnûsê civakan nikarin bi civatan
Tu yê jî hil bibî best, tehn tûşî te ye jî

Dê dîwana min a reş bi def û ref bibe
Bi citkirina xilçê me yê li erd û derdan
Ya ku wê hil bibe liberxistineke îlegal e
Ligel dergêhê dergûşêke nûxurî

Bêdengî ye dengdêra bikêrhatî
Ji asûkên rabirdûyê re hinartî
Lo cawê min î jî zikmakî ve çîlqetran!
Her bi meqesê têkeve devjeniyê

Ariyekî acizmend î tu, bi ser de jî û hê jî kemberbest
Kevanên dil kurisîbin jî li otêlên keser û bireseran
Solt û poltê dahatûyeke Evdîrehmanî bixwazî
Tu saziya betalên xudreste yî!

Bandora çand û helbesta erebî li ser helbesta kurdî

Hoşeng OSÊ

Bandorgirtin û bandorkirin, ji xweris-tiya tiştan e. Ev tişt dibe ku bi giyan dibe yan ji bê giyan be. Ji bo şîn û geşbûna gulekê, pêwîstî bi bandora ax, av, ronahî û bayê heye. Û ji bo dimeneke xwezayî şeng û çeleng û xweşik bibe, pêwîstî bi hebûna gulê heye. Dêmek gul, bandorê distîne û dide. Tiştêk di jiyanê de bê bandordayîn û stendin nîn e. Dibe ku ev bandor erênî be yan jî neyînî. Di pêvajoya dem û dewranên kevn ên dirokê de jî, mirov nikare bibêje ku, şaristaniyek, çandeyek, civakek, wêjeyek, olek, felsefeyek, mîtolojiyek, îdeolojiyek û hwd xwerû û pehtî bê bandorgirtin û bandorkirinê heye. Lewra dema mirov li efsane û mîtolojiyên yewnaniyan dinihêre, gelek xal û çîrokên hevbeş di navbera wê û ya sumerîyan de dibîne. Ta ku di hin xalan de, tenê nav diguherin. Ango, “Îştar” li cem yewnanan “Afrodît” e, li cem romayî û bîzansiyan jî “Venus” e. Her wiha di gelek mijarên din de jî, mirov dikare mînakên bide. Bi vê ve girêdayî, dema mirov olên esmanî dide ber hev, gelek xal û çîrok û nêrîn û ravekirinên hevbeş der barê mijarên hevbeş de hene, wek: Çîroka afirandinê, hebûn, jiyan, mirin, tofan, qencî û neqencî, bihuşt û dojah. Helbet, cudahî jî hene. Dema mirov li diroka felsefe û wêjeyê jî dinihêre, mirov dibîne ku digel hebûna cudahiyan û taybetmendîyan, her wiha xalên hevbeş jî hene. Vî tiştî, mirov dikare di çarçoveya bandorkirin û bandorstendinê de bipejirîne. Ango, xweza bandorê li xwe, li mirov û civakê dike. Mirov bandorê li xwe, li civak û xwezayê dike. Pêve girêdayî, çand, ol, felsefe, wêje,

helbest, huner tev bandorê li hev dikin û di bin bandora hev de dimînin û toreke hûr û kûr û berfireh ji tîkiliyên diyalektîkî yên bandorkirin û bandorstendinê di navbera tiştan de pir xurt heye û berde-wamiya jiyanê xwe dispêre vê felsefeyê.

Ji ber ku her olek, bi xwe re desthila-tiya xwe ya civakî, aborî, siyasî, derûnî û rewîştî peyda dike. Ev desthilatî di pêvajoya rûniştina nirx, prensîb û pîvanên xwe, li ser mirov û civakan de li ser rûyê zemînê, xwe dispêre hêz û enerjîya esmanî “Xwedê” û hemû rêzkerinên xwe, qencî û neqenciyan, xêr û gunehan, sûc û sizayan dike ku ji gotinên Xwedê ne. Lewma mirov dikare pirs bike: Heta çi radeyê zimanê erebî ku zimanê Quranê ye û Quran jî destûreke Xwedayî ya ola îslamê ye, vî zimanî çiqas bandor li wêjeya kurdî û mîletên din ên ne ereb kiriye? Ango, ji bilî tîkiliyên cînarî, aborî û civakî yên di navbera kurd û ereban, ku yek ji çavkaniyên bandordan û stendinê ne, lê ola îslamê û pirtûka wê ya pîroz “Quran” çavkaniya sereke û bingeîn e, bandora çand û zimanê erebî li ser çand û civak û hişmendî û derûnî û derbirîna wêjeyî ya gelê kurd kiriye.

Jixwe bingeha wêjeya nivîskî ya kurdî helbest e. Ji ber ku dema mirov diroka wêjeya kurdî ya nivîskî vedikole, ji bilî helbestê tiştêkî din nabîne. Ango, di nav berhemên Melayê Cizîrî (1570-1640) û Ehmedê Xanî (1651-1707) û Feqiyê Teyran (1590-1660), hîna baş nehatiye nas-kirin ku pirtûkên wan ên pexşanê, bi zimanê kurdî hebûne yan na? Û eger mirov “Şerfename”ya Şerefexanê Bedlîsî

(1543-1513) ku di sala 1597'an de nivîsiye, wek berhemeke pexşanê ya bi kurdi bipejirîne, tevî ku bi zimanê farisî hatiye nivîsandin, hema di wan serdeman de, tu pexşanên kurdi yên nivîskî nîn in. Pêve girêdayî, em nikarin "Mewlûda" kurmancî ku gelek helbestvanên kurd ên klasîk ew nivîsandin e, wek pexşan hîlbijêrin. Rast e, hunera pexşanê di nav çand û wêjeya kurdi ya wê serdemê de hebû û xwe di çarçoveya destanên evîndarî, lehengî û trajediyên civaka kurd de li ser zimanê dengbêjan derdibirîn, lê ev pexşanên zengîn ku heta niha berdewam in, tev devkî ne, ne nivîskî ne. Di encamê de, bingeha çand û wêjeya kurdi ya nivîskî helbest e û bingeha helbesta kurdi şêx û meleyan daniye. Vêca dema mele û şêxên kurdan helbestên evîni, felsefî, tesewîfî û neteweyî binivîsinin, helbet dê di bin bandora ola îslamê û zimanê erebî de bin. Tevî ku gelek gotin û hevokên erebî di helbestên Xanî û Feqî de tên dîtin, ev bandor li cem Melayê Cizîrî baştir û xurtir xwe dide pêş û digihîje qonaxa ku hin beş û malikên ji helbestên wî, bi zimanê erebî hatine nivîsandin. Cizîrî di helbesteke xwe de dibêje:

**"Îd e û her kes ji dîdara te lê pîroz e îd
Ez tenê mehrûmê dîdar im bi sed
menzil be, îd**

**Her seher dinêrim ez cana bi ahan ra
ji dil**

**(Bareke l-barî bi is adin eleyha
yewme îd)**

**Dergehê lutfî te xanim ma li mehrû-
man vebî**

**(Înne kelben basiten dehren zîra, en
bilwesîd)**

**Pîremerd im aşiq im îro mûrada min
bibexş**

**(Ya hebîbî ya mûradî ya mûna qelbî
l-mûrîd)**

**(Ferre eqlî min lehîbî misle bazin ew
uqab)**

**(Zabe rûhî mislema inhle fî narin
celîd)**

**(Dem û eynî min bûka in mslû neh-
rin fî sukûb)**

(Narû qelbî min xeramin fî dîramin

fî l-weqîd)

Ev malikên ku min kirine navberê du kevanan, tev bi erebî ne û gotineke kurdi jî di wan de nîn e. Ji bilî ku di malikên din de jî gotinên erebî hene. Rast e di vir de, Cizîrî xwestiye hostahiya xwe ya helbestvanîyê ya bi erebî jî bide pêş û xwestiye ku bibêje: Ku helbest, dikare bi gelek zimanan bi hev re were nivîsandin, lê ya rast jî ew e erebî li ser wî û li hemû hem-pîşeyên wî û yên li dû wî hatin de pir bandor kiriye. Û dema mirov hewl bide ku van gotin û malikên bi erebî ku di helbestên Cizîrî de ne wergerîne kurdi û helbesta wî ji nû ve bixwîne, helbest xav û bêtam dibe.

Rast e, bandora erebî li ser farisan jî hebû, lê li gorî hin lêkolîneran, farisî ew qas xurt bû ku bandorê li zimanê la Qurayşîyan bike, ku zimanê Quranê ye û zimanê Quranê bû zimanê giştî û standart ê ereban. Ango zêdetirî 100 gotinên farisî di nav Quranê de hene. Weke mînak; "qelem, sundus, sîrat, ferdos..." Mebesta gotinê ew e ku heta wê demê berhem û helbestên Fîrdewsî (935-1020) û Hafîzê Şîrazî (1325-1389) û Celâledînê Rûmî Mewlana (1207-1273) û Omer Xeyam (1048-1123), tevî ku bi erebî dizanin, berhemên xwe bi farisî nivîsandin û weke îro, bandora erebî zêde li ser farisî tune bû. Û eger em niha li farisî binihêrin, em ê bandoreke gelekî xurt a erebî bibînin. Nemaze piştî şoreşa îslamî ya Xumeynî (1909-1989) ya sala 1979'an heta qonaxa ku êdî zimanê farisî ango pehlewî her ku diçe şûnde vedigere. Tew em li zimanê osmanî binihêrin, ji bilî bikaranîna alfabeya erebî, % 35'î zêdetir ji ziman û gotinên ferhengê erebî tê. Dibe ku zimanê kurdi di sedsalên 16'an, 17'an, û heta nivê sedsalan 20'an jî di bin bandoreke xurt a zimanê erebî de be, lê niha, zimanê kurdi yê nivîskî, nemaze kurmancî û kirdkî, bandora erebî li ser pir kêr bûye. Û eger bandor hebe, beşeke mezin ji vê bandorê, ji tirkî tê, nexasim li Bakur. Helbet ev mijar bi serê xwe, pêwîstiya wê bi gelek lêkolînen berfireh heye da ku encamên

objektîf derxîne holê. Lê mirov helbest, çîrok, roman û nivîsa kurmancî li vî beşê welêt bişopîne, dê bigihîje encama mayîna bandora erebî li ser wêjeya kurdî ya Bakur. Berî ku Mîr Celadet Bedirxan (1893-1951) alfabeya kurdî ya latînî çêke, kurdî li her çar perçeyên Kurdistanê bi tîpên erebî dihat nivîsandin.

Helbesta kurdî ji Cegerxwîn (1903-1984) û vir ve, her ku çû, hino hino, ji hucureya meleyan derket. Lê bandora erebî li ser ma. Cegerxwîn jî, di destpêkê de bi tîpên erebî dinivîsand û pişt re berê xwe da latînî. Helbet, gava yekemîn û binge-hîn a ji kêmkirina bandora ziman û hiş-mendiya erebî li ser çand û wêje û helbesta kurdî ew bû ku alfabeya zimanê kurdî, li ser destê mîr Celadet, ji erebî veguherî latînî. Pêvegirêdayî, bilindbûn û geşbûn û pêşketina hest û bîr û boçûnên neteweyî li cem rewşenbîr, nivîskar û helbestvanên kurdan, digel xurtbûna zilm û zordestiya li ser gelê kurd û çand û zimanê wî, vana tevan hişt ku nivîskarên kurd hewl û hêzê bidin xwe û heta jê bê, zimanê axaftin û nivîsinên xwe ji gotinên erebî, tirkî, farisî paqij bike. Dîsa jî mirov nikare bibêje ku bandora çanda erebî li ser helbesta kurdî nemaye. Ji ber ku bandor ne tenê di asta bikaranîna alfabeya erebî yan hebûna gotinên erebî, yan di hişmendiya ola îslamê û zimanê Quranê li ser gelê kurd mabû. Lê belê, li Başûr heta niha tîpên erebî tên bikaranîn, tevî ku rewşenbîrên wê beşa welêt dibêjin: Ev tîp ne bi erebî ne, farisî ne!” Ji bilî ku pira-niya navdar û giregirên helbesta kurdî, li Başûr û Başûrê Rojavayê welêt, di dibistanên ereban de xwendine û perwerde bûne û ji nivîskarên ereban bêtir xwendine û bi wan re dan û stendine. Û dema mirov helbestên Şêrko

Bêkes, Evdila Peşew, an Letîf Helmet ên destpêkê bixwîne, dê dirûv û bandora helbestvanên ereb ên Îraq, Sûriye, Lubnanê bibîne. Ev bandor her ku diçe qels dibe, lê hîna jî heye.

Li Başûrê Rojavayê Kurdistanê jî wisa ye. Gelek helbestvanên vî beşê, bi du zimanan dinivîsin, him bi erebî û him jî kurdî. Lê hin helbestvan û nivîskarên li vî beşê, tenê bi kurdî dinivîsin. Bi tevahî, zimanê perwerde û avakirina xwe ya çandî û helbestvanîyê, erebî bûye. Ne tenê wisa jî, helbestvanên kurd li vî beşa welêt, helbesta farisî, tirkî, inglîzî, firansî, tev bi rêya wergera wan a erebî nas kirine û xwendine. Pir kêmkirina, dikarin helbesta biyanî bi zimanê wê yê zikmakî bixwînin û nas bikin. Ango, tevî ku hewldanên nûjeniya helbesta kurdî bi destê Qedrî Can (1911-1972) berî ya erebî bû. Lê li gorî nivîskar Edîb Nadir, helbesta “Rêya teze” a Qedrî Can ku di sala 1936’an de nivîsandîye, yekemîn hewldan û nimû-



neya nûjen a helbesta kurdî bû. Hin nêrînên din hene dibêjin: nûjeniya helbesta kurdî bi destê helbestvanê kurd Evdila Goran (1905-1962) e, ku hevdemê helbesta nûjen a erebî ye. Nemaze Goran û Elseyyab, her du jî ji Îraqê ne û çepgir in. Çawa tê zanîn ku helbesta nûjen a erebî, bi destê Bedir Şakir Elseyyab (1926-1964) û Nazik Elmelayke (1922-2007), piştî salên 1950'î bû. Hin nêrînên rexneyî hene dibêjin ku helbestvanê esilkurd Bilind Elheyderî (1926-1996) serkêşê helbesta nûjen a erebî ye. Lê ya nêzî rastiyê ew e ku Qedrî Can û Goran, her du jî, çepgir bûn û bandora helbest û çanda erebî li ser wan hebû.

Hêjayî gotinê ye ku birek helbestvanên ereb ên girîng, bi eslê xwe kurd in, weke Ehmed Şewqî (1868-1932) ku weke mîrê helbestvanên ereb tê naskirin û Cemîl Sidqî Elzehawî (1863-1936), Merûf Elresafî (1875-1945), Xeyredîn Elzirkilî (1893-1979). Lê hêjayî gotinê ye ku ev helbestvanên esilkurd, tu têkiliya wan bi nijad û nasnameya wan a neteweyî tune bû û hin ji wanan xwe wekî neteweperestên ereb diditin!

Niha, dema em li dimena helbesta kurdî dinên, nemaze jî ya kurmançî, pêla helbesta nûjen xwe dide pêş. Eger helbesta kurdî ya kurmançî li Bakurê welêt sûd ji ya tirkî wegirtiye û ketiye bin bandora wê, her wisa jî, li Başûrê Rojavayê Kurdistanê jî sûd

û bandor ji helbesta nûjen a erebî, nemaze jî ya Adonîs (1948-), Mihemed Elmagot (1934-2006), Mehmûd Derwêş (1941-2008), Nîzar Qebanî (1923-1998) û Însî Elhac (1937-). Lê hêjayî gotinê ye ku helbest û romanên nivîskarên kurd ên ku bi erebî dinivîsin, Selîm Berekat (1951-) bandoreke mezin li hempişeyên xwe yên ku bi kurdî dinivîsin û nîfşên salên 80'yî û 90'yî yên Başûrê Rojavayê Kurdistanê kiriye, çî yên bi kurdî dinivîsin û çî jî yên bi erebî. Vî helbestvanî giranî û bandora xwe li gelek helbestvanên ereb jî kiriyê û cihekî xwe yî taybet û berz di helbesta nûjen a erebî de çêkiriye.

Bi giştî, helbesta kurdî ya nûjen, nemaze ya kurmançî, li Başûrê Rojavayê welêt, her ku diçe, ji bin bandora helbesta erebî dertê. Helbesta kurdî ya nûjen, heta ku bi cîhanê bê nasîn û bibe xwedî bandor û kesayetiyeke xurt a berbiçav, pêwîstiya wê bi du tiştan heye:

1 - Tevgereke rexneyî xurt û pak û dirust û zanistî û berfireh.

2 - Bi taybetî tevgereke wergerê ya ku klasîkên kurdî yên wekî Cizîrî, Xanî, Feqî, H.Q. Koyî, Nalî, Herîrî, Pîremêrd, Goran û helbestkarên nûjen wergerîne zimanên din pêwîst e. Ancax bi vî rengî bejna helbesta kurdî dikare di nav bejnên helbestên cîhanê de xwe bilind bike û xwe bide pêş û mafê naskirin û ronahiyê bistîne û têkeve qonaxa bandorkirinê.



Destê jêkirî

Bekîr YILDIZ

Wergera ji tirkî: Feratê DENGİZİ

Xwedê, ji rojan rojekê mirovek afirand, li beriya Herana Rihayê. Di nav simbilên genim ên nûçinandi de, ket devlinga diya xwe. Di beriya mîna deryayê de, dengê jinikê çend caran olan da. Zilam beziya hat ba jina xwe û qîriya:

“Keçê çima tu wek dêlikê direyêyî?”

Pîrek li ser qûnê rûniştibû, her du destên xwe ji paş ve kiribû pişte. Encex bi nalînî dikaribû bibêje:

“Her hal, zarok kete devlinga min.”

“Ew çi qîrîn bû. Min got qey dest avêtin namûsa te. Ka devlinga xwe derxe em binêrin, gelo kur e?”

Zilam alîkarî da jina xwe. Doxîna devlinga dirêj, wek ku çil girêk lê ketibin a bi şid girêdayî, vekirin. Zilam zarok deranî. Ku tişte bi ber ve nedît, gotê:

“Şooş, keçê dêlikê te qîz anî!”

Û bi awirên neyarî li rûyê jina xwe nêrî. Jinikê fedî kir, tirsîya. Got:

“Xwe bêar meke ha. Ma kes bi karê Xwedê dizane?”

“Ma ku kurik bûya, wê ruhê te biçûya? Di nav xelkê de, te serê min bera ber min da. Zuriyet, divê kur be. Tu yê çi bikî ji qîzikê? A va ye me heft bela girt ser serê xwe.”

Di vê navberê de pitikê, di bin tava bi şewat a ku ji asîman dibariya de, serî xistibû girî. Çi keç be, çi kur be, ji bo ku bijî hatibû dinyayê, di singê beriya Heranê de.

Zarok, havînê di nav tozê, zivistanê jî di nav heriyê de mezin bû. Di nav her du kurikên malê de, ev keçkok mîna sêwîyan bû. Kêmasiyeke wê hebû; ew jî mêbûn bû. Bavê wê bi temenê wê nizanibû, lê bi zorê dihat bira diya wê jî. Diya wê digot:

“Her hal, ev bû sêzdeh sal ku ew ketiye derpiyê min”

Wê rojê, Fadîmeyê xwe amade dikir ku derxur ji bav û birayê xwe re bibe nav erd.

Diya wê xwe da ber:

“Ka bise hela. Êdî bi vî kirasî nabe.

Heydê wê çarşeva min a kevn li xwe bike, ez binêrim.”

“Lê yadê, ma hê hemsalên min ev kinc li xwe nekirine ku....”

“Tu yê ji îro pê ve guh nedî wan. Him ên ku ji namûsê li pêş bin, wê di paleyiyê de jî li pêş bin. Pêşiyê tu li xwe bike ku şan û rûmet bibe ya me.”

Fadîmeyê bê dilê xwe kefenê diya xwe yê reş li xwe kir. Jê re mezin hat. Keçkokê gazin kir:

“Ev çarşev pir mezin e dayê.”

“Min jî dema ku cara ewil li xwe kir, ji min re jî mezin hatibû. Ev her tim wilo ye. Ji aliyê namûsê ve, keçik didin pey diya xwe. Binerdê, ma te digot qey piştî ku ez wek diya xwe gir bibim ez ê vê li xwe bikim. Ez çareya wê jî dizanim.”

Pîrekê, aliyê dirêj yê çarşevê xist ber piştê li navê û şidand. Û got:

“A va ye ew qas. Temam e. Mirov dikare dest biavêje dirêjiya çarşevê, lê mirov nikare dest biavêje firehiyê. Ka bise keçê, tu yê rûyê xwe jî bigirî. Ka xeliyê jî daxe, ez binêrim.”

Fadîmeyê xêlî daxist ser rûyê xwe. Dinya li ber çavên wê tarî bû, piştî malzaroka diya wê careke din... Got:

“Yadê ez xweş nabînim. Ez ê çawa di ber xelk û alemê re derbas bibim?”

“Lixwekirina çarşevê bextewarî ye belqitiyê... Nîfşê qîzîka ku mîrxas be, xelk û alem dimire di dil û çavên wê de...”

Fadîmeyê bi derxura di binê çengê xwe de kete rê. Li ser xaka ku ji german qelişîye mîna gundor digindirî û diçû.

Siya Fadîmeyê ya tarî, a niha diket ser riyên ku rojek berê bi kêf û henek di wan re diçû. Siya vê keçika zirav, te digot qey bûye mîna pîvaza ku di bin kulman de pelixiye, pehnijiye.

Rojekê ji rojan, şikl û şemala Osmên bi tîrêjekê re ket wan çavên ku di bin xêliya reş de bi şeng dileyistin. Fadîmeyê bi tu awayî xetên vî Osmanê xort nedinasî. Gelo dema ku av ji bîrê dikişand an jî dema ku ji mala cîranan vegeyriyabû, wilo bûbû? Nizanibû... Lê tiştê ku bûbû, bûbû. Xetên di çavên wê de di dilê wê de jî çikiyan. Dil berda Osmên.

Rojekê idê, dema ku Fadîme di qada gund re dibuhurî, Osman jî ji hember ve dihat. Di ber hev re derbas bûn. Piştî çar pênc gavan şeytan Fadîme ji rê bir, li paş xwe nêrî. Her ji çi be Osman jî li paş xwe nêrî. Fadîme pir tirsîya. Bi carekê serê xwe zivirand û çîrp da xwe û lezand. Osman ew nas nekir, gelo kî ye, ji kê ye? Bi awiran Fadîme şopand. Ku fêhm kir ket kîjan malê, ji xwe re got "Fadîme ye haa" Her wiha deriyê dilê wî jî ji evînê re hebekî vebû...

Piştî çend mehan, Osman çû leşkeriyê. Dil di Fadîmeyê de û bi evîna Fadîmeyê belawela...

Hê berî ku xebera Osman a ku bibêje "Ez giham warê eskeriyê" bê gund, bavê Fadîmeyê ew da Mûrtaza.

Diya wê rojekê mesele ji Fadîmê re vekir û gotê:

"Keçê, ma haya te jê heye? Di nêzik de tu yê bibî ya Mirteza..."

Lêvên Fadîmeyê ricifin, gupînî ket dilê wê:

"Ma Mirteza kî ye gelo?"

"Tu çawa dipirsî keçê? Di dema me de ku digotin 'Tu yê bibî ya filan kesî', me fedî dikir û em li qulekê digeriyan ku em têkevinê. Wê Mirteza kî be, a ha mêrek e..."

"Lê dayê..!"

Diya Fadîmeyê, qîza xwe ya ku ji fedîyan nereviyaye û hê weke rewtekê li ber sekiniye dît, ji hêrsa xwe kulmek danî kêleka wê:

"Tu careke din devê xwe vekî ez ê maşotan berdim zimanê te..."

Fadîmeyê stûyê xwe xwar kir û berê xwe da êxur. Di qorziyekê de melisî û li ser qedera xwe ya reş da girî. A niha Osman tê de derketa, ma dê çi bibûya gelo? Tivinga xwe ya eskeriyê hilda û ew ji vî gundî birevanda.

Di wê kêlikê de xuşînek hat guhên wê. Ji ciyê xwe pengizî. Hebekî ma. Xişînî, wek xuşîniya dûpişk û maran jê re hat. Di dilê xwe de got: "Werin, bi min vedin. Bila ez bicihemim û herim."

Careke din, di ciyê xwe de rûnişt... Demekê ne dikaribû bigiriya û ne jî biramiya...

Fadîme bû bûk...

Hê hefteya wê neqediyabû ku ketibû paxila Mirteza.

Êvarekê, dema ku rojê tîrêjên xwe ji beriya Heranê dikişand, Mirteza bangî Fadîmeyê kir:

"Hespê min amade bike..!"

"Di vê saetê de, tu yê biçî ku?"

"Binîhêre jinê, ez ê sirekê bidim te.

Nanê min li Sûriyeyê ye. Yanî ez qaçaxçî me. Mirin, wisa mîna siya min bera dû min dide. Ê, êdî tu jî, ji îro pê ve wek jîna qaçaxçiyekî têtî hesibandin. Divê tu mêrxas bî, ku bi ser malê de girtin û li min pirsîn, tu yê bibêjî, "Çûye moşenê." Ku pirsîn, "Kîjan moşene?", tu yê gotinê kin bibirî, "Ma pîrek moşena mêrê xwe ji ku dizane?" Piştî çûna min, dê du caran ro derê bibe roj, ez ê bêm. Ger ku ez neyê, tu bizanibî nivê ruhê min çûye..."

Qirika Fadîmeyê ziwa bû, devê wê ket tev. Demekê neaxivî, taliyê bi zor xwe da ser hev û pirsî:

"Ma nîvmirin çi ye, axayê min?"

"Qaçaxçî çilruhî ye. Vê gavê namire. Em birîndar dibin lê zû bi zû namin. Nîvmirin, birîndarî ye. Ku ez derbeyê bixwim, li benda hespê min be. Ew ê bê malê..."

Mirteza li hespê xwe siwar bû. Xwe berda nav tariya şevê û çû. Fadîme li paş ma û heyirî.

Hê berî ku tav biavêje, dîkan bang da. Zirîna keran a ku li beriya Heranê belav

bû, Fadîmeyê hişyar kir. Roj du bejnan bilind bûbû ku, derî hat lêdan.

Fadîmeyê dilbitirs pirsî:

“Ew kî ye? Tu çi dixwazî?”

“Ez im, derî veke. Ez Osman...”

Bu kutkuta dilê Fadîmeyê. Qet li tu tiştêkî nefikirî. Û derî hebekî vekir. Osman ket hundir. Fadîme diricifî. Encex dikaribû bibêje:

“Lê tu çûbûyî eskeriyê...”

“Ez duh hatim. Du galegalên min ji te re hene. Ez dixwazim vê bibêjim ku... Ger mêrê te bimire... Min bihîstîye ku qaçaqxçî ye... Emrê qaçaqxçîyan ne diyar e, tu fêhm dikî?”

Di vê kêlikê de derî bi şid hat lêxistin.

Dilê Fadîmeyê te digot qey ji tirsan bû du şeq, parçe bû.

“Hey wax, Mirteza! A va ye ez mirim!”

Osman jî şaşwaz mabû, encex dikaribû bibêje:

“Min veşêre! Min di ciyekî de veşêre.”

Derbasî hundir bûn. Osman li hesîra erdê pêça. Fadîmeyê ji tirsê ruhê xwe, ew qas giranî spart qorziyeke hundir. Paşê jî bi beza bayê çû, derî vekir.

Mirteza çawa ket hundir kir çewteçewt:

“Sînor mayînkirin e. Nanê me ket xwînê”

Fadîme zer bûbû, qet nediaxivî. Ketin odeyê. Mirteza hesîra her tim li erdê raxistî bû nedît, li derdorê nihêrî, hesîra ku sipartî diwêr dît. Bi carekê mehdê wî guherî. Du lingên ku li derveyî hesîrê mabûn, dîtibû.

“Ev kî ye keçê? Qîza kafiran”

Fadîme direhilî.

“Ez bi qurbana te bim. Me qet tu tiştêkî xerab nekiriye. Qet tu xerabî...”

Mirteza li hêviya qedandina peyva Fadîmeyê nesekinî. Berê tivinga li milê xwe da hesîrê û hesîr ji jor heta jêr da ber guleyan. Di vê navberê de qîrîn û hawara Fadîmeyê, gund hejand.

Osman di nav hesîrê de bê deng û his miribû, hesîr vebûbû û Osman di nav gola xwînê de gindirîbû erdê.

Gundiyên ku bi hawara Fadîmeyê û dengê tivingê ve beziyan ku derî dan ber sermilan û ketin hewşê, li ber deriyê

odeyê Mirtezayê ku tiving di dest de bû dît. Berî ku gundî li tiştêkî bipirsîn, Mirteza wek ku har bûbe qîriya:

“Qîza qehpikê; hê sala wê neqediyaye, yarê xwe xist hundir... Ez ê namûsa xwe ji binî ve paqij bikim. Min mêrik kuşt. Dor a vê orosipiyê ye. Yê ku bibe asteng ez ê di dînê wî...”

Ji nav qerebalixê yek derket pêş, li ber Mirteza sekinî û gotê:

“Ev kar ê min e. Ez te nakim hevparê namûsa me. Ku ez birê wê dêlikê me, tu yê wê radestî min bikî.”

Birayê wê, bi çengurê Fadîmeyê ku di nav qerebalixiyê de melisibû girt û bi kişkişandin ew bir mala xwe. Hawar û qîrîna Fadîmeyê, ya berî kêlikê hê ji guhan derneketibû, îcar jî hawar û qîrîna diya wê, gund hejand.

Birayê wê, li hewşê xwişka xwe bi xencerê kuşt û paşê jî destê wê yê rastê, yê ku derî ji yarê wê re vekiribû jê kir. Bi hêsaniyeke xurt di hewşê re derbasî odeyê bû. Rima eşîra xwe di ber malê de çikand. Paşê jî destê Fadîmeyê yê jêkirî xist serê rimê. Ji bo birayê wê ev rim, niha ji senceqa dijmin a ku di şer de hatiye stendin pîroztir bû...

Her wiha mirina Fadîmeyê, şan û şerefeke ku ji hatina wê ya vê dinyayê mezintir, da malbata wê...

Şano û nostaljiya dawetên Botanê

Rûkiye OZMEN

Di dawetên Botanê de huner xwedî roleke berz e, stranên gelêrî û şanoyên cur bi cur ên ji hêla ciwanan ve tîr pêşkêşkirin, dem û dîmenên nayên jîbîrkirin radixin ber çavan.

Qîz û xortên ku hinekî azadiya xwe bi dest xistine ew bi xwe biryara zewacê didin, lê gelek caran ev biryara ku di jiyanê de pir girîng, ne ciwan lê malbatên wan didin, çendî adeta zewaca ku wan pêşberî hev dîkin ji bo ku hev bibînin pir kêr û bîrê ji ya biryardana malbatê hîna pir e, ji lew zewac bi piranî di nava xizman de çêdibe.

Dema xortek qîzekê çavderî xwe dike ango her du ciwan biryara zewacê didin. Xort ji dayika xwe an jî ji ferdekê malbata xwe re dibêje ew jî ji bav re dibêjin an jî, ji birayê mezin re. Malbat bi hev dişewirin, ku biryar hat pejirandin, jineke temenmezin an jî rûspîyekî wekî qasid rê dîkin ba malbata keçikê ji bo ku ji wan re wê daxwazê ragihîne da rêya mala xwe bidin wan. Malbata keçikê jî ku bi hev şewirîn û guncav were dîtin, di demeke kin de xerê didin malbata ciwanê ku daxwaza zavatiyê dike.

Êdî malbat tevî hin kesên temenmezin diçe mala qîzê û wê dixwazin, ev xwestin carinan wekî pêguhartî (berdêl) carinan bi qelen jî çêdibin, lê êdî ew feraseta mekruh bi dawî bûye.

Kevneşopîyeke din jî xwestina zêran e û zêr pir tîr xwestin, ev jî dibe sedem ku ciwan di aliyê aborî de gelekî zehmetiyê bikişîne û heta hinek ciwan dev ji hev berdidin.

Pîştî ku her du aliyan li hev kirin êdî gewlê şîraniyê ango dezgîranê didin hev.

Mala zavê û bûkê bangî mirovên xwe yên nêzik dîkin, şîraniya xwe dixwin û gustilên wan dixin tiliyên wan, şerbeta xwe vedixwîn û reqs û kêfa xwe dîkin.

Pîştî şîraniyê êdî malbata zavê dest bi amadekariya dawetê dîkin.

Pirî caran berî dawetê bi hefteyekê ciwan her şev tevî zavê li ber mala zavê bi hev re dîlanê digirin, dawet sê rojan didome. Li Cizîrê hinek cudahî hene, wekî şeva yekem, şeva destkuqutang ango çepikan, şeva duduyan şeva hineyê; ji şeva sisiyan jî sersibehî tê gotin. Zava dibin mizgeftê, roja ku bûkê tinin zava tevî hevalên xwe diçin seyranê, ji ber ku jin tenê direqisin wekî roja jinan tê bînavkirin.

Roja pêşiya dawetê, ji êvarê pê de sazband û xizmên mala zavê tîr mala zavê û dest bi daweta xwe dîkin. Sazband li amûrên muzîkê yên wekî dahol, zirne, cimbuşê didin.

Di heman êvarê de jineke navsere û du keç tevî zilamekî ji bo desthinekirinê, diçin mala bûkê ku ji wan re berbûkî tê gotin.

Dema berbûkî ne ji heman gundî an jî ji heman bajarî bin zarokên taxê, berbûkiyan bi kevîran pêşwazî dîkin.

Ji ber ku naxwazin keça wan bi xerîban re bizewice bertekên bi vî rengî nîşan didin.

Hevalên bûkê jî pîştî şivê tevî berbûkiyan li mala bûkê dicivin.

Jineke navsere hineyê distirê û destmaleke sor a tenik diavêjin ser rûyê bûkê, zêrekî dixin kefa destê bûkê û hine dîkin û girêdidin.

Ji ber ku dê hevala wan ji wan biqete hevalên bûkê dema desthinekirinê kilamên xerîbî û dûriyê bi serê bûkê de dibêjin.

Hey hevalê hey delalê
gewrê sîsê çavxezalê
Heval hevala kaniyê
Xwedê nede bav û diyê

Heval dane xeribîyê
Îşev hevala min nebin
Sibehê li ser oxirka xwe bin

Roja din li mala zavê ji serê sibehê de
govend tê gerandin. Kebanî jî dest bi çêki-
rina nanê dawetê dikin û xwarinên wekî
goşt, dolme, fasûlye, birinc, birinczer,
tirşikê çêdikin.

Ji bo nasîna zavê ya sazband tevî
dawetiyên bi stran û dîlanê zavê dibin
mala ku zava hatiye vexwendin. Bistikekê
li pêşiya wê mala ku zava hatiye jî dire-
qisin û vedigerin ciyê dawetê. Zava tevî
hevalên xwe dimîne, ji hevalên zavê re jî
birazava tê gotin.

Piştî xwarinê hevalên zavê şal û şapik
an jî bedlê zavê lê dikin, ji bo ku zava
were nasîn destmaleke rengîn bi milê wî
ve dikin, an jî sêkuçikekî bi singê wî ve
dikin. Hîna zava li mala ku hatiye
vexwendin e leystika bi navê “Mifirdî”
dest pê dike.

Ev leystik bi çar kesan tê listin, zava
dibe dadger, hevalekî wî dibe wezîr û du
hevalên wî jî dibin leşker.

Dadger jî wezîr dixwaze ku herin
mirovêkî ji nav govendê derxînin û binin
ba wî.

Wezîr tevî leşkeran diçe nav dawetê û
kesekî tînin, ji wî kesî pezekê dixwazin.

Ger yê girtî li ber xwe bide jî, leşker bi
destûra dadger û wezîr li wî didin, heta
ku ew daxwaza wan bipejirîne. Ji bo ku
êvarî zava tevî hevalên xwe li mala
hevalekî din bicivin û goştê wê sewala ku
hatibû xwestin bixwin.

Esirkî zava vedigere nava dawetê,
beriya ku xêlivan herin bûkê, vê stranê ji
zavê re distrên.

Serî zavano,
serê şaşê gêlano
terhikê nûgihano
xêliya te ji baxê gulano

Gelek kes wekî xêlivan li erebeyên xwe
siwar dibin û diçin mala bûkê, berê bi
hespan diçûn
û hespekî boz bi gulivandikan dixemi-

landin, ji bo ku bûkê lê siwar kin. Lê niha
piranî bi otomobîlan diçin û texsiyekê bi
kulîlk û gulan dixemilînin ji bo bûkê.
Zava berê bi xêlivanan re nediçû, lê niha
gelek zava jî tevî xêlivanan diçin bûkê.

Dema xêlivan diçin mala bûkê, tevî
berbûkiyan û hevalên bûkê bi vê stranê
daxwaza amadebûna bûkê dikin.

Bûkê delalê rabe xwe kar ke
Şîşa miskê serê xwe da ke
Xemla xwe girêde, xwe negiriyêne,
zava şîrîn e xortekî pak e.

Qezî ku bi şeweyê dirûtina xwe wekî
çarîkê reş in, lê qumaşê wan sorekî vekirî
û bi neqş e,

li bûkan dikin. Niha bûkanîyê li bûkê
dikin û piranî jî wan dibin kuafêran. Bi
amadekirina bûkê re vê stranê distrên

Bûka me we dikê hey lê lê bûkê
Zêra bi xwe ve dikê lê lê bûkê
Malbavê ji bîr dikê delalê bûkê

Dema ku bûk ji bo çûyîne amade bû,
çend jin û keç destên xwe diavêjin ser
milên hev û strana narê li hevdu vedi-
gerînin, bi vê strana dawiyê, ji ber
dîlzîziyê xêlivan tevî bûkê digirin.

Bûkê narê, bûkê narê hey narê
Rakin bejna bilind e wey narê
Pêşiyê vêxin çira û findê hey delalê
Şarê ji ser hilînin hey narê
Da dê û bav têr bibînin delalê

Eger amadekariya bûkê bi derengî
bikeve hevalên zavê bi strankî dibêjin.

Me dereng e me dereng e bavê bûkê me
dereng e

Şiv û taştê kereng e bavê bûkê me
dereng e

Bi rakirina bûkê re carinan yek xwe
dide piştê derî û daxwaza bexşîşê li xêlî-
vanan dike ku jê re ‘pêşderî’ tê gotin.

Dema bûkê derdixin û siwar dikin, li
Botanê wekî edetekê ye ku ciwan hin

amûrên mala bûkê yên wekî kevçî an jî qedehan didizin û dema siwar dibin, wan kevçî û qedehan di camên erebeyan re derdixin û dibêjin;

Me biro, me biro
me bûka xwe biro
me hîla xwe li bavê kiro

Ev tevger carinan kenê xêlîvanan û acîziya mala bûkê digihîne asta herî bilind.

Dema xêlîvan ber bi mala zavê ve diherin, di rê de rastî dîwarên zarokan ên bi dar û keviran çêkirî tînin. Zarok heta diravan jî wan nestînin rê nadin wan.

Dema bûk tê ber mala zavê, zû peya nabe ev jî tê vê wateyê ku bûk zêr, pere, an jî sewalekê dixwaze.

Di pêşwazîkirina bûkê de, hevalên zavê wî dibin serê bîr, dema bûk peya dibe û dihere malê li ber deriyê xênî, jineke xizmê zavê, şerbikekî ku gûz, şekir an mewîj xistiyê, li ber lingê bûkê diavêjê erdê û dişkîne. Zarok jî bo ku wan tiştan bi dest bixin, pê li hev dîkin û di heman demê de hevalên zavê ferek qonderaya bûkê an jî balgiheke bûkê jî nav cihêzê wê derdixin dibin jî zavê re û zava jî pereyan dide wan.

Xortên li ser bîr hinek xwelî li ber lingê zavê kom dîkin û zava lingê xwe lê didê û diavêje ser serê bûkê, çendî êdî ev adet rabûbê jî, şiroveyên wekî ev xwelî avêtina ser bûkê tê wateya ku ‘tu zewiciyî xwelî li serê te bû’

Di heman demê de bûk hêkekê an jî guldankeke li devê derî dide ku dibêjin ev jî jî ber nezerê ye û bûk derbasî mala xwe ya nû dibe.

Dilan bi vê stranê dest pê dike.
Vê carê rast e
me jî te re anî
ya ku te dixweste
Daweta te me li dar danî
Şabaşa ewilî me jî kîs xwe danî

Carinan zava diçe odayê, xêliya bûkê jî ser rûyê wê radike, carinan jî dema bûkê jî erebeyê peya dîkin ku yekser dibin nava

govendê, zava xêliya wê jî ser rûyê wê hiltîne.

Zarokekî dixin dawa bûkê jî bo ku berikê nûxurî kurik be, bûk jî pereyan dide kurik.

Roja sêyemîn ango roja sersibehiyê ye, ciwan leyîstika şivan û gur li nav govendê dilizin. Kesek xwe dike şivan, yek jî xwe dike gur, deh, panzdeh kes bi piştê hev digirin û şivan jî li ser wan e. Gur rihê xwe jî hiriyê çêdike, gopalekî dixê destê xwe, tûrekî ard bi milê xwe ve daldiqîne û wî ardî diavêjê nava pez, heta hinek dibe mij, gur jî vê mijê sûdê werdigire û peze şivan yeko yeko didize.

Peyre leyîstika mifirdî dîsa dest pê dike, lê belê vê carê rolên beşdarên yekem tînin guhertin.

Zava jî dadgeriyê, wezîr jî wezîrtiyê û leşker jî jî leşkertiye dikevin, dilê roja yekem dibe dadger û jî zavê tiştan dixwaze. Bi vî awayî tola xwe jî wan digire.

Gelek caran hevalên diya zavê selik an jî terîşekî dixin gerdana diya zavê, jî bo ku wekî xesûya nû bê nasîn.

Li gelek ciyan destên bûk û zavê bi şerbetê dişon jî bo ku zewaca wan her şîrîn be.

Êdî ber bi nîvro bûkê jî tînin govendê, carinan bi tenê carinan jî tevî zavê dilanê digire.

Bi strana “Narîn”ê her kes beşdarî govendê dibe.

Narînê hey narîn hey narîn hey narîn
Narîna çiyayîn delalîn delalîn
Gula li nav giyayîn hey narîn

Dema dawet ber bi dawiyê ve diçe, bûk û zava tevî govendgeran li ber strana ‘çelebî’ govenda xwe didomînin.

Çelebî oy çelebî ew kî ye zava
Çelebî oy çelebî ... zava.
Hewtikê me bi rihan e, ma kî ye zava
Rihana şax vedane sed car malî ava

Nîvro yê bi govendên wek sixcanê, zeriye, şexanî, bablekan û hwd. dawî li dawetê tê.

Di helbestê hilnayê

Şengul OGUR

*Di helbesta ku min ê gerdûn lê
bikira de hilnayê*

Tawanbariyeke nedihat bexşandin bû jidayik-
bûna min
Bo vê jî, yekem car bûme kujerê diya xwe di
malzarokê de

Dema ku hê di pişta bavê xwe de bûm
Min dît bêpiştûna xwe û xencerek li piştê çikizand
û hatim asoxî...
Zimanê min li pişta min sêdar
Diranên min di goştê canê min de mîx
Katan di bibikên çavên min de kat dan
Bi parsûyên xwe min pîva siya xwe
Dirêj bû sî ligel tunehiya qama min!

Rabirdû xweliyeke bêqidoş bû li eniya nihaya min
û nihaya min di dahatûya tawanbar de
Bêjiyekî li ber hêt û dîwaran bû ax!

“Wekî damezirînerê dahatûyê
Yên ku bi tenê nihayê dizanin hûn ê rabirdûyê
Têbigihîjin”
Nîn e min, tu niha û zanîna wê
Ey yê li ser termê Yezdan fatîha xwendî!
Tenê min heye rabirdûya di rengê kundê bê yom
de!
Ku tenê strana xetereyên tunehiyê dilorîne
Ji berbangê ta berbeyaniyê
û xetere têra xwe mezin bû *Holderlîno*!
û mezin nebû
û pêş ve neçû hêza rizgarkar!



Zû çûyî

*Ey ya dereng hatî, tu zû çûyî
Dilê min şewitandî, wek dû zû çûyî*

*Wek bêrîkirinên viyanê, dereng hatî
Wek hevaltiyên dilkevir, zû çûyî*

*Dilê min di baxçeyê te yê wislatê de
Beyî ku şewata hesreta veqetîne vemire, tu çûyî*

*Beyî ku ji benê te azad bibim, tu çûyî
Beyî ku jiyana te min kêfxweş bike, tu çûyî*

*Te canê min êşand, ez dilşewat kirim
Çawa di dilê min de ew evîn geş bû, tu çûyî*

**Enwerî
Wergera ji farisî: Cewad PALE**

Apê Mûsa

| Lorîne DEMÎREL

Domananê kurdan rê,

Serê hewrî
Welatê astaran rê
Diyarê azadiye

Apê Musayî rê,

Porê ti yo sipî û zeriya ti ya tenike to ma ra kerda heval. Na raye de ma û to pîya şîme. To nê verê ma de bîya ne kî peyê ma de bîya. Ma û to pîya bîme. Ma telewê de bîme. Apo, domananê to çi dî û çi nêdî. Labelê şîyana to ma rê zaf giran ame/biye.

Ti şîya Apo...

Vewre/vore vora serê welatî.

Vewre /vore vora serê keyeyan.

Ma sey mendîme. Ti vengê ma bîya. Ti şîya vengê ma zerê ma de giredîya.

Apê Musayî, dengbejê welatî. Lawo apê şîyo Diyarbekîr de mendo. O birayê Şeyh Saîdî û Seyît Rizayî. Apê xatirê Haq sane meso...

Apê şî. Zerê ma bî letey.

Apê şî. Ma sey mendîme.

Ma to ra dime zof raye şîme. Ma ameyme peynîya raye ke ma ra zof merdimî şîyê. Ma sê milçikan bîme. Sî-murgî ra gêrayîme. Rozê pero pîya ameyme têlewe. To ma ra va: "Şome." Ma kewtîme raye. Ma raver ê Deryayê Eşqî ra verdîme. Newalê Cîyayîye ra

verdîme. Deşta Hêrsî peyê xo de verdaye. O ra dime Gola Çîmetenge ra şîme. O ra dime Gola Çîmetenge ra şîme.

Ma raye de hîrîs milçik bîme. Ma ne Deryayê Eşqî de ne Newalê Cîyayîye de ne Deşta Hêrsî de û ne kî Gola Çîmetenge de ebre xo ra visîyayme. Ma ameyme serê koyê ke Sîmurg çin o. Ti verê xo kerd tîje ra ma ra va: "Hevalene, Sîmurg çin o. Ma Sîmurgî ra gêrayîme labelê nika vînenîme ke Sîmurg ma yîme. Ma hîrîs milçik telewe de Sîmurg me. O waxt ma şîme ra ke ser Sîmurg ma yîme. Ma Sîmurg ner xo ra gêrayîme, Sîmurg ney ma xo dî.

Mi no hewn dî. Şodir bî. Mi venga Munzurî da. Mi va : "Munzur, pers ke Apê kot der o." Munzur şî rest Feratî. Feratî girewt destê Dîjleye ra pîya to ra gêray welatî de. Labelê ti nêdîya. Dîjle şewê tarîye de ame gosê Feratî de va: "Dişmenî Apê ma kişto."

Feratî zinar bi zinar xo da kendan ra.

Feratî xo da koyan ra.


Ferat ame Munzurî ra va: "Dişmenî Apê ma kişto."

Munzurî zinar bi zinar xo da kendan ra.

Munzurî xo da koyan ra...

Ma zof bermayme to dime ra. Hersê ma bî arê şî gîna çeman ra. Tarîyê welatî bara ma bîye. Labelê ma zanenîme ke tîje binê koyan ra zon dana.

Rojê yena welat rê êno dewran. O waxt vînenîme ke to peşmerîna. Ma adirê Kawa vesnenîme û ma govende oncenîme. Ti serê govend der a o taw, desmale destê to der a.



Xêr û şer di ola misrî ya kevnar de

Salih BOZAN

Destpêka ola misrî ya kevnar vedigere 4000 sal berî zayînê. Wê çaxê misriyan pe-restî ji ga, çeql û hinek lawirên din re dikirin û bi pîrozbahiyên laşên wan dikirin gorê. Ji destpêka hezarê sêyem berî zayînê hinek milet ji Sûriyeyê û Filistînê çûn Misrê û welatê misriyan dagir kirin, dewleteke yekbûyî ji xwe re ava kirin. Perwerdîgarê wan Horus bû. Ev Perwerdîgar li hember Perwerdîgarê miletê misrî Sît (seth) sekinî. Û çawa şer di navbera miletê misrî û yên hatin Misrê de derket, weha jî nakokiyê di navbera Horus û Sît de dest pê kir û bi demê re ev nakokî diwar bû. Bi vî awayî duyetiya Horus/Sît weke duyetiya Xêr û Şer ava bû.

Gava em tiştên li ser Perwerdîgar Sît dixwînin, em dibînin, ew hemû hêza nêgetîv e di gerdûn û xweristiyê de. Li hember wî jî Horus dibe hêza pozîtîv. Ev duyetiya bû nakokiya navbera ronahî û tarîtiyê de, di navbera pergala û bêpergalîyê de ye. Tiştêkî balkêş e ku Perwerdîgarê dagirkeran Horus bû yê xêrê û Perwerdîgarê misriyan Sît bû yê şer. Ev mesele heta niha berdewam dike, dagirker milêtên ku dixin bin destê xwe, bi hemû tiştên pîs wan bi nav dikin. Wekî nezan, paşketî, jêrî mirovahiyê, hovî, şerûd, terorîst û hwd.

Horus mîrzayê ezmên û royê ye, ev roya jiyane dide û bi tevgera xwe ya sazmemdî gerdûnê bi pergala dide meşandin. Lê Perwerdîgar Sît dijminê yekem e li hember roj û hemû babetên ronahiyê. Sît mîrzayê korahî û tewşiyê ye, ew dijîtiyê bi xweristiyê re dike, desthilatîyê li ser tarîtiyê, serma, baran, mij, birûsk, tav, bahoz û firtoneyan dike, û wan dike xizmeta xwe ji bo ku pergala xweristê hilweşîne.

Lê Sît ne tim serbest bû. Perwerdîgarekî din hebû bi navê Rîrît. Ev Perwerdîgara berpirsiyar bû ku Sît û hemû hêzên şerxwaz di tewlê de girêde û nedihîşt desthilatîyê li ser erd û ezmanan bikin. Ji bilî Rîrît, çar kurên Horus hebûn, ew jî li hemberî Sît di kar de

bûn. Wan jî hêza Sît a bi zîrar liwan dikir. Ev her çar kurên Horus tim didan dû Sît. Ew weke çar stêrkên li paş stêrka koşeyî ya komika sêwiyan li ezmên xuya dibin. Ji wê stêrka koşe re digotin çonga Sît.

Lêkolîner dibêjin peyva Sît gor zimanê qibtî tê wateya “jêr” û peyva Horus tê wateya “jor” yan “jorahî”. Li gorî dîrokzanê grekî Plo-tarx (*plutarch: di sed sala duyem piştî zayînê jiyaye*) hemû navên ku misriyan li Sît kirin tî wateya hêza negatîf, hêza hilweşandinê, sekinandinê, xerabkirin û wêrankirinê.

Mirovê misrî li gerdûnê mêze dikir, li jiyana û xwerista li hawirdora xwe û digihîşt baweriyekê ku du hêz hene, du hêzên dijberî hevdu, lê di heman demê de ew hevkarên hev in. Li gorî wan, hemû fenomenên xweristê jî tîkilî û hevkarîya van her du hêzan derdikevin. Ev fenomeniya encamên karên wan ên hevbeş in. Loma Horus û Sît di hinek nivîsên Ehrîman (*Pyramids*) de, wek du birayan bi nav dibin, du birayên cewî. Nakokiya di navbera wan de bê dawî ye, abadîn e, lê kesek ji wan bi ser nakeve. Kesek ji wan nikare yê din ji holê rake û bi tena serê xwe desthilatîyê li ser gerdûnê bike. Hemû bûnewerîya di gerdûn û jiyana xweristiyê de ji vî nakokiya wan çêdibe û berdewam dike. Gava hêzek ji van her du hêzan nêzikî ya din ji holê rake dibe, Perwerdîgar Tûs dikeve navbera wan û wan jî hev dîr dixê. Loma misriyan Perwerdîgar Tûs wek dadwerê van her du Perwerdîgarên dijberî hev, bi nav dikirin.

Di nivîseke Ehrîman din de, Horus Sît girêdide û hema dike ku dawiyê lê bîne, lê Îzis (Îsis) dibeze hawara Sît, wî jî nav lepên Horus derdixê, ji grekan rizgar dike û berdide.

Gor Margaret L. Murray dibêje, “Rewşên civakî bandora xwe li olê dike, weke ku ol jî bandora xwe li rewşên civakî dike. Lê dibe ku rewşên civakî zêdetirîn bandora xwe li olê bike. Her ku ev rewş dihat guhertin,

gewhera olê û forma wê jî dihat guhertin.

Weke me li jor jî got, ola misrî ya kevnar dîrokeke dirêj derbaskir, û di vê dirêjiyê de civata misrî berdewam dihat guhartin. Bêguman nêrînên wan ên ramyarî, û olî jî dihat guhartin. Bi demê re Perwerdîgar Rê (RE) hêdi hêdi kete şûna Horus, bû pêşewayê encûmana olî ya misrê. Perwerdîgar Rê wek bavê hemû Perwerdîgaran hat nasîn. Gor kehenatên misrî, siftehîn Rê jî nav ava ezelê bi hêza xwe derket, xwe bi xwe afirand. Piştî ku şûneke xwe li ser avê peyda kir, rabû tarîti û korahî bi ronahiya ku ji wî derdiket jî hev belav kir. Paşê Rê Perwerdîgarê bahîne Şo (Shu) peyda kir û Perwerdîgarê şiliyê Têfênet (Tefenet) jî zewaca Şo û Têfênetê ezman Nût (Nut) û zemîn Cêb (Geb) peyda bûn. Ji zewaca ezmên û zemîn çar Perwerdîgar peyda bûn; Osîrês (Osiris), Sît, Îsis û Neftîs (Nephthys). Osîrês bi Îsis re zewicî û Sît bi Neftîs re.

Wekî ku Perwerdîgar Rê nişana Xwedê li cem misriyan dida, lê ew di cihana madî de wek giloka rojê nîgar dibû, ji rojhilatê ezmên heta rojava dimeşîya û bi şev jî cihana jêrîn derbas dikir heta careke din li rojhilat hildihat.

Gava em ola misrî kûr vedikolin, em dibînin ku bingeha wê ramana

cawîdaniyê ye ango “nemîrin”. Di vî warî de pirtûkeke misriyan a kevnar û giranbiha heye, bi navê “sirûda miriyan” Li gorî ramanên misriyan cawîdani jî Firewn tenê re ye û Firewn tenê karibû yên hawirdora xwe jî bişanda cawîdaniyê. Lê ji destpêka malbata çaremîn a Firewnan, rola kahînen Perwer-

dîgar Rê zêde bû û desthilatiya wan xwe da ser desthilatiya Firewn. Gava em digihîjin malbata pêncemîn a Firewnan, em dibînin ku kahînen êdî pêçiyên xwe dirêjî desthilatdariya Firewn dikin, cîgirê wî bi nav dikin û dêkî piştî mirina wî li şûna wî, li ser text rûnê. Bi vî awayî desthilatdariya Firewnan kêmdibe û rola serokên herêman zêdetir dibe û desthilatdariya navendi lawaz dibe.

Bi vê şoreşa siyasî guhertinek di bîr û baweriyê olî de jî çêdibe. Weke em dizanin, li gorî ola misrî Firewn nûnerê Xwedê ye, ew pêwendîya di navbera ezmên û zemîn de ye. Gava ev rewşa Firewn hejiya, hemû konseptên civakî jî hejiyan û gelê misrî êdî bi guman li konseptên olî yên bavpîran nihêrin.

Girîngiya vê pêvejoya nû ew bû, ku sama Firewn kêmbû, aliyê wî yê Perwerdîgarî rabû û miletê êdî wek desthilatdarekî li wî dinihêrî, ne wekî nûnerê Xwedê.

Ji malbata şeşemîn, Firewn êdî ne jêderê hêza milet e, nikare mehdervanê jî bo jiyana cawîdan ji wan re bîne û nikare jiyana mayîna mirovan a bi Perwerdîgaran re misoger bike.

Piştî demekê, hemû çînen civatê bi xwe li jiyana cawîdan fikirîn, li jiyaneke bextewar a piştî mirinê, li cihana ronî jiyana bextewar a bi Perwerdîgaran re.

Her weha ramana bihuşta li

ezmên, di mejiyê her mirovekî de peyda bû. Ev bihuşt ne ji Firewn û ji yên hawirdorên wî tenê re ye, ev bihuşt ji

hemû mirovên pak

û xêrxwazan re ye. Di

vê demê de Perwerdîgar

Osîrês cihê pêşewa digire, dibe mehdervanê yekem ji hemû miriyan re, ji bilî ku kilitên derbasbûna cihana din di destê wî tenê de ye.



Ji bo ku mirov bihuştê misoger bike, gerek bi Osîrês re dilpak be, perestiyê jê re bike û hemû karên pîroz ji bo gorkirina mirovên mirî pêk bîne. Ji vê qonaxê û pê ve sinc bi olê ve tê girêdan.

Osîrês bi xwe Perwerdîgarekî bi exlaq e, her kesê ku karê xwe baş bike, dê wî bibexşîne û kî karên kirêt bike dê wî seza bike.

Bi vê girêdana sincan bi olê de, duyetiya gerdûn "Xêr û Şer" bû duyetiya sincî û her weha çîroka Horus û Sît ji li gorî baweriya gelêrî hat guhertin.

Gor çîroka misrî ya bi Osîrês de girêdaye, Osîrês şahê siftehîn bû li ser zemîn. Ew desthilatdarekî dadmend bû. Asûde, aramî û piştrastî di nav mirovan de bi cih kir, xelkên siftehîn ji serdema kaos û hovîtiyê derbasî serdema şaristanî û sistemê kir. Osîrês ji aliyê birayê xwe yê tacêwî yê şerxwaz Sît bi bêbextî hat kuştin. Sît zikreşî ji Osîrês dikir, jê çavteng dibû. Piştî ku Sît Osîrês kuşt, gewdeyê wî kir çardeh parçe û her parçeyek di çemê Nîlê de veşart, ji bo kes nikaribe van parçeyan careke din kom bike û li jiyane vegehe. Lê Îsis jina Osîrês bi hevkarîya kurê xwe Horus parçeyên gewdeyê Osîrês dîtîn, komî hev kirin û jiyana pîfî gewdeyê mirî kirin. Wê çaxê Perwerdîgar Osîrês ji nav miriyan rabû. Lê Osîrês biryara xwe girt ku êdî ew li ser zemîn namîne û radibe hildikişê ezmên. (*Weke Îsos piştî mirinê ji nav miriyan radibe, û hildikişê ezmên.*) Perwerdîgarê li ezmên baş ew pêşwazî kirin û desthilatiyeke bê sînor li ser miriyan dan wî. Her weha ew dibe dadwerê cîhana jêrîn, ji bo miriyan dadgeh bike, ka wan li cîhana yekemîn çî kirine û çî nekirine. Gor kiryarên wan li cîhana yekem, dê yê pak û baş bişîne diyarê mayînê û yê gunehkar jî bişîne warê nemayînê.

Piştî ku Osîrês rabû ezmanan, Sît hêrs bû û rikê xwe kir rikê kurê Osîrês Horus, di jîtiya xwe li hember Horusê ku şûna bavê xwe girt bi kar anî. Ev nakokiya dijar bê dawî berdewam dike û kesek jî wan bi ser nakeve, ne Sît û ne Horus.

Di ola Osîrês de gelek tiştên balkêş hene. Berî her tiştî sinciyên civakê bi Osîrês de hatin girêdan û cawidaniya li piştî mirinê dibe tiştêkî gelêrî. Kî karê baş bike û bi awa-

yekî pîrozbahî di gorê ke ve, dê qezencê bigire. Yanî weke Fîras Sewah (*ramyarekî Sûriyê ye*) dibêje, cawidanî dikeve qonaxê demokratîk.

Di ola Osîrês de jiyana mirovê misrî jî destpêkê heta dawiyê di depreşa Osîrês de hatiye nivîsîn. Ew Perwerdîgarê bêgavîyê (qeda û qederê). Ew hemû tiştan dizane, tiştêk li ezmên û li ser zemîn jê nayê veşartin. Di destê wî de listeyek heye, hemû tiştên ku mirov di jiyana xwe de kirine, hatine nivîsîn. Du Perwerdîgarê vê listeyê dinivîsin; Perwerdîgar Tût (thoth) û Sîtsît. Ev her du Perwerdîgar karên mirovên baş û yên kirêt dijmêrin û heta roja hesêb diparêzin. Dema her mirovek li ewwangeha dadgehê, li hember terazûyê disekine kiryarên xwe li ser wê listeyê dibîne.

Weke em dibînin, çendîn ku Osîrês Perwerdîgarekî sincî ye jî, lê ew nagihêje asta prensîba xêrê ya gerdûnî. Di eynî demê de, Sît jî nagihêje asta şerê gerdûnî. Eynî ku Sît gelek taybetmendiyên Pelîdê gerdûnî (îblîs) diyar dike, lê bi rastî ew nabe Pelîdê ku hemû şer bi wî ve girêdayî ye û li hemberî Xwedayekî gerdûnî nankor derdikeve.

Tiştêkî din, li gor Fîras Sewah, em di ola misriyan de nabînin, ew jî dawîya cîhanê ye, û rabûna mezin a gelemperî (qiyamet), ji bo gerdûn bi tevahî derbasî rewşeke din a pak bibe û derbasî cawidaniya sermedî bibe. Cîhana din di ola misrî de wisa ye; her mirovek dimire, diçe ber dadwer Osîrês û hesabê xwe dibîne. Lê ev cîhana me ya li vê derê bi dawî nabe û dawîya hebûna mirovan a li vê cîhanê jî nayê.

JÊDER:

1. *World Religions From Ancient History To the present* Edited by Geoffrey Parrinder, New York, 1971, Wergera erebî.
2. *The Splendour That Was Egypt*, By Margaret L. Murray, Rûpel 208, Wergera erebî.
3. *El-Rehman wel Rehman*. Fîras Sewah, Şam, 2004.
4. *Pirtûka Miriyan a Fîrewnî, The Book of the Dead*. Sir Walis Budge. Wergera erebî, Dr. Fîlîp Etiya, Misir, 1988.
5. *Social Life in Ancient Egypt*. Sir W.M. Flinders Petrie. Wergera erebî: Jiyana Civakî li Misra Kevnar. Hesên Muhemmed Cewher, Misir, 1975.

Jiyaneke Teng

Tiştêkî din e, tiştêkî din
Di ser esmanê bêdawî re
Li ber deryayên derûnê
Min xwe da ber siya axînê
Ku mîna bajarê kolanên sêwîtiya xwe
Li serê peyariyê xwe haş dike

Tiştêkî din e, tiştêkî din
Li serê çiyayên xemgîn
Li ber çavkaniyên bi êşê ketî
Ketim nava heriyê
Ku mîna baxçeyekî pelên derewbêjiya xwe
Li ber bayê payîzên xwe hişk dike

N

Tiştêkî din e, tiştêkî din
Li giyanê nexweşiya xwe
Li nava bajaran xweş dikim
Li ber pencereya bêdawî digirîm
Nikarim di nava şaxên jîna xwe de bifirim

A

Jiyaneke teng e
Li hêsirên çavan zindî

Z

Hêviyên ba û baranê

Ê

Bayê biharê yê hênîk li ser hebûna janan dilerize,
Di nava giyanên zer î çilmisî de li binefş û beybûnan digere
Û dibêje: Ez ba me, ba! Li çiyayên we yên asê, berfina we ji min xeyidî,
An bimirin an jî bimînin payîz. Ji bo berfa rabûna we bûme zîz

Barana havînên tenik di nava çavên şîn de diperpîte,
Li zozanên hêşîn û berdar, hêviyê ji berx û beranan dike
Û dibêje: Ez baran im, baran! Li deşta we ya aram, keskesora we ji min xeyidî,
An bimirin an jî bimînin payîz. Ji bo tava rabûna we bûme zîz.

Bihar û zivistan, bihar û zivistan!
Xem û xeyalên me mane li xemgîniya payîzan

Ji dapîr û bapîran

Ji dapîr û bapîran

Pişêy pişêy

Nan garisêy

Apê Husêy

Nan xwarî

Ketî çalê

Pê fetisî.

Textik textik rewankêy

Hêjîr hêjîr vavankêy

Kê hêjîra li ser vî kulikî xwar?

Aha vî zikreşî xwar

Oho hoo

Êklo dîklo

Çalo çemo

Mişko emo

Îto mîto

Xano mano

A-pî-çik

Rovî rovî zexelo

Paş mala me mexelo

Rovî yekî biçûk e

Serê doçê belek e

Rovî çûye mala xalê

Daye çalek (çiwalek)

ardê salê

Hilanî danî bîst û çarê

Pîrekê himelim e

Pêşî tijî kurm e

Kê deyn kir di dêv keve

Tibb!.

Leyleko

Panîçeko

Çek li linga

Mêrê Fatê çû civatê

Axê hûr e

Tirbê kûr e

Hevdeh rê û qonaxan ji min

dûr e

Metê metê

Kerê de ketê

Ker reqisî

Met fetisî.

Silaw silaw

Du nikulaw

Rale dasê

Here çilo

Holê çêke

Gulê di bin ke

Gul bişqulk e

Sil nikulk e.

Hêkê hêkê

Du nan zikê

Çêlê dîk

Çav spîk

Berdayî vîk!

Memedow

Avika golê cemedow

Keçika bigire bernedow.

Ûzerê metê

Şekirê nav xetê

Xeta çarxetê

Morîka ser sepetê.

Senem canêy

Çavreşêy

Pariyek nanî xweşêy

Dîlimik zebeşî dendik reşêy

Seriyek şekirî şîrînêy

Çilkik zêrêy

Tak rihanêy

Kulîlka taxêy

Bereketa malêy

şazdeh xet li qêling danêy

Ji xwe re dildar diyêy

Va tûya han biketa

Boçik li yan keta

Di devî min keta

Keçik çûne çirpika

Şerpê şûpê şimika

Van jî keçikê cimika*

***Navê eşîrekê ye.**

Herêm: Semsûr

Berhevkar: Zekî AKDAG

Hişxur

Ji mêj ve ye ku ez

Pêlêwanê gotinên

eletewş im

Ji bo hişê min e ev rêzik

Hişxur im ez

Ez bê hiş im

Hişêş im

Lê keviya dilê jinekê me

Hez kî bila dayik be

(Sivhiya Nûredînê Ferho)

An jî bila ew jin

Delala ber dilê min be

Çi ji kê re

Ji kê re çi xem e ez...

Ez dixwazim bi keştiyekê

Ji xezeba bayê kur

Ji gotina dilê te birevim

Bi rê kevîm yê dixwaze ez

im

Ax bextê min!

Çi ma, çima...

Çima welatê min bê zerya

ye?

Ji mêj ve ye, ji mêj-î ve ye

Ez hişxur im

Çi ji te re?

Ercan DOGAN

Beravdanî

Ar-da JANXWAR

Eyno, serê şeveqê xwe bera nav dika rezê sêdik û zikfelişî da. Rêça ku wê cotkar tê de derbas bibûya amade dikir. Bîskek derbas bû cotkar û dû qantirên ku dozîna wan di wan de werimîbû da ku di erdê de bimehîne li nav rezê Eyno amade bû. Cotkar, gîsinê xwe amade kir, danî ser noqa qantirê, lê qantir li cihê xwe nedisekinî nehnehi dikir. Cotkar got “Hey mîrat! Ma çi ketiye te!” cotkar her du lûleyên gîsinê hesinî di qula nîr de derbas kir. Daring ji devê qantira enîbeş derxist, di ceherê rîs de ka û ceh hebû, kir serê qantirê enîbeş. Cotkar bang kirê; “Xwişka Eyno ka em ji ku dest pê bikin?” Eyno gotê “Ji dika jêrîn dest pê bike û were a jorîn, heta tenîştî birkê”

Eyno gotê “Ez bi qurbana te! Tu ji ber hev cot bike û pêlikê gîsinê xwe baş di bin erdê de kûr biajo, bila firîz û qamîş, di bin lata tûkê û heta axa darên hejîrên qilêrî, hejîrên sincarî, hejîrên bi boçik, hejîrên gewrik, hejîrên payîzî, hejîrê çayikî, darên hinarên xursêkî, hinarên qeliştokî, hinarên meyxweş, hinarên tirş, hinarên kur-mancî, darên bihê, darên çinarê, darên behîvan, darên gûzan, darên benîştokê, darên tehewan, darên mişmişan, darên încazan, darên alûcan, darên tûyên şemî ên tije wîtamîn, darên tûyên xursêkî ên bozik, darên tûyên wê şwirkî, darên hur-miyan, tu binaxa wan biqulipîne û axê xilmaşî bike, bila axa nû derkeve ser rûyê erdê. Sala çûyî wek pisîka ku gûyê xwe veşêre hatibû cotkirin, ser erdê xêz kiribû, zêde kûr neçûbû lê ji ber eşêfê me qet tehm jê nekir. Ji bo keda mirov helal be hewce ye karê xwe baş bike da ku dilê mirov neke tasewas.”

Eyno, ruhê xwe xistibû çavên xwe, dev ji xwe bernedida. Karê xwe tu carî nedihîşt roja dawîn, her tim bi xwesteka xelaskirina kar, li kar dibaniya, hem karker bû hem kebanî û stûna mala xwe, kevirê

qoziya banê xaniyê xwe bû. Eyno, rez ne bes bû tew carinan ji diçû gavantiyê. Lê hîn ciwan bû weke heyvekê bû, bedewbûna wê, pakbûna wê, timî li ser zar û zimanan bû. Qama wê kin bû, lê porê wê dirêj, bêhna xwezayê jê difirûdî. Lêvên wê yên kaxizîn wek heyvê spî û spehî, şewq didan. Nazik û kubar bû. Peyvîneke wê ya hevrişimî û nermik hebû, mirov ji ser xwe diçû. Çavên wê yên zeytûnî, zîq li bibîka çavên mirov dinihêrîn, ji ber çavpilingiya wê mirov di cihê xwe de ji kelecanaan xwê dida û devê mirov diket hev û mirov nika-ribû bi axaviya, dev û diranên mirov li hev diketin. Diranên wê yên mircanî, mirov digot “Xwedêyo! Mirov di nav vî devî de ji vê seyrangêhê bê par nemîne.” Kirasê kinik ê gulgulî çiqasî li bejna wê dihat. Giloverên di singê wê de hilnedihatîn û bi meşa wê re serî hildidan, di paxila wê de timî ceng hebû. Ew gilover çiqas li singê dihatin. Ew mijangên wê yên qîrîn, weke şûrê hizranî bedewbûna wê derdixistin holê.

Hevserê wê ji ber rewşa ramyarî bi çol û çepelan ketibû. Jixwe nikaribû bi sî û stara wê biketa. Toqa malê di hêlîna dilê wê de lûsiyabû. Du zarokên firoke, yek li piştî yekî, ji sermiyanê wê mabûn. Lez da xwe lê qidûm pê re nemabû, ji ber ku ev pênc rojên wê timî li ser tutika geh li nav rez, geh li gavaniyê, geh kebantiya malê, geh li kiraşoyê û veşûştina serê zarokan, şûştina mitêlan, potik û motikên tîfalê xwe bû.

Lê hewce bû firavîne ango navrojê ji cotkar re bibe. Bi malhazirî çend hêkên malê di nav rûn de qijiland û qeland, tûyê li ser mêt girt, bi heska xwe ya darîni çend libê zeytûnên xirxalî di binê metereyê lek de bûn, derxist li ser sêniyê lekî bi kubari bi cih da. Qûşxaneyê savara xwe noqî ser sêniyeke nîvçe kir. Goştê fêrikê berê amade kiribû li ser savarê belav

kir. Ava qerisî ji kunê mûyîni bera nav çeqilmastê da, hinekî ron bû, hinek mastê parzûnandî bera nav çeqilmastê da, piçekî tîr bû, çend serî pivaz xist nav piyekî tenûrê û çend nanên genimî xist nav pêşmalka xwe û di destekî xwe de çaydankekî pak û delalî û çend lib şekir, çend îskan û ket rê.

Bi paqijiya mala xwe û bi tehmexweşiya xwarina xwe, li nav gund navê wê belav bûbû. Zar û zêç û teba bi dû bêhna xwarina delalî, ku bêhnstewrbûna wan, avis û derkiribû û bi pelandina bêhnê ketin, kef û kel li ser derûnî û devê wan ketin û bi dû rêçka bêhnê ketin.

Bêhna zerdika hêka qelandî, ku zengeloka bêhna mirov şil dike û avzelaliyekê dide mahdê mirov.

Cotkar palûtetî danîbû li ser rezê Eyno, te yê bigota qey bi qubaletî girtibû. Zû xwe jê pak kir û bi kêfxweşî li ser firavînê rûniştibû.

Zar û zêç, teyr û teba xwe bi hêzeke bê hempa xwe avêtin ser xwarina li ber cotkar. Bû wilewila cotkar, qijewij jê hat. Heta pîra Eyno, xwe gihandê, ku tu nemabû ku teyr û teba û zar û zêçan xwarina cotkar bi nahperûkên xwe ji nav hûr û pizûrên wî derxistina û bixwarina.

Eyno, lata xwe bi tena serê xwe weke çarqozî çêdikir, sermişarên latên xwe ava kir, qûmaxa wan sererast kir, piyên latên xwe qasidî kir, cihokên wan sererast kir. Û bi hêzranî mera xwe li binê axa nav latê xist, zibil teva tovê çandiniyê kir û li nav axa xumxumî belav kir. Ji xwêdanê virçevirç ji pêlavên wê dihatin, weke tenûra har, siloriya bayê germ ji paxila wê difiriya. Wê eniya xwe bi kitana xwe paqij kir û rahişt tirmoxa xwe, axa xwar a ser qûmaxan sererast kir û rahişt bêra xwe cihokên sermiskaran ên bi kevir û kuçikan xetimîbû paqij kir, keriyê fêrik, mirîşk, elok û dikan xwe bera nav rezê emaret da û pîra Eyno hêrs bû, bang kir: “Haho! Gicano! Ma em vê tehbê ji bo mirîşkên we dixwin, ma qet zikê we bi keda me naşewite? Hey qapyamano! Hûhûka we neman, me ji destê cenanan têra xwe çavnebarî xwar, ma êdî dora we ye! Xwe-

dêyo! êdî bes e ji derdê mirîşkên we.”

Eyno rahişt çend kevir û pale bi mirîşkan wer kir, çend hep firiyên û çend hebên din jî pî xist ber wan, bask lê qîtil qîtilî kir, per û baskê wan xist ber wan.

Eyno, eşêfa nav latê, bi dilê xwe bi tevrîkê wek gûzanê eşêfa nav dilê xwe tevr dîkir û didebirand.

Ew rezê bêbinî bi tena serê xwe çêdikir, çavê wê barnedibûn ku rez bi cenanî bida gundiye xwe. Ji ber ku baş li rezê wê ne miqate bûn, hesûdî dikirin. Du par ji xwe re dibirin, parek ji Eyno re dişandin. Wê digot “Ez bimirim jî ez car din vê axa xwe bi cenanî nadim”

Dêro xortekî kej, porzer, enîdok, qut û qalind, wekî gundor, çîpxwar, devliken, dilnalîn û nazdar bû. Dêro ji lêgerîna avê, ji çandina daran, ji şênkahiyê pir hez dîkir. Bi du darikên tûyê li ber berojkekî çarmêrkî vedabû. Hew dîtina ku dît her du darikên ku pê dilist, serê wan berjêr bû. Jixwe ji berê ve timtêlî vî karî bû. Av dîtibû. Ava ku dîtibû weke dengiz, xumîni jê dihat. Gundiyan navê wî li kaniyê kiribûn. Di ber kaniyê de dara gûzê çandibû. Gûz wer dişixwîlî ku gundiyan dixwar, Di ber dara gûzê de çend quleteyn û hewdikên hûrik bi destê xwe ava kir û serê wan bi çend kevirên pehnîkî bi kilsê seyand. Bi xêra wî ava kaniya Sêlûle û ava Kaniya Pehn hatibû kişfkirin. Ava Kaniya Pehn pir fireh digeriya û avzêma wê pir bû. Loma jî navê wê kiribûn Kaniya Pehn. Bi alîkariya gundiyan li dor avzêma Kaniya Pehn bi fersên mezin qor bi qor hawirdora wê lêkirin û du cihok ji bo di pêş de ji rezvan û zeytûnvanan çêkir û qulpeke hesinî bi kevirêkî fersînî ve kir û kindirek di qulê de derbas kir, bi dewlê ve girêda. Da ku ên tî bibin bikaribin ava vexwin.

Ji xwe re çend xerzên darên tirî çandibû, ji her celebî tirî di nav xerzikê wî de hebû. Dora xerzikê xwe bi kevirên çarqozî yên şehkirî û neqirandî girtibû. Tenê çend neqeb ji bo cotkirina xerzik hiştibûn, wekî din tu heywan û însanan nikaribû zû bi zû ji benda xerzikê wî derbas bibin. Li xerzikê xwe miqate bû. Di ber benda aliyê hundir de de qor bi qor hejîrên boçik, qi-

lêrî, zerik, sincarî, çiyayî, behîv, hermî, mişmiş, darên kenêrê, çandibûn. Di nava xerzik de jî, ji bav û kalan de çend sarincên şeravê mabûn. Nêzî sarincan mehse-
reyek ji xwe re ava kiribû. Te digot Xwedêyo tu li rez û xerzikê wî binihêrî! Di meha rezberê de diçûn ser mehseran. Berê xerzikên xwe tev dikir şerav û di sarincên hênîk de dimeyand. Bi coşî ew û hevalbendên xwe wan şevên dirêj bi şewrên xweş tevî bîranînên Omer Xeyam dibûn.

Erdên qelaç ne hêjayî pênc qurîşan bûn. Bi xêra wî edî qedr û buhayê erdên wan çêbûbû, bi xêra wî gundî tev bûn xwedî rez û zeytûn, girîngî dan rez û berê xwe, bi baran jê dihat.

Li ser banên xwe yên axînî tej û merşikên hûnayî radixistin û li ser wan hejîr û hinarên xursêkî û tû radixistin û hişk dikirin. Ku mîna 'kevirê havînê diavêtin binê kulînê' êmişên xwe dixistin denan û kewarên ku bi axa sor seyandî ava kiribûn, di qubîk û qabên xwe de bi cî kiribûn da ku zivistanê di ba û bahozê de, di şevên dirêj de, bi mêvan û zarokên xwe re xwîna xwe germ bikin. Li nav rezên xwe timî bang dikirin digotin: "Çûka zerê ya li hemberê hejîra, hinara, tûyan nexwe here ser Kanîka Dêran têr avê vexwe.

Bi hezaran rîtilên dimsê ji xerzikên xwe hiltanîn. Diçûn ser mehseran, bi mehan li

ser mehseran diman. Şewl şewla wan bû, tirî diesirandin, şîre dixistin beroş û sîtilên mezin, çend kulm û kêsekên axa spî û kirêc bera nav şîreyê didan ji bo ku pelçim û toz û tebara nava şîreyê xwe bera binê sîtilê bide. Gebol çêdikirin, gebola ron bera nav campolê çarqozî didan, sê çar derban lê dikirin da ku bastêq stûr bigire, ben û şurtikên ji behîv û gûzan çêdikirin, ji şîreya tiriye reşik ji şeraba xwe çêdikirin, dixistin cerên mezin û dixistin cihên tarî, da ku bimeyê. Adaniya ji ber rezê wan dima li hespê xwe dikirin, mîna etaran li beriyê digerandin, bi nîsk, ceh, genim didan.

Eyno, ket cihoka li ber kaniya Dêroyê ku hezkiriyê wê yê qîzaniyê bû. Kevir û kuçikên di nav cihokê dilê wê de, ew fetisandibûn nedihîştin hilmê bistîne. Xeml û xeyalên wê di nav qûça avê de hatibû fetisandin. Av mirarî diherikî di nav qûçan de. Av ji aliyekî ve bûbû qesasê wê, ji aliyekî ve kiribû ku xwe bi jiyanê ve bigire.

Her du çîpên xwe yên gewr bera nav cihoka ku ava wê ji kaniya dilan dihat, agirê di kurahiya dilê wê de hênîk dikir, xwe gihand berqefa ku di koka dara gûzê de bû, wê û çavbelekê xwe li vir hev didît, di nav bîranînên wê de kefz girtibû. Hêdî hêdî ber bi Kaniya Dêran ve diçû. Ew evîna wê ya ku li bin dara gûzê qûrmîçibû û bîranînên wê dikewandin.

